



Ar evê Oskan

Rew enbîrên kurd û ore a Sûriyê



Pêdivî bi saziyên rew enbîrî heye?

Bê guman di hemû civatên mirovan de pêdivî bi saziyên rew enbîrî hene, û bi taybetî civateke wek civaka kurd, ji her kesî bêhtir pêdivî pê heye. Li gel rew a qedexeyê ya ku kurd têde dijîn, dîsa tabloya rollîstina rew enbîrên kurd di berxwedaneke berbiçav de derbas dibe. Fikra avakirina rêxistinên rew enbîran di rojavayê Kurdistanê de ne fikreke nû ye. Gelek hewildanên wisa ji destpêka sedsala bîstan de dest pê kirine û xebitîne, berhem çap kirine, endamên wan hatine girtin û nefîkirin, lê dîsa jî û heta roja îro berdewam dike. Lê mixabin ku destên partiyên û siyasatê dikevin nav, ji hev belawela dibin û dawî lê tê. Heta ku Mehricana Helbesta Kurdî serbixwe kar dikir ba derbas dibû, lê ku fikrên partîbûnê derbas nav bûn me dît ku berçebû. Bi dehan hevgitin, yekîtiyê, hevbend, kom, govar û rêzband.. di çend salên derbasbûyî pêk hatin û dîsa jî vemirîn, lê dîsa jî pêdivî pê heye.

Siyaset û avakirina saziyên wêjeyî:

Em wek kurd û bi taybet wek kurdên rojava, niha di rew eke pir hestiyar de ne. wek em dizanin rola nivîskar, rew enbîr, hunermend û êwekar di ar ivkirina qûnax û rûdanên dîrokê de, ne kêmtî ya siyasatvan e. Di aristaniya civak û cîhbiçîhkirina mafên mirofan de bi nivîsên xwe, bi pîvana nixxandinê xwe, dikarin roleke ku hesab jêre bêne kirin bilîzin. Bi taybetî di guhertinên hi mendiya berpirsiyar û desthiladaran de. Ji aliyên din jî, rola rojnameger di ar ivkirina bûyerên ku li kolanan pêk tên, ji pa erojê re dikin qûnaxa dîrokeke dewlemend û giring.

Rola partiyên kurdî di avakirina van saziyan de:

Li welatên ku serbixwe dijîn û xwedanên biryarên xwe yên hundirîn in, ji kesayetên xwe re, di hemû aliyên aktîvîkirin jiyanê de saziyan ava dikin. Wek nemûne "Yekîtiya Nivîskaran", "Yekîtiya Hunermendan", "Komîtên Parastina Rojnamegeran" ... hwd. Ev hemû sazî rolên aristanî û bilind di civakan de dilîzin. Ne karê hunermendekî an nivîskarekî ye ku saziyeke wisa ava bike, ku ava bikin jî, mixabin tû î gelek kelem û astengiyan dibin. Lê ji ber bêdewletbûna kurdan, carcaran di nav me de ev ti t pêk tên. Ew jî li deriyên girtî rast tên û pi tî demekê nema karin berdewam bikin, dest jê berdidin. Nemûneyên di vî warî de li nav kurdên rojava pir in. Bawer dikim rola partiyên me ya neyênî di têkbirina van saziyan de diyar e. Ji ber ku rew a partiyên me û perçebûna wan bandorê li ser van saziyên rew enbîrî jî dike. Çi erênî, çi jî neyênî be. Xema partiyên me ew e ku di bin baskên wan de rêxistinên wisa bime in. Ew rêxistin jî giraniyê didin propagandaya partî û serok û îdyolojîya wê. Ku ji vî xêzika teng derkevin jî dê bêrol bimînin.

ore a Sûriyê gelek ti t vejandin:

Deriyên ku li pê tevgera civata sûrî û ya kurdên rojava hatibû asêkirin vebûn. Dîwarên tirsê ku mejî û ling û destên me pûç kiribûn herifîn. Bang û qêrînên ku bi dehên salan dixwestin der bibin der bûn. Pênûsên ji xîmavê miçiqî ku bêriya nivîsên ji destên azad kiribûn dest bi nivîsên azad kirin. Partiyên ku ji kêmbawerî wek noka li kevir bikeve ji hev pekiyabûn, li hev kom bûn. Rew enbîrên ku bi hisreta rêxistineke xwe bûn, li xwe hayê bûn û vayê "Hevbenda" xwe ava dikin, çend dengên ku ji vir û wir derdikevin jî dê li ser xêzeke qalind bighêjin hev û ava wan dê di cokeke paqij de biherike. Destên dîktatoran ji qirika millet derkeve dê herti t normal û li gorî xwezayê bêne vejandin û ava golê dê zelal bibe. 28.02.2012

Gotina Hevbenda N.R.K.S. di 115 saliya rojnamegeriya kurdî de



Xu k û birayên hêja!

Di 22 nîsana her salê de, nivîskar û rojnamevanên kurd roja rojnamegeriya kurdî pîroz dikin, çimkî ev sebat (munasebe)bûye weke rojê de çandeyî li nik wan.

Di vî rojê de, dîroka rojnameya yekemîn tînin bîra xwe û li ser rew a wê radiwestin, bê çawa hêja Medhet Alî Bedirxan li Qahîrayê di sala 1898an de rojnameya "Kurdistan" derxist û belavkir. Û herwiha li ser rew a ragehandinê li cem kurdên rojava giftûgo dikin, û rola vî ragehandinê û rojnamegeriyê di civata kurdî de dipelînin.

Di vî roja pîroz de jî, pêveçûna rojnamegeriya kurdî tînin bal xwe, ku di çend qûnaxan de derbas bûye, û çawa ji Ronahî û Hawar a Dr. Kamîran û Celadet Bedirxan destpêkiriye, ta bi kovara Gulîstan a seydayê Cegerxwîn, û bi alî serdema 80ê û 90ê ji sedsala bûrî de, ku komek ji kovar û rojnameyan, çî bi kurdî, çî bi erebî derçûne, mîna; Dengê Kurd, Gurzek Gul, Zanîn, Pirs, Stêr, Bihar, Mewasim, Ajrras,....td.

Wekû em dizanin, di van salên dawî de, rojnameyên kaxezî gelekî kêmbûne, çimkî a elektronî ketiye ûna wan, û malperên kurdî rola rojnamegeriyê girtine, û bûne dengê kurdan, ji wan malperan: Gemya kurdan, Welatê me, Keskesor, Tîrêj, Avesta kurd, Sobaro...td.

Ligel vî rew ê, rojnameyên elektronî jî peydabûne, mîna "Pênûsa Nû" a Hevbendê, ku bi herdû be ên xwe, a erebî û a kurdî, belavdibe.

Li vir em jibîr nekin ku rola peyva kurdî û rojnamegeriyê di jiyana me kurdan de diyare, dema ku ziman û toreya kurdî diparêze, û pê xistinekê ramyarî di nav civatê de peydike.

Cemawerên hêja!

Ev roja pîroz derbas dibe û hîn jî ore a azadiyê û rûmetê di Sûriyê de li dare, eve pi tî ku zêdî du salan ji berxwedana dijî ku tîna rojane û xwe parastinê didome. Di vî ore ê de gelek ji mirovên Sûriyê çî kurd, çî ereb, ji nivîskar û peyamnêran hatine ku tin, yek ji wan endamê Hevbendê bû, ehîd Mi 'el Temo. Û herwiha ta roja îro jî, gelek di zindanên rêjîmê de girtîne, mîna nivîskar Husên Îso û peyamnêr epal Ibrahîm.

Di vî ore ê de, hevbenda me (Hevbenda nivîskar û rojnamevanên kurd li Sûriya) roleke pir giring dike, ev jî diyare ji be darbûna hejmareke mezin ji endamên wê bi ore re, çî di riya nivîsandina gotaran û be dariya di ragehandinê de, û çî di amadekirina nûçeyan de, bo herêma kurdî û bo hemî Sûriyayê.

Li dawiya vî gotinê de, hêvîyeke mezin ji nivîskar û rojnamevanan heye, ku roleke mezintir di ore a Sûriyê de bileyizin, da ku em bighên azadiya xwe û mafê xweyî netewî qezenc bikin.

Bijî roja rojnamegeriya kurdî

Azadî bo girtiyên peyva azad

Hevbenda nivîskar û rojnamevanên kurd li Sûriya

Têbînî: Gotina Hevbenda nivîskar û rojnamevanên kurd li Sûrî di 115 saliya rojnamegeriya kurdî de(P.N)

Rojnamegeriya kurdî



Nêrînek gi tî bo medya û medyaya kurdî

Ragihandin bi destpêbûna mejûya mirovan destpêkirîye. Pêwîstiya ragihandinê bi amûr û êwazên cûda berdewam kirîye. Lê di nava amurên ragihandinê de herî bibandor ku hîma wî dema romayîyan hatîye avetin û di sedsala 17'an de bi awayê rojnamegerîye derketîye holê û her berdewame. Ber çemê Nîlê tabletên 3500 sal berê hatîye ditîn ku ser wan de buyerên rojane hatîye nivîsandin û her wiha tabletên ku ji dema împaratoriya Roma hatîye çêkirin ku ser wan de jî wekî rojnameyek bûyerên rojane heye jî em nekin nava hesabê rojnameyên bi navê "The weekly News From Italy and German", "La Gazette", "Avisa", "Gedenck Wurdige Zeitung" û çend rojnameyên din rojnameyên pê in a cihanê ne. Niha jî rojnamegerî bi gi tî media bi amurên curbucur didome. Niha rojname, kovar, tv, radio, internet û amûrên hwd... di rojnamegerî de tê bi kar anîn. Medya îro ro de wek "Hêza Çaremîn" tê bi nav kirin. Dibe ku dahatû de bibe hêza yekemîn. Rojnamegerî bi gi tî medya hewcedarîyeke xwezayîye. Bandora mezin a medyayê ji ser modernîzim, postmo dernîzm, ol, guherîna civakî, tîgîhi tina hêz û desthilatdarîye, pê ketinên idolojîk, pê ketina teknolojîk-zanîstê heta beralî kirina civakê, pêkanîna guherînên bingehîn û gewre, ve artina karên qirêj a deshilatdarîye, pergala aborî û hwd... de heye. Em dikarin gelek xalên bipeyvendî zêde bikin. Her xal hejaye nixandinêye, belam ev ti t encax di pirtûkê lîkolînî de dikare pêk be. Lê ev rew bo Kurdan hinek diguhere. Çunke dewletekî navendî a Gelê Kurd tune ye. Ji ber vê him êweya rojnamegerî di nav gelê kurd de cewaze him jî sedema bikaranîna media cûdaye. Pi tîpeyman Lozanê welatê Kurdan bû çar perçe. Her perçeye de dewleta ku vê perçeya xakê Kurdan dagir kiriye, bi ewazên cuda hemberî hebûna Kurdan derketiye. Ji ber vê yekê jî her perçeye de rew a gelê kurd jî ji perçeyeke din cewaztir bûye. Hêmanên ku bo medyaya cihanê daba a gotinê ye, medyaya Kurdî de hêmanên wekî standartize kirina û pê xistina zimanê Kurdî, hewla rizgarkirina xaka Kurdistan, dîplomasi, pê xistina muzîk û bi gi tî çanda Kurdî, pêk anîna hi a neteweyî ya Kurdî, modernîze kirina civaka Kurdî, pêk anîna hi mendiya dîrokî ya Kurdî jî zêde dibin. Her wiha partiyên Kurdistanê dezgehên xwe yên çapamenî bo propagandaya rexistinê xwe jî bi kar tînin. Ev yek li ber medyaya Kurdî de astengiyeke din e ku divê were bihartin. Rojnamegeriya Kurdî jî ji dema zayîna xwe ve bi dijwarî, ê, asteng û qedexeyên bi curbucur re rûbirû maye. Rêwîtiya ku em niha derkevin ne tenê rêwîtiya çapemeniya kurdî an jî medyaya Kurdî ye her wiha rêwîngiya bibiryarî, dijwarî û serkeftinêye jî.

Destpêka rojnamegeriya kurdî

Wekî tê zanîn rojnamevaniya kurdî bi Rojnameya Kurdistan ku di sala 1898 an de derdiketîye destpêdike. Ev rojname 22 Nîsanê de dest bi we anê

kirîye. 22 ya Nîsanê lewma wekî salvegera rojnamegeriya Kurdî tê pîroz kirin û li Kurdistan Ba ûr jî ev roj bi awayekî fermî wekî roja "Rojnamegeriya Kurdî" tê qebûl kirin. Ev rojname di sirgunê de derket holê ango mejûya rojnamegeriya Kurdî bi sirgunê derdikeve holê. Rojnameya Kurdistan ji alîye Miqdad Mîdhet Bedirxan ve li Qahîreyê hatîye derxistin. Di dîroka me de gelek ti tî "cara pê in" ji alîye malbata Bedîxanan hatîye pêkanîn. Rojnamegeriya Kurdî jî wisa bûye. Pi tî Miqdad Mîdhet Bedirxan birayê wî Ebdurrehman Bedirxan dest bi we andina wê kir. Rojnameya Kurdistan pi tî Qahîre li Swîsre û Londonê jî hatîye derxistin. Hejmarê dawîya Rojname Kurdistan (no: 30-31) 14 adar di sala 1902 yê derket. Destpêbûna rojnamegeriya Kurdî li gorî ciranên me pir dereng nîne. Lê ji ber astengiyan bi qasê cîranên me pê veneçuye.

Rojnamegeriya kurdî di navbera salên 1900-1950'an de

Pi tî Rojnameya Kurdistan di sala 1918 de ji alîye rew enbîrên me ku ji pê veçunên vê demê sudvergirtibûn bi navê "Jîn" kovarek derxistin û 21 hejmara wî kovare derçû. Di heman demê de him li her perçeyê Kurdistanê de him ji di gelek welatên din de gelê Kurd gelek rojname û kovar derxistin. "Kürd Teavun Ve Terakki Gazetesi" 1908 ji aliyê Kürd Teavun Ve Terakki Cemîyetî li Stenbolê hat derxistin. Di wê demê de ev rojname gelek deng da û bandorekî mezin li ser gelê Kurd kir. Her wiha kovara "Kurdistan" 1908-1909-Stenbol, "Amîda Re" 1909, "Peyman" 1909-Dîyarbekir, "Rojî Kurd-Hetawî Kurd" 1913 ji aliyê Komala Hêvî, "Yekbûn" 1913 û hin kovar û rojnameyên din jî hat we andin. Di sala 1919 kovara KURDISTAN li Stenbolê hat derxistin. Di sala 1923an de li Siwêrg rojname "Îrfan" derket. Di 1929 an de ji aliyê serokê serhildanê Agirî îhsan Nurî Pa a Rojnameya "Agirî" ji gelê Kurd re hat pê ke kirin. Li Tirkîye ji ber zordestiya rejîma fa îst a Tirkan gelê Kurd maweyekê dirêj bédeng ma.

Lê perçeyên dinê Kurdistanê de bi taybetî Kurdistan Ba ur de gelek rojname û kovar wekî "Rojname Umêdî istiqlal, Suleymanî, 1923", "Rojname Bangî Heq, Suleymanî, 1923", "Rojname Pê kewtin, Suleymanî, 1920", "Kovara Peyje Bexdad" 1927, "Rojname Rojî Kurdistan, Suleymanî, 1922", "Rojname Rêya teze, Erîvan, 1930", "Kovara Rûnakî, Hewlêr, 1935", "Kovara", "Rojname Rojanû, 1943", "Rojname Rêga li rojhilatê Kurdistanê jî Mehabad, 1948", "Rojname Rawêj, Mehabad" hatibûn derxistin. Salên çilan di dîroka ba urê Kurdistanê de, bi xwe re ge bun û pê ketinê di jiyana siyasî û çandî ya wê perçeyê de tînin. Ew salên xurtbuna tevgera Kurd ya netewî bun û salên damezirandina partiyên siyasî bi taybetî PDK ku programên wan yên pê ketî di warê guhertinkariyên civakî de hebûn. Di gel vê yekê bi heman rihê gelek kovar derdiketin. Gelawêj kovarekê wê demê bu ku roleke mezin belavkirina bîrûbaweriyên pe ketinxwaz û çandî de lîyst Kovara Gêlawêj bi rastî jî stêra ge a rojnamegeriya kurdî bû. 1949ê de jî kovara serbixwe ya siyasî bi navê "Nîzar" derket.

Di sala 1932'an de li amê kovara bi navûdeng Hawar dest bi we anê kir. Xwedîye wê kovare Celaled Elî Bedîrxan bû dîsa Bedîrxanek di dîroka Kurdan de guhertin û erxekek mezin pêk anî. Hawar bi tîpên latinî dest bi we anê kiribû. Cara yekem bu ku elfebeya latinî bo kurdî dihat cêbecekirin.

Bi Hawarê edî kurdî xwe ji elfebeya erebî ku zirar dida Kurdî rizgar kiribû. Hawar despêkek nû bû. Bi Hawarê Kurdî bi taybetî Kurmancî û dimilî derbasî

tîpên latini bûbun ku niha jî piranî ev elfebeya ku Celalat Elî Bedirxan destnî an kiribû tê bikaranîn. Hawar dibistanek bu, Hawar wê demê de morelekê mezin da gelê Kurd. Vê kovare anenava xwe li dîroka Kurdan da ku ev anenav êdî naye jêbirîn. Kovara Hawar hejmarê xwe ya dawîn (hejmara 57.) sala 1943an de derxist. Di sala 1998an de ji We anên Nûdemê hemû hejmarên kovara HAWAR bi 2 cild hat we andin. Pi tre Celalat Elî Bedirxan kovarekê biwêne bi navê Ronahî derxist. Ronahî de giranî dengûbas hebun. Ronahî jî bo çapameniya Kurdî de gavekê girîng bû. Li Komara Kurdistanê ku li Mahabadê hatibu avakirin rojname û kovarên fermî wekî Bangî Kurdistan hat derxistin û di varê rojnamegeriya Kurdî demekê kin de gelek ti t hat pêk anîn. Pi tî rûxandina Komara Kurdistanê jî ev pê veçun bi awayekî xwezayî qut bû.

Rojnamegeriya kurdî di navbera salên 1950-1980

Pi tî demekê dirêj rojnamegeriya kurdî bédengiya xwe li Kurdistan Bakur ikand û bi rêberiya wek kesên Musa Anter, Edîp Karahan bi tirkî be jî hêdî hêdî ber bi dewlementir buyîne ve çû. 1949 an de ji aliyê Musa anter ve rojname "Dicle Kayna 1 (Çavkaniya Dicle)", 1950 de jî "ark Mecmuası (Kovara Rojhilatê) hatîye derxistin. Di wan rojnameyan de kê aya Kurd dihat nîqa kirin û hin nivîs û helbestên Kurdî jî dihat we andin." arkin Sesi (Dengê Rojhilatê) jî rojnameyekê girîng ê wê demê bû. Pi tre rojnameya "Îleri Yurd (Welatê Pe ketî) di sala 1958 an de li Diyabekirê hat derxistin. Di vê rojnameyê de helbestekê Kurdî bi navê "Qimil" di nav nivîsa Musa Anter de hat we andin. Li ser vê helbestê gelek doz ser perpirsyarên rojnameyê hat vekirin û ev buyer gelek deng ve da. 17'ya Çileyayê pê in a 1959'an de digel hin xwendekarên zanîngehan 49 ronakbîrên Kurd hatin girtin. Ev buyer bi navê buyera 49'an tê nas kirin. Salên 60î de hejmara we anên perîyodîk zêde bûbû. 1962'an de li Ferqînê "Silvan Sesi (Dengê Ferqîn)", dîsa 1962 de ji aliyê Edîp Karahan û Ya ar Kaya ve rojnameyê "Dicle-Firat" het derxistin. Di sala 1963 de ji alîye Ergun Koyoncu û Ya ar Kaya ve kovareke bi navê "Deng" hate derxistin. Ev kovar jî di nav çapameniya Kurdî roleke ba lîst. Her wiha li Kurdistan Bakur rojname û kovarên wekî -bi Kurdî û tirkî- "Roja Nêwe" 1963, "Çira" 1965 ji aliyê Kemal Burkay ve, "Yenî Aki (Herîkîna Nû)" 1966, "Dengî Teze" 1966, "Karakoçan" 1969, "Mardin'in Sesi (Dengê Merdînê) 1969, "Do u (Rojhilat)" 1969, "Dengê Siwêreg" 1969, "Bultena DDKO" 1970 hatibun derxistin. Sala 1975'an de kovareke bi navê "Ozgurluk yolu (Riya azadî) dest bi we anê kir û heta 1980an 44 hejmarê ev kovare derket. Di kovara "Ozgurluk yolu (Riya azadî) de bi zaravaya dimilî jî nivîs hebûn. Li gor gotina xwediya kovare Faruk Aras tîraja vê kovare nêzî 10 000 bû. Ji ber zordestiya Dewleta tirk we ana "Ozgurluk yolu (Riya azadî) hate rawestandin. 1976'an de ji aliyê PDK-Tirkîye kovara "Xebat" hat derxistin. Sala 1976'an de kovareke mehane bi navê "Rizgarî" dest bi we anê kir. Ev kovar 4 sal we anê xwe domand. 1977'an de "Pê eng Bo ore" cihê xwe di nava kovarên temenkin de girtibû. Kovara "Devrimci Demokrat Gençlik" di sibata 1978an de li Stenbolê dest bi we ana xwe kir. Pi tî 3 hejmarên pê in îdarexaneya wê ji Stenbolê guhaztin Diyarbekirê. Kovar ji mehê carekê bi tirkî û kurdî (kurmancî-dimilî) derket. Kovar li ser hev 11 hejmar derket. Hejmara yekem 20 rûpel yên din jî her yek 16 rûpel bû û hejmarên 5-6 û yên 7-8 bi hev re çap bûn. (1) Tîraja wê di navbera 10.000 û 12.000 de bû Dîsa



1977'an bi navê "Roja welat" rojnameyekê giranbuha dest bi we anê kir û heta sala 1986 a we anê xwe domand. Her wiha "Xebat bo rizgariya Kurdistan" 1978-ji aliyê PDK-T, "Dengê Kawa" 1979, "Kawa" 1978, "Ala Rizgarî" 1979, li Wanê "Jîna Nû" 1979, li Entabê "Têko in" 1979, û gelek kovar û rojnameyên din jî hatibun derxistin. 1979'an de li Kurdistana Bakur yekem car xwerû bi Kurdî kovarekê bi navê "Tîrêj" derket. Ev kovar jî bi hewlên cewsandinê re dûçar ma.

Li Kurdistana ba ur di navbera salên 1950-1980 bi girêdayê têko îna rizgariyê ve bi rêberiya Nemir Mistefa Barzanî çapameniya Kurdî jî pê ve diçû. Di vê konaxê de, rojnameya "Xebat" ya ku 1955ê wekî organa Partî Demokratî Kurdistanê (PDK) derdiket. Berê navê vê rojnameyê "Rizgarî" bû li 1953ê kongireya PDK de navê wê kirin Xebat. Wê demê de rojnameyekê din jî li Kerkûkê bi navê azadî dihate derxistin. Her wiha kovar û rojnameyên wekî "Dengî Das, Suleymanî" 1950, "Peyam" 1952, "Kestî" 1958, "Kovara Çareserkirdinî Ki tukul" 1959, "Dengê qutabyan, Bexdad" 1960, "Afret" 1960, "Rojnama Çiray Kurdistan, Suleymanî" 1962, "Tûtun" 1964... Pi tî morkirina peymana otonomiya Kurdistan di rojnamegerîye Kurdî pe keftinek berbiçav çêbû. Di wê demê de rojnameya "Hewkarî" 1970, kovara "Beyan" 1970, kovara Rojî Kurdistan 1971, kovara Ro ibbîrî Nwê 1973, rojnameya Xebatî Kurdistan derket. Wê konaxê de tenê rojnameye Birayetî ku organa PDK bû bi duristî rojane derdiket. "Asoy zankoy" 1977, "Estêre" 1974, "Bîrî nuwê" 1973, "Bilawkirawey Berew ronakî", "Çiya" hewlêr 1970, "Dengî mamosta" 1970, "Dengî Cotyar" 1971, "Estêre" 1971, Nûserî Nwê 1972, "Amanc" 1973, "Hu yarî Kirêkaran" 1973, "Korî Zanyarî Kurd", 1973, "Baba Gurgur" 1973, "Bo Pê ewe" 1973, "Rêbazî nû" 1975, "Gizing, Kerkûk" 1973, "Hewalnamey ore" 1978 jî hin kovar û rojnameyên wê demê bûn. Di salên 1976-1984an de erê birakujiyê, yê di navbera hêzên Kurdî de, di rojnamegeriya wan de jî cihê xwe girt û ew erê gotinan di radyo û rojnameyên wan de bû egera dilsariya gelê kurd û ervanên wan û devberdana gelek kesan ji endamtiya xwe di wan partiyan de. Pa e ew hemu partî di Bereyê Kurdistanî de gihane hev û erê birakujî rawestiya.

Rojnamegeriya kurdî di salên 1980'an de

Di destpêka salên 80an de li Kurdistana bakur û tirkîye cunteya le kerî hat ser hukmê. Bi hezaran Kurd hate girtin û ku tin. Zulm û zordariyên nedîtî li ser gel hat pêk anîn. Lê têko îna gelê Kurd jî ber bi xurt bunê ve diçû. Edî gelê Kurd li bakur hêdî hêdî hi yar di bû. Di wê konaxê de jî "hin partîyan" a iyên mezin dikirin. Lewma jî çapamenîyeke yekgirtî çenedibû. Salên 80an de li her perçeyê Kurdistanê de têko îna rizgariya netewî ge tir bûbû. Bi wê yekê re girêdayî di her warê jiyânê de gelê Kurd pê diket. Rojnamegeriya Kurdî jî hin xurtir bû wê konaxê de. Li bakurê Kurdistanê tesîra ore a ba ur ku bi rêberiya Mistefa Barzanî pêk dihat gelek mezin bû. 1981an de kovareke bi navê "Xebat Ser Riya Barzanî" dest bi we anê kir. Dewleta Tirk nedixwest ore a ba ur ser gelê Kurdistana bakur de bibandor be. Ev armanca xwe jî bi destê hin "partiyên Kurd" dikir. Li bakurê Kurdistanê kovar û rojnameyên wekî "Pê merge" 1983, "Berhem", "Dengê Partîzan" 1986 (Organa TKP/ML navçeya Kurdistan), "Toplumsal Dirili (Vejîna Civakî) 1987, "Ozgur Gelecek (Dahatûya Azad) 1988," ewqa Berxwedan" Amed 1989 hatibûn derxistin. Kovarekê

herî girîng a wê demê kovara Medya Gune i (Roj Medya Medya) bû. "Medya Gune i kovara yekem bû ku pi tî cuntaya 12ê îlonê derket û bi derketina xwe îmaeq mezî li rejîma Îlonê xist. Bêhêvitiya ku di nav gel de peyde bûbû ikand, moralek mezin da gelê Kurd. Berpiriyarên rojnameyê Osman Aytar, Cemal Ozçelik, Yakûp Karademir, Salih Bal, Mahmûd Metîn, Abdullah Kiran, Vedat Aydin, Nusrettin Yuksekkaya, Murat Kizilirmak, Nesih Çilgin û berpirsiyarên buraya Anqerê Abdullah Güler û yê Diyarbekirê Hamdullah Akyol hatin girtin, di hepsan de man, ceza girtin, teda û zilm dîtûn. Bêguman Medya Gune î di dîroka rojnamegeriya Kurdî de ciyekî taybetî digre ji ber ku di dema xwe de bersîva hevcedariyê mezin da. (2) Kovara "Deng" ku hin jî we anê xwe didome di sala 1989an dest bi we anê kir. We anê ev kovarê nêzî sîyaseta PSK (Partîta sosyalîsy Kurdistan) ye.

Li ba urê Kurdistanê bi xurtbuna ore ê gelek rojname û kovarên Kurdî jî bo belawkirina ramana neteweyî dihat çapkirin. "Riwangey azad" 1980, "Rêbazî pê merge" 1980, "Bilawkirawey Dengî lawan" 1981, "Kovara Alay surî kurdayetî" 1981, "Nûserî Kurdistan" 1981, "Estêre" 1982, "Raperîn" 1982, "Xebatî mamosta" 1982, "Kovara Kurdistan" 1982, "Kariwan" 1982, "Bilawkirawey Edebî bêgane" 1982, "Dengî Pê merge, ore a ba ûr" 1983, "Rêya serkeftinê" 1983, "Rojnama Serbexoî" 1983, "Kurdayetî" 1983, "Rêbazî lawan" 1983, "Dengî xwêndekaranî Kurdistan" 1983, "Bila wkirawey Asos" 1984, "Bilawkirawey Edebî mindalan", "Rojnama Behdînan" 1982, "Kovara Pîrozî islam" 1982, "Bilawkirawey Hawdeng" 1983, "Peyamî ore î kurdistanî ba ur" 1984, "Bilawkirawey Nîrgiz" 1984, "Pala" 1984, "Ro inbîrî pê merge" 1984, "Rizgarî" 1985, "Dengê me" 1985, "Peyamî birayetî" 1986, "Peyamî kirêkaran" 1986, "Tendurustî û komel" 1987, "Qendîl" 1987, "Rojnama Berey kurdistanî (Organa Berey Kurdistanî)" (1988), "Helwêstî Edebî" (1988), "Terazû" (1989), û gelek kovar û rojnameyên din jî wê demê de li ba urê Kurdistanê li bajarên wek Hewlêr, Silêmanî, Kerkûk û Duhok dihatin derxistin. Derbarê rojname û kovarên han de agahiyên berfirehtir -wekî navên berpirsiyarên wan û bi gi tî serpehatiya wan bi çî rengîye- tuneye ku bidim.

Her wiha li Rojhilatê Kurdistanê jî kovarên wekî Sirwe 1984, Lawan 1983, Dengî Lawan 1984, Pê rew 1984 û hwd... derketibûn. Li Kurdistana Sûriye jî Xunav û 4-5 kovarên din hebû.

Rojnamegerî û medyaya kurdî di salên 90'î de

Salên 90'î di mejûya Kurdistanê de werçerxanek girînge. Bizûtneweya rizgariya Kurdistan li her be ê Kurdistanê de ge tir bû. Hemû bajarên Kurdistanê de serhildanên mezin pêkdihat. Li bakurê Kurdistanê hesta neteweyî bilind bû bû. Di serî de Amed, irnex, Merdîn, Wan û gelek bajarên bakurê Kurdistanê serhildanên mezin çêdibû. Li ba urê Kurdistanê têk çûna ore ê, qetlîamên ser xalkê Kurdistan ku ji aliyê rejîma Iraqê dihat kirin morela gel xirab kiribû. Karesatên wekî anfal, Helebce hêviya gel ikandibû. Lê sala 1992an de gelê Kurd li ba ur delfetek ba bi dest xistin û cara yekem gelê Kurd bi hêviyên mezin hilbijartina Parlemana xwe çêkir. Edî be ekî Kurdistan ne bin destê dagirkeran bû. Edî gelê Kurd li be ekê Kurdistanê de dikarî bû bêhn bigre. Bi zor û zahmetiyên be jî hêviya

sedsalan pêk hat gelê Kurd jî mafêxwe ya xwezayî bikar anî. Wekî hemû netewan pêwîst bû ku gelê Kurd jî xwediyê dewletek be. Pi tî avakirina Parlemen û Hikumeta Kurdistan DEWLETA FEDERE A KURDISTAN (DFK) jî hat îlan kirin. Ku hin jî ser pîyaye. Li bakurê Kurdistanê we ana bi tirkî di nav rojnamevaniya Kurdî de wê konaxê de jî berdewam kir. Destpêka salên 90'î de rojnameya "Halk Gerçe i Rastiya Gel" dest bi (we anê xwe kir û di nava salekê de ji aliyê dewleta Tirk hat girtin. Ev rojname îcar bi navê "Yenî halk gerçe î (Rastiya Gel a Nû)" we anê xwe berdewam kir, ev jî heman salê de hat girtin. 1990an de rojnameyeke din bi navê "Yenî Ulke (Welatê Nû) dest bi we anê kir û ev rojnameye rekora Cîhanê ikand, di nav salekê de 55 doz hat vekirin, 30 caran hat girtin, 18 car jî hat civandin. Ev rojname jî 1993an de hat girtin. Her wiha wê demê de bi navên "Ozgur Halk (Gelê azad)" 1990, "Serhildana Gel" 1990 2 kovar derket. 1991an de kovarekê illegal ku navê wî "Xebat Bo Serxwebûna Kurdistan" bû ji aliyê komîteya Navendiya PDK li bakurê Kurdistanê 6 hejmar hat derxistin. "Li Welat" jî ku organa we aniya nav welat a KUK-SE (Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistanê) bû 1991an de derket. Dîsa 1991an de kovara "Newroz" hate derxistin. 1991 an de cara yekem di dîroka rojnamegeriya bakurê Kurdistanê de rojnameyekê xwerû bi Kurdî bi navê "ROJNAME" hat derxistin. Çi mixabin ev rojname ji aliyê "hin derdoran" hat asteng kirin û tenê hejmareke vê rojnameyê derket. Her wiha 1991an de li Dîyarbakirê kovarekê bi Kurdî-Tirkî bi navê "Govend" derket. 1992an de ku ev sal teko îna gelê Kurd jî û zilma dagirkeran jî gihî t asta xwe ya herî bilind ji aliyê Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) kovareke bi Kurdî (Kurmançî û dimilî) hat we andin û demekê dirêj we anê xwe domand. Kovarên bi wî rengî tevkarîyek pir mezin dida wêje û çanda Kurdî. Kovarên "Newroz ate î (Agirê Newrozê)", "Ehmedê Xanî", "Serketin", "Yurtsever Gençlik (Ciwaniya Welatparez)", "Komel" jî hin kovarên girîng ê wê demê bûn. Kovara "Nûdem" jî 92an de li Swêdê de dest bi we anê kiribû lê dihat bakurê Kurdistanê jî. Ev kovar di pê xistina wêjaya Kurdî de rolekî ciwan lîst. 1992an de pi tî rojnameya "ROJNAME" duyemîn rojnameye xwerû bi Kurdî rojnameya "Welat" dest bi we anê kir. Dîsa 1992an de yekemîn kovara pêkenîn li bakur kovara "Tewlo" derket. Her wiha rojnameya "Azadî" jî 1992an de dest bi we anê xwe kir. Ev rojname bi Kurdî û tirkî bû. 1992an rojnameyekî din "Ozgur Gundem (Rojeva azad)" jî dest bi we anê kiri bû. Ev rojname jî ji aliyê Dewleta Tirk ve hat asteng kirin, rojnamevanên vê rojnameyê hat ku tin û e kenece kirin, belavkerên wan jî dihatin ku tin. Rojnameya "Armanc" jî rojnameyeke hêja bû ku 1992an dest bi we anê kir û di dîroka rojnamegeriya Kurdî de cihê xwe girt. Rojnameyên Kurdî wê demedê dihatin girtin û bi navêke din we anên xwe berdewam dikirin. Mînak "Welat" hat girtin bû "Welatê me" (1995), Azadî hat girtin bû "Dengê azadî" (1994), Dengê azadî bû Ronahî, Ronahî bu Hêvî, Hêvî bû Roja Teze, Roja teze jî niha "Dema Nû" ye. Piraniyên kovar û rojnameyên Kurdî wek perperikan temen kin bûne. Lewma listeyeke pir dirêj derdikeve holê û em li vir de nikarin derbarê hemûyan de agahî bidin, ev encax bi pirtûkek lêkolînî de dikarê bêne kirin. Pi tre bi girtin û zordariyên mezin "Ronahî" (1995), "Hêvî" (1996), "Jiyana Nû" (1995), "Roj" (1995),



"Nû roj"(1996), "Yenî Polîtîka (Polîtîkaya Nû)" 1995,"Ozgur Ya am (Jiyana Azad)"(1996), "Demokrasi"(1996), "Jiyana Rew en"(1997) gelek kovar û rojname hat derxistin.Wê demêde zordarîyeke pir mezin ser rojnamegeriya Kurdî hebû.Dewleta Tirk di hovîti de sînor nasnedikir. Mînak 1994an de avahiya rojnameya Ozgur ulke hate bombekirin.Lê edî Komara Tirk fêhm kiribu ku bi tu avayî nikaribe dengê gelê Kurd qut bike.We anvaniya Kurdî de heta destpêka salên 2000î bi kovar û rojnameyên wekî "Ulke Gündem","Stêrka Rizgarî", "Pê eROJ", "Yenîden Newroz","Jujin","2000'de yeni Gündem","Roza", "Zend","Demokrasiya Nû, "War","Roja teze", "Gulîstan","Pêlîn", "Yedîncî Gündem(Rojeva Heftemîn)", "Rojev",Kovara mîzahî Pîne serpêhatiya xwe domand. Her wiha salên 90î de gavek pir mezin vebûna Televîzyona yekemîn a Kurdî ku li seranserî Kurdistanê û 80 welatên Cîhanê de we an dikir MED TV bû.Her çikas wê demêde hin televîzonên Kurdî li ba urê Kurdistanê hebe jî ne satalytî û netewî bûn.MED TV sala 1994an de dest bi we ane kir û sînorên navbera perçeyên Kurdistanê hinek be jî rakir.Di serîda Tirkîye û dagirkerên din gelek caran bi cureyên curbucur êrî î MED TV kirin.MED TV 1999an de hat girtin.

Ba urê Kurdistanê de pi tî îlan kirina DEWLETA FEDERAL A KURDISTAN(DFK) wê perçeya Kurdistanê de her çikas ne fermî be jî dewletek serbixwe hat avakirin.Parlemena Kurdistan, Hikumeta Kurdistan,Wezaretên Kurdistan hemû dezgeh,sazî, komale, sendîka, yekîti,partî bi nasnameya xwe ya Kurdeyatî li gor rêzikên hikumeta Kurdistan li ser karê bûn.Ev azadî tesîra xwe ser çapameniya Kurdî jî kir.Destpêka DFK de ji ber astengiyên polîtîk û aborî dezgehên media tunebu. 2-3 katjimêr televîzyonên PDK Û YNK we an dikir.Organên fermiya Hikumeta Kurdistan tunebun tenê organa Hikumetê rojnameya "Herêm" hebû. Belam ba urê Kurdistanê her roj berew pê kewtin û dewlemend buyîne ve diçu.Ev pêvajo de erê "birakuji" derbeyek mezin moral û baweriya gelê Kurd û pê ketina Kurdistana azad xist.Ji ber ku li Kurdistan azad wekî Kurdistan Bakur "girtin" tune bu lewma jî rew a rojnamegeriya Kurdistan ba ur wekî bakur bi girtin,ku tin û ji nû ve vebûnên re ne tijîye.Li Kurdistana ba ur we anvanî de profesyonelî pê ket û kovar û rojnameyên curbucur hat derxistin.Kovarên tenduristî,siru tî,wêjeyî,musîkî, çandî,hunerî,wêneke î, erdnîgarî, zanistî, nuçeyî, werzi î û hwd... Pi tî azadiya be ekê Kurdistan ba ur rojname û kovarên wekî "Alay ore ", "Baban","Bûn","Demokrasi","Êsta","Gazî","Gelawej î Nwê","Gulan", "Karwan, "Serab", "Serboxoî (oragana Partî Serboxoî Dîmokratî Kurdistan), "Wêran","Raman","Rûnakî" dest bi we anê kiribun. Pi tre roj bi roj kovar û rojnameyên nû dest bi we anê kirin.Ji ber ku hejmarên wan gelek in ezê tenênav û salên wan bidim.Her yek bi serê xwe di pê xistina çand,huner,muzîk, edebîyat, hestên neteweyî, modernîzasyona Kurdistan,dîplomasi û pê xistina civaka Kurdî de cihêkî girîng girtine.

We anên ku heta salên 2000î li Kurdistana Ba ur derketine

Kovara Karwan bo zanistî mirovayeti(1990), Rojnama Alay azadî(1991), Kovara Edebî kirêkar(1991),Rojnama Aborî-Hewlêr-(1992), Bilawkirawey Encûmenî Ni timanî Kurdistan-Hewlêr-(1992), Kovara Alternatif(1993), Rojnama Mafnas(1991), Kovara Newroz-Duhok-(1992),

Rojnama Werzi û lawan(1992), Kovara Berhemî bawer (1992), Rojnama Pale-Raniye- (1992), Rojnama Parêzgaran(1992), Kovara Sînema(1992), Kovara Nojdar(1992), Kovara Peyamî wergêr(1992), Kovara Mehabad-Duhok-(1992), Kovara Perîsitan (1993), Kovara Çeleng-Zaxo-(1992), Rojnama Dengê Mirov,Hewlêr, Kovara Dengê Zana(1993), Bilawkirawey Dengî kirêkaran(1993), Bilawkirawey dengî zanko-Suleymanî-(1993), Kovara Riwaney cîhan(1992), Rojnama Rizgarî(1993), Rojnama Serhildan-Duhok-,Kovara Kazêwe (1994), Rojnama Emro(1994),Kovara Cemawer-Helebçe-(1994), Kovara Peyv(1995),Rojnama Ayinde (1996), Kovara Ayind(1997), Kovara Bizava pala(1998), Kovara Peyv (1997) , Kovara Pêla serbest, Bilawkirawey Tekan,Kovara Dengêk(1996), Kovara Dozinewe (1997), Kovara Dengê xondevan-Duhok-, Kovara Kildanî-Duhok-(1999), Rojnama Rêgay dîmokratî(1998), Kovara Nivar-Suleymanî-(1998), Kovara Ro enbîrî kildanî(1999), Kovara Serdem(1999), Kovara Serê rê(2000), Kovara Huner, Rojnama Awedanî(1991), Kovara Ezmûn (1991), Kovara azadî-Silêmanî-(1991), Kovara Aborî û komel-Silêmanî-(1992), Kovara Kelepûrî kurd (1992), Rojnama Babe gurgur-Kerkuk-(1991), Kovara Nûxazî(1991), Rojnama Bopê ewe(1992), Rojnama Hewlêr(1992), Kovara Beyan-Kerkuk-1992,Kovara Belên (1992), Kovara Pirone-Kerkuk - (1992), Kovara Senger, Bilawkirawey epol (1992),Kovara ebeng(1992),Kovara aristanîyet (1992), Rojnama Perlemana Kurdistan (1992), Kovara Me ixel(1992),Kovara Pi tgîrî(1992), Rojnama Peyman-Duhok-(1994), Kovara Çermû-Çemçemal-(1992), Bilawkirawey Dengî kirêkaran-Duhok-(1992), Kovara Heng (1993), Kovara Derwaze-Raniye-(1992), Kovara Diwaroj(1994), Rojnama Dahênan, Kovara Pênîsans(1993), Rojnama Rêgay Rencderan-Duhok-(1993), Kovara Jîn(1993),Kovara Jîyar-Duhok-(1993), Rojnama Alay Hilbijartin (1994),Kovara A tî(1994), Kovara Ezmîr-Helebça-(1995),Kovara Pê merge(1995), Kovara E keft, Kovara Awat û Hêvî(1998), Kovara Avêsta-Duhok-(1998),Rojnama Behra(1998), Belavoka Pale-Duhok-(1998), Kovara Peyrew (1998), Bilawkira wey Taman,Kovara Tûe ûî zanistxiwazan (1998), Kovara Duhok(1997),Kovara Dicle(1998), Kovara Diyalog(1998),Rojnama Dengî qela(1999), Kovara Dengvedan-Zaxo-1997,Belavoka Dengê pîroz (1998), Rojnama Raperîn(1997),Kovara Rêbazî çandî(1998), Kovara Qelay Hewlêr(1998),Kovara Namey akrê-Akrê-(1998), Kovara Hamûn-Koye-(1998), Rojnama Rêberî pê merge, Bilawkirawey Rojnamenûs (1999), Rojnama Rojnamewanî (2000), Kovara Jîyar-Duhok-, Kovara Senterî lêkolînewey sitratîcî (2000), Rojnameya Dilname - Sûriya , Kobanî - (1-12-2010) - dilname.wordpress.com.

û gelek kovar û rojnameyên din jî heye nivîsandina navên wan zehmete li Kurdistana azad hatîye derxistin.

Li Kurdistana rojhilat jî gelek kovar û rojname derketîye.Hinek wana ewin.Rojnama Auyer-Sine-(1997),Kovara Rewandiz-Rewandiz-(1996), Rojnama ehade...

Hin kovar û rojnameyên ku di salên 90-2010 an de li Kurdistana Sûriye derketine evin: Kovara Aso (1992),Rojnama Xwendevan(1997),Rojnama Deng (1995), Rojnameya Dêmoqrati, Rojnameya Yekîti, Rojnameya Dilname - Sûriya : Kobanî - (1-12-2010) - www.dilname.wordpress.com.

Rojnamegeriya kurdî ya derwey welat

Gelek kovar û rojnameyên Kurdî li derwey Kurdistanê jî derketîye lê çerçoveya ev nivîsê de nînin,çunke ên ku qet nakevin hundirê Kurdistanê zêde sûda wan tuneye.Ez dîsa jî navê hinek wan didim.

Rojnama Rêya teze,Erîvan, 1930-Rojnama Kurdistan, Azirbeycan, 1947-Kovara Kurdistan, Ingeltere, 1958-Kovara Kurd, USA,1963-Rojnama Bangî Kajîk,Berlîn, 1968-Kovara Pê merge, Finland, 1974-Kovara Kolnedan, London, 1976-Rojnama Armanc,Swêd, 1979-Kovara Bel avok, Swêd, 1979-Kovara Rizgariya Kurdistan, Swêd, 1979-Rojnama Barzan, USA, 1981-Kovara Berbang,Swêd, 1982-Kovara Bangî Kurdistan, Hungarya, 1982-Rojnama Berxwedan, Swêd, 1983-Kovara Berbangî Kurdistan,Swêd, 1984-Kovara Helebçe, USA, 1986-Kovara Berhem, Swêd, 1987-Kovara Bingeh, Frankfurt, 1988-Kovara Peyvînuîe, London, 1991-Kovara Bangî rastî,London, 1991-Kovara Aware, Holanda, 1992-Kovara Dîdar, Swêd, 1992-Kovara Penaberîkurd,Pakistan, 1991-Kovara Kilawrojene,Pakistan, 1991-Kovara Çanda gel, Beyrût, 1991-Kovara Kurd,Kazaxistan, 1992-Kovara Gelavêje, Gurcistan-Kovara Roj, Swêd, 1993- Kovara Raperîn,USA, 1993-Kovara Dengî Gel,USA û Keneda, 1982-Bilawkirawey Dengî kurd,Finlanda, 1994-Kovara Çira,Swêd, 1995-Kovara Helwest, Swêd, 1995-Kovara Jîndan, Swêd, 1996-Kovara Nûdem Werger,Swêd, 1996-Kovara Rojba ,Swêd, 1996-Kovara dengubasî Kurdistan, 1996-Kovara Ava îin,Stokholm, 1996-Kovara Agahdarî, Brusel, 1996-Rojnama Zayele, Darmstadt (Elmanya), 1996-Kovara Peyam, London, 1997-Kovara Însiyatîf, Swêd, 1997-Kovara Çiwarçira,Yogoslavya, 1998-

Bilawkira wey Awedanî, London, 1998-Kovara Helale, Nürnberg (Elmanya), 1998-Kovara Pênûs, Elmanya, 1999-

Rojnamegerî û mediyaya kurdî ya îroyîn

Pi tî destpêka salên 2000î wekî hemî Cîhan, Kurdistan jî xwe guhert.Belê Kurdistan hin jî ne serbixwe ye,hin jî ne yekbuyîye.Lê gelê Kurd li gel hemu a itî û xete yên xwe,nîha asta ge epêdan de ye.Tevgera netewiya Kurd hêdî hêdî fêrî xwe helsegandine dibe.Teknolojî di leha xalkê Kurd de pê dikeve.Kurd nêzî hev dibe.Buyerake li Hewlêr an Qami lo,Amed an jî Mehabad dikare Kurdên hemû perçeyê rake ser piyan.Di vê ti tî de bandora herî mezin bi pê ketina teknolojî û livdarbuna hi mendiya neteweyî gelê Kurde.Jixwe ji ber ne serbixwe buyîna welatê Kurdan bi %100 rêkûpek buyîna mediyaya Kurd ne gengaze.Kê eya zaravayan jî mîna berê ne mijareke ku di nava gelê Kurd de bibe egera sar buyîne.Tenê hin pirsgirêkên teknîkî derdixê holê.Bi bikaranîna yek elfebe dibe ku ev problem jî ji holê rabe. Êsta bi dehan rojname,bi dehan tv û radyo,bi sedan kovar,bi hezaran jî malper hene.Û heta niha ji dûhezarî(2000) zêdetir kovar,belowok û rojnameyên kurdî derketîye. Li Kurdistana Azad wekî GULAN,XAK ,SERDEM, RESEN,DUHOK grubên medya jî mewcûde.

Jêder: Wikipedia kurdî. orişinala gotarê: Serhad B.RÊNAS

Feqî Kurdan (Dr. Ehmed Xelîl)

dralkhalil@hotmail.com

Ol û Destlat Di Pêvajoya Dîrokê de

Tê xuyan ku di eva serdemê de, pêwîste em çar mijaran bixin bin lêveger û lêkolînê, ewan jî evin:

- 1 – Ma rew a hizra olî di kultûra kurdistanî de çawa bû?
- 2 –Ma kurdan islametî ji bercewendiyên xwe ên neteweyî re bi kar anîn?
- 3 –Ma helwesta fa istên Islamî ji pirsgerêka kurdî çî ye?
- 4 –Ma Islamiyên Kurd tabûra pêncem in di dest dagîkeran de?

Wek pêraxistin ji evan mijaran re, û da ku lêkolîna me bi kok û binyad be, û em di nav axan de wenda nebin, werin em hinekî di mijara (Ol û Destlatê)de biramin.

Hev-têkeliya Ol û Destlatê:

Rêbaza zanistî a herî ba tir ji bo îrovekirina olan ewe, ku em ne ji asemînan (Xwedayan) dagerin erdê (Ademîzadan), nexêr, divyaye em ji rew a ademîzadan de (ên giyanî, entolocî, civakî û konevanî) hilki in asoyên xwedayan, firi teyan û eytan. Û tê xuyan ku ol -bi gi tî- bi sê rolên sereke radibe:

- 1 – Ravakirina hebûna Gerdûn û ademîzadan.
- 2 – Hêvîdariya timhebûnê, û reva ji mirinê.
- 3 – Pêkanîna hevtêkeliyên bi rêk û pêk di civakê de.

Çaxa ku komikên ademîzadan di çerxên kevirî de bûn, mitolocîya wan gelekî pa ketî bû, û di bin bandora du baweriyên de dicivyan:

1 – Animizim: Ango bawerîya hebûna giyanan di tî tî sirûtê de, hin giyanên qencin (xêr)in, hin jî giyanên pîsin (err)in, û mirov kare, bi rêya hin lav, nimêj û cadûbazî (sihir), giyanên qenc bi hêla xwe xe, û xwe ji giyanên nepaqij biparêze (Zangwil: dergeha zanista derûnî a nû, rû 97, 100).

2 – Totemizim: Eva terma ji peyva hindî-emrêkî (Ot- Otîm) hatiye, Totîm bi xwe aferîdeke di awayê acel û înayîyê de ye, ewa sembola kom û êlê ye, êl bawer dike ku ewa bavpîrê wan ê mezine, û parêzgerê wan e, lewre jêre nimêj dikin û xwe bi wî dinasînin, û bawer dikin ku ewa sirû ê (ilham, wehî)-bi rêya hin aferînan- ji wan re bi rê dike, ji bo vê jî ew wêneyê wî li ser gewde û qirqafên xwe dîneqî inin (Dinkin Mit il: Ferhenga zanista civatî , rû 245- 246. Firoyd: Totîm û tabo, rû 23- 25.).

Di serdema êlîtiyê de, Xwedayê Êlî sembola yekîtiya êlê bû, lê di pê re nakokî li ser erdnîgariyê gurr bû, û divyabû (hevgerîna êlî) peyda bibe, li hember ewa rew ê Kongira Xwedayên Êlê (Panteon) jî peyda bû, Xwedayê Mezintir serokê kongirê bû, û hin xwedayên dî jî alîkarê wî bûn, wek nemûne: Li Somer (xweda An, nîl û ngî) (Samuil Kroymir: Ji deqên Somer, rû 189), li Sûrî (xweda Be'il) (Siptîno Moskatî: aristaniyên Samî ên kevin, rû 184), li Yonan (xweda Ziyos) (Cifrî Barindir: Baweriyên olî li gel gelan , rû 66), li Roma (xweda Jopitir) (Will Diyorant: Cîroka aristaniyê , be 9, rû 127), li Mekke (xweda Hubel) (Teberî: Dîroka Teberî, be 2, rû 240).

Di pê re, nakokî ji bo bidestxistina erdnîgariyê gurrtir bû, li ewa rew a nû sazûmana dewleta neteweyî a navend hat damezirandin, ji ber ku ewa kare li hundir yekîtiya gel ê bi cih bîne, û li derva jî li hember dijminan bi hêz raweste, lewre divyabû (tek serok) peyda bibe; ew serokê ku hemî awayên destlatê bi dest xwe dixê, çî bi rengê ke î , an pêxember, an ahî ah, an imperator.

Sê Diyardeyên hemdemî:

Di çarçewa hevbestiya destlatê û ol de, sê diyardeyên hemdemî tî xuyan:

1- Hebûna Tek- Serok: Ji ber ku ewa dikare- bi rêya piropegendayê- hevalên xwe di kongra neteweyî de ji hêza destlatî rût bike, ewan ji xwe re bike dûvelang (mirîd), kar û barê wan ewe ku fermanên wî bi cih bînin, wek nemûne: Sergûnê Ekkadî, Hamurabiye Babilî, Nasir Palê A ûrî, Dara ye Farisî, Xelîfê Erebi, Cengîzخانê Mixolî û Siltanê Osmanî.

2 - Hebûna Tek-Xwedê bê Hempa: Eva Tek- Xwedaya fermana destlatiyê dixê dest Tek-serok, an tek-serok dibe nûnerê wî, ev xwedaya di koka xwe de yek ji xwedayên gir bû, lê karîbû xwedayên din ji destlatê bê par bihêle; wek çawa tek-serok hevalên xwe ên kongerê ji destlatê pê par hê tin, wek nemûne: Merdox (xwedayê Babilan), A ûr (xwedayê A ûran) û Yehwe(xwedayê Cihuyan).

3 - Hebûna Hizra Imperatorî: Tek-serok, bi navê Tek- Xweda, û bi rêya zordariyê û piropegendayê, gel di bin ala xwe de dicivîne, ewan amade dike ku bibin êri van, û dixê rêya bi cih anîna pirojeya imperatorî, helbet nemûne di dîrokê de pirin; hema em pêxember Mihemed wek nemûne bibin.

Hin caran, Serok-xwedayê panteonê nikare- bi rêya nav, reftar û sinciyên xwe- bibe serdarê pirojeya imperatorî (cîhanî), lewre, tek-serok ewa Serok-xweda diguhart, nav, reftar û sinciyên cîhanî bi ser dixistin, hin caran jî xedayekî cîhanî ji kultûreke din kopî dikir, wek nemûne: Imperatorê roman Qunistentînê Mezin, sala 312 an 313 z, dest ji rista olî a xweda Jupîter berada, û kopiyek ji rista olê kirist ê cîhanî kir ola fermî (Firas Sewwah: Firehjêdera dîroka olan, be 5, rû 189), û pêxember Mihemed jî kopiyek ji xwedayê rista olên zerde tî, cuhuyî û kiristî girt, û we tek-xwedayê cîhanê pê kê kir.

Helbet ev ne saziyeke bê awarteye di dîroka gelên cîhanê de, lê bi rastî cihê xwe di dîroka Rojhilata navîn bi hêz girtiye.

A niha ji pirs eve: Gelo,bingeha hizra olî di kultûra kurdîstnê de çî ye, û çawa ye?

Eva ê mijara pa erojê be.

Çî dibe jî, pêwîste Kurdistan were rêzgarkirin!



Ehmed mustefa



Rojnameyên Kurdî

"Rojnamegerî bingehake herî xurte ji bo avakirina lengerên aristanî û avabûnê" ...N. Ponepert. Rojnamegerî nêrîn û ramana gel e, daxwaz pêdivî û armancên netewî diyar dike û dide xuyan .

Sed û pazde salan berê, di rew a neçariyê de, li Misirê "Qahîre" ahsîwarê peyvê, mîrê gewre Midhat Bedirxan dest davêje pênûsa xwe , û kar û xebata rojnameyê dike.

Ew li 22 ya Nîsana 1898 an, yekem rojname bi zimanê kurdî bi navê" Rojnama Kurdistan" diwe îne. Li gor berpirsyar û xwendiyê rojnamê, û mîna ku di hejmara yekê de nivîsiye Rojnama Kurdistan wê her(15) rojan were we andin & .Ucirc; herwiha ji 22ya Nîsanê 1898 ra 31 hejmar ji rojnamê we andin ,hejmarên (1 ra 5) li Qahêrayê, (6 ra 19) li Cinêvê, (20 ra 23) li Qahêrayê , (24)li Londin, (25 ra 29) li Folkston, û (30 ra 31) jî li Cinêvê çapkir û belavkir

-Rojnama Reya Taze di dema 1929 Z.

-Rojnama Kurdistan li& Icirc;ranê di sala 1959Z ra 1963 Z.

-Rojnama Hawar li amê ê ku birayên Bedirxan avakirin di sala 1932 Z ra 1935Z û di sala 1941 ra 1943Z. (57 hejmar).

-Rojnama Ronahî di sala 1942 ra 1945 Z,(28 hejmar) .

-Li Beyrûtê Rojnama Roja nû di sala1943 ra 1946Z,(73 hejma.

-Belavkirin P.D.K ,Rojnama Xebat di dema 1958 an de.

Pê tî dustûra Osmaniya Komela Hîwa Kurd rojnamek heftekî avakir bi navê Roja Kurd, hejmara yekemîn û duwamîn hatin belavkirin û wêneyên herdu mîrxasin mezin binav û deng li ser rûpelê rojnamê belav bû (Seleh dîn Eyobî û Kerîm xan Zend).Ebdilkerîm Efendî ye ku vê Rojnama we ad di sala 1904 an de.Pi tî çend salan navê wê wergerandin û nav lêkirin Hetawa Kurd.

-Rojnama Pê kewtin a yekemîn li bajarê Silêmaniye hatiye damezrandin. Pê tî wê Rojnama Bangê Kurdistan hat belavkirin di 2 Tebaxê 1922an de, 13hejmar hat belavkirin û rawestî, pi tî wê Mehmed Norî Efendî rojnamak heftane avakir bi navê Roja Kurdistan ê ku zimanê Hikumeta êx Mehmed Hefîde kurdî û bin fermana wî de diwe î û heya 3yê Avdarê 1923Z berdewam bû. (15hejmar). Pi tî derketina êx Mehmed ji bajarê Silêmaniyê cara duwamîn rojnamak kurdî din avabû bi navê Bangê Heq, 3 hejmar jê belavbûn û li dû re rojnama Amîdî Estîqlal avabû, û belavkirina wê pir dirêj nekir. hukumeta li Silêmaniyê di sala 1924an de dest bi we andina rojnama Jîyan we kir , û pa ê navê rojnamê di sala 1925 an hat guhartin bi navê Jîyan ta roja îro dibinî navî belav dib.

Di sala 1925 an Mîr Salih Zekî rojnamê k heftane derxist bi navê diyarî Kurdistan ta sala 1926an berdewamkir û dive demê de dora 16 hejmar der çû, piraniya hejmaran di hundurê xwe de wêneyên navdarên Kurdan xuya dikirin, û her wiha di sala 1925 an de Mistefa Pa rojnama bangî Kurdistan derkir li Bexdadê. Lê pir berxwe neda û rawestî. Rew bîrê Kurd Husên Mukiryani rojnamek bi navê Zar Kurmancî li Rewandizê deranê .



Bêkes Têllo

DEKU EM WEKE DEWAR AN NEJÎN...

bo 115 salvegeriya rojnamegeriya kurdî germtirîn pîrozbahî

Di salên demborî de, kî dixwest desthilata ramyarî bidest bixîne, pêdivîbû bandor li le ker bike û bidest bixîne. Îro tenê li welatên sitmkar û totalîter, le ker bi tank û top desthilat dixwe destê xwe de. Gava yekemîn a desthilata nû ku pêk radibe, destgehên ragihandinê dixwe bin bandora xwe. Diyar e! her welat dikeve destê wan kesan ku ragihandinê birêve dibin.

Tê gotin ku carekê ji padî ahekî pirsîn, ji van her penc alavan, kîjan ji dest bernade. Azadî, zêr, navdarî, tendirûstî, ragihandin, padî ah bersiv da: ragihandin. Ragihandinê bidin min, yê dîtir tev karim bidest bixînim.

Guman nîne ku masme diya, hêza herî bi bandore di çerxa me de, û rolek sereke dilîze. Bi gi tî du teorîyên ragihandinê di sedsala 20 de ser dest bûn. A yekem, ragihandina navendî ku Yekitiya Sovyêtê nûneriya wê dikir. Û ya duwem, ragihandina serbest ku welatên Rojava nûneriya wê dikir û dike. Ragihandina serbest, a bi pêlan ji agahiyên pir reng pê kê î civakê dike. Bi hûrbînî rûdanan di opîne, bi belge û hostetî karê xwe birêve dibe.

Gerek em mukir bîn ku di dawiya sedsala 20 de, ev teorî di vê pê birkê de qezenc kir. Ji vê tîgîhi tinê, pêwîstiyek herî jîndewar di teko na me de tê diyar kirin. Li ber çav e ku ev çerx, ne çerxa teko îna çekdarî ye, lê ya ragihandinê ye. Hemû proje bo netewa kurd, gerek ev faktor, ji xwe re bikin rêzbername. Bi taybetî li Rojavaîyê Kurdistan, ku Dayikên kurd mirovek ni tîman perwer neanîn holê ku di dewletê de kar bike. Û bi dilsozî hemû ezmûnên xwe ve, niv ê nû îret bike çawa civat û dewlet tê birêve kirin.

Dewlet weke tîgeh ne abstrakte, lê hevînek taybete weke her perçak ji jiyana me. Li Rojava ev hest em jê kêman, û di pêvajoya tevgera kurd a ramyarî hi yara (zihniyeta) dewletbûn di hi ê welatîyan de, ne çand û belav nekir. Bawerim ev erbeze bûna me ya ku em îro tîde ne, ji wira tê. Mebesta min li vira ji dewletbûn, ne cudaxwaziye, lê fêrkirina hi yara hemwelatîyê kurd bi mîkanîzim û rexistina destgehan, yasa, çandina hestê berpirsiyarî li hember xak û ni timan di hi û giyan wî de. ku xalek bihêze bo duwarojê ji avakirina netewbûnê. Lewra hem welatîyê kurd ne tenê li Rojava lê li perçên din jî, ne tenê dewlet ne ya xwe dibîne, û jê dîr ketiye ji ber pir sedeman. Ne tenê Pê hest nabe û pê mijûl nabe, lê di pîrsa xwe a netewî de, bi hestiyarî tevdi gere ne bi hi mendiya dewletbûn û ramyariyê. Bêguman Kurd hez welatê xwe dikin û pir cangorî didin bo rizgariya wî. Lê dewlet ti teke û civak kurdî ti tekî dîtire. Em bi welat re ne ta hestî, û emê berxwedana wî bikin. Lê Civak û avakirina wê bi wateya rêvebirina cihe û civak- bi alavê rêxistinî ku karibe bi navê gi tî berdevkê civatê be. Alavê ku hemû pêwendiyên civakî, ramyarî û aborî hembêz bike. Mixabin ev tev me nikarî bû pê hest bibin û avabikin. Sedem jî bê hestbûn, bê ê bûna me ye, bê berpirsiyariya me ye li hember xak me, ne tenê ji ber bi dewletê em hest ne dibîn. Lê ji ber nebûna hi yara (zihneyata) dewlet bûnê li ba me, jiber neguhdana me, dijîmineyatî di neqeba me de, xwe bi xwe, û ji ber peyama rûxandin û têkdana her ti tî li Rojava û çav li perçên din diman. Ji hêla dî ve, çîna rew enpîr û bi taybetî rojnamegerî di pêvajoya van salan tevî, nikarîbû kûltûra hev qebûlkirîne bicesipîne di nav rehên civaka kurdî de, û hergav çav li pa sînora bûn bi solganên weke "em kurdistanî ne". Û vava tirajîdiya me yî, ya herî xemgîniye ku pê bîniyek re dide her kes ji me,

mebest jê bi karanîna peyvên qelew bo xapandina mejiyê hemwelatîyan, bo armancên partîti û takekesane. Ew çîna rew enbîrî ku sermeyana netewî û ni tîmanî ye, çanda îre xwe ê rew enpîrî bi piranî ji Arabizmê (bi wateya ji çanda Erebi) mijandî ye, ta niha nikare hin êtîket, pîrînsib û norm bo gel û civaka kurdî biafirîne. Faktorek dîtir heye ku wêranistan bûye, ew jî rojnamegeriya me ye, tevî hin pê ketina wê, lê hîn jî lixware û nizme. Nizme ji aliyê naverok, mijar, kadir, bê ajande yî û bipiranî kesên bo rêvebirina vî alavî ji teko îne dikin, bê perwerde ne, bi bêberpirsiyarî dixebtin. Her kes çî tê ber devê wî dibêje an jî, dinivîsîne, derew, rast jêre ne giring, a giring navdar bibe. Ti kes wî kontrol nake an çavdariya wî bike, cihê gotinê ye, ger wisa berdeham bibe, malwêran kirin li benda me ye. Ewan kesan jibîr dikin ku rojnamegerî erkeke ni tîmaniye, berpirsiyarî ye û ji pîrînsipên wê yê herî giring exlaq, berpirsiyara civakî û hostetî ye, rêzgirtina jiyana taybet a takekesane û mafê mirov, rûmetkirina berjewendiyên bilind ên civakê û bi taybetî berjewendiyên netewî. Rojnamegerî birêvekirin e, çavdariye, gel bi rêve dike deku çavdariya hemû rûdan û qewimiyên aborî, çandî û ramyarî bike. Dihêle raman bibe û bi jiyana ramyarî a demokratî mijûl bibe. Ji bilî vî erkî, pêwîste bi rola xwe ve, a sarete bilîze weke desthilata çaremîn.

Yana jiyana me bê yasa û norm berdeham bike, û emê di xalek girover de hatûcûnê bikin.

Mîkyafilî dibêje: gava yasa asoya xwe wenda dike, mirov weke dewar an jiyane dike. Ev hevokên zîrekane li ser Sûrya dime e, weqas sal ne yasa û ne maf, cewsandina her dengekî dijber ji kokê radikir. Bas a nijadperest komara tîrsê avakir bû. Weke em dizanin tîrs xwedî hêzeke ku ênerjiya mirov dirûxîne. Ger tîrs ji dilê wî bifire ewê azad bibe. Û vaye ore lidare, ew newêrekî wirde wirde ji holê radibe. Pêdivî bi yasabûnê heye, bi wateya rexistin û berpirsiyarî heye. Kesên pispor li cihê rast bin di warê ragihandinê ku van erkên herî giring li milê wê dikeve bi çîbîne.

- 1- Ragihandinek bo belavkirina çanda hevqebûl kirina dîtir û azadiya ramanê.
- 2- Nûjên kirina radeya nûçe belav kirin, irove kirin, rastbêjî.
- 3- Cêsbendina hi iyara dewletbûnê (hestê berpirsiyariyê, rexistin û displîn, rêzgirtin û parastina berjewendiyê netewî, avakirina destgehan) di hi ê hemwelatîyan.
- 4- Hîn kirina mafê mirov, bi taybetî mafê jinê û hilfbirna ser zimanê kurdî (ji zarokan bigre ta kalan) Hewldana bi bandor bo avakirina destgehek netewî hevbe bo rojnamegeriya kurdî.
- 5- Belav kirina çand, zanistî û bi taybetî zaniyara ramyarî bo hemwelatîyan
- 6- Ronamegeriya kurdî gerek bi erkê xwe bilîze weke desthilat çaremîn û hi yariyek zanestî li ba hemwelatîyan biafirîne. Pêdiviyê bi rola xwe bilîze, ne bibe rojnamegeriya Berzanistan an Talabanistan û Ocalanistan ku ta Îro çanda hevqebûl kirin nî anî me nekir ne. Û êdî bese bo rojnamevanên amator, rê bidin yê bispor û tîgîhi tî.

Deku peyvên Mîkyafilî ser me neme in, hi yariya dewletbûnê (displîn, çavdarî, hestê berpirsiyarî, canfîda kirin, parastina berjewendiyên netewî) ji mer re pêdivî ye. Tenha rojnamegerî di pê erojê de, vê rêkroxê kare biçîbîne.



Qado êrîn



Lêborîn, rexne Û kînkî andin

Heçê bê sûnc û guneh be bila destê xwe bilind bike, daku em bidin ser opa wî, mîna emê wî mîna tacek ji zêr li ser serê xwe deynin û wî li ser pêximberan bijmêrin.

Mirî tenê gunehan nakin, bila ev di bîr û bala me hmiyan debe. Tenê zindî a bibin, jixwe gelekî a dibin, dikarin bibin xayîn û xwefiro, kujer û ti tin din, êdî sûnc û gunehê mirov ji zindiyên re bibin kole, çimkî zindî ye û dikare rojekê kêra jêrkirî di pi ta we de jî biçikîne.

Wexta em rexneyan dikin, em ji bo xêrê dikin, kîna me bi kesî re nîne, lê hin kes bi israr wan rexneyan dikin dijîti, ew qet ne mebesta meye, ew kes kole ne û fikra wan ne azad e, lê ku ew kes niyeta xwe zelal û paqij bikin dê bibînin bê çiqasî rexne di berjewendiyê me û wan deye.

Heçê tevgerê bike wê ileh a bibe, ji ber wê mirî gunehan nakin, mirî tevger û xirecirê nakin, icacokan ranakin û ji ber wê gunehan nakin. Zindiyên rexneyê nepejirînin li dijî hi mendî û pê veçûn û berjewendiyên xwe û me derdikevin. Mixabin hin kes rexneyê li dijî xwe wek er radighînin, ew rexne çilo û çawa be, ba neba be.

Rexnepejirandin an na encama perwerdeyê ye.

Mirovê ne demuqrat û azad be nikare rexneyan bipejirîne, ma fa î û diktatoran kîjan rojê rexne pejirandine, û çend kes, û çend zarok ji bo rexneyê ku tîne. Hin kes guman dikin ku ji gunehan bêrî û u tîne û xwe dikin demuqrat jî, ileh xwe bixin rêza diktatoran. Em jî ti tekî tenê dizanin: Tenê mirovên kole, diktator û fa î rexneyan napejirînin.


Diktator tenê hemû karînen xwe rast û durust dibînin, ta bi ku tîna zarokan, û ne tenê rexne napejirînin, belê xwediyê rexne di evên tarî de dikujin.

Hin kes, û hin hêzên siyasî, bi israr rexneyê li dijî berjewendiyên gel dibînin, daku rexneyê rawestînin û xwe jê biparêzin, bi texmîna me ev tîkçûna herî mezin e.

Eger kes an girûpek an jî hêzek siyasî hest bûbin ku em di dermafê wan de a çûne û me di rexneya xwe de bêbextî li wan kiriye, bila bi êweyekî mirovan e me agahdar bikin, emê jî bi kêfxwe î lêborîne bixwazin û soz didin ku emê carek din dubare nekî.

Mahmut BE K

Dengbêj AK RO (1936-1996)



Feyzî di meseleya li ser exlaqê bavê xwe de jî weha dibêje:

“Ez bi bavê xwe re jiyam. Însaneke cemaet û caxîyan bû. Daîma li civatên mezinan bû. Xwendin û nivîsandina wî tunebû. Di nav kalê de gelek nerm bû. Mamosteyên wî tunebûn lê yên ku li ser wî bandorê kirine hene. Lê ne agirt bû. Ji ber xwe ve dikaribû kilaman çêbike. Hafiza û afirandina wî zahf xwurt bû.”

Li gor ku Tewfîqê birayê akîro dibêje, akîro li ser ku tîya kilaman çenedikir. Ne ku nedigot. Ew kilamên berê yên ku hebûn digot. Lê kilamên evîni çêdikir.

Dema em akîro di opînin, em dibînin ku di kilamên evîni de gelek sekeftî ye. Di wan kilaman de, deng bilindkirin, qîr û carna jî ku dengê xwe nizim dike û bi aramî stranê dibêje, kêf û zewqeke zêde dide stranê û guhdarvanan.

Taybetmendîyeke akîro jî heye ku dikaribû ji ber xwe ve stranan çêbike. Ev dayîna Xwedê ye. Qabîliyet e. Li gor birayê wî Tewfîq dibêje: Dema ti tek an qewimandinek bidîta, dikaribû di cîh de straneke li ser ew bûyerê an kesê çêbike. Di teswîran de gelek pê ketiye.

Terbiya Malbatê

Di mesela terbiya malbatê de, Tewfîq behsa rabûn û rûni tandina di nav malê de weha dike: Diya min 70 salî bû, nedihat li ser sifra mamê min rûnedini t û xwarin nedixwar. Erm bû. Li cem bavê min zarokên akîr biketina agir, akîr destê xwe nediyê wan. Edeba me weha bû.

Fêrbûna Kilaman

- Herkes ji kesên din fêrî stranan dibe. Lê di vir de ti tê girîng ev e ku mirov karibe heqê stranê bide. Ne ku mirov biherimîne. akîro di vî warî de pîspor e.

- Her dengbêj dikare li gora xwe stranê bêje. Dikare peyva biguherîne lê ne ku wateya stranê biguherîne. Di akîro de ev heye lê heqê kilamê dide kilamê. Weke hinek kesên din ti tîn bê mane naxe nav kilamê.

- akîro dikaribû li kilamekê zêde bike, lê li gora naverok û herika kilamê dikir.

- Dengbêj ne ew e ku tenha kilamên dengbêjên din bibêje. Dengbêj ew e ku bikaribe kilaman biafirîne, ji nû ve kilaman çêbike û bixe nava xelkê. akîro yek ji wan e ku bi xwe kilaman çêkiriye.

agirtê Reso ye an na?

akîro jî Reso gelek ti tan fêr bûye. Reso bi xwe jî akîro 30 sal mezintir e. Di nav her du dengbêjan de, hurmeteke gelek zêde heye. Her însanek ku ewqas cîh bigere û di dîwanên mezinan de rabe û rûnê, dibe xwedanê perwerdeyeke taybet. akîro yek ji wan kesa ye ku dema Reso destûra kilamgotinê di nav cemaetê de nedayê, ew stran nedigot. Lê ev nayê wateya ku wê mezin heqê biçûk bixwe. Di vir de, ev hurmetkarîya di mabeyna herdu kesan de, em ji bîranînan birêz FÛAD SÎPAN dizanin.

Fûad Sîpan dibêje ku Reso û akîro diçin daweta mamê wî yê bi navê Îbrahîm. 6 roj li dawetê



Ev nayê wateya ku Reso an akîr, yek ji yê din kêmtir an zêdetir e. Ev edeb û rêzgirtin e.

akîro ji terzê Evdalê Zeynê ey

- akîro di terzê Evdalê Zeynê de digot. Çawa Reso û Ferzê berdewama terzê kilambêjîya Evdal in, her weha akîro jî berdewama ew terzî ye. Lê taybetmendîyeke akîro yê xas heye ku dikaribû ji nû ve awaz û terzeke din bide kilaman.

- Di kilamgotina akîro de xulxulandina wî bi nav û deng e. Xelk ji dengbêjên ku lerzê dixwe nav kilamên xwe zêde hez dike. Ji ber wê ye, kêmalên me hene ku kasetên akîro di malên wan de tunebin.

- akîro di warê newa, meqam û lihevanî de bêhempa ye.

- Pi tî Evdal, êx Silê û Reso, mora xwe li dengbêjîya Kurdan xist. Belkî îro ji hemûyan bêhtir bi nav û deng e.

- akîro bêtirs bû. Kilamên siyasî bê ku paxavê bi kesî bike digot. Ger negota wê ji bo wî bibûya ermek mezin. Çima? Ji ber ku ew bi xwe ji Zîlan e. Di geliyê Zîlanê de, di sala 1929 an de, ji êla wan, li gor jimarên dewletê 17 hezar û li gor çavkaniyên Kurda 47 hezar însan bi fermana General Salih Omurtak hatin ku tin. Ma wê çima akîro kilamên siyasî negota!

Kilamên ku pê me hûr bû

*Destana Derwê ê Evdî ... Bavê Fexrîya ...
Hesenê Mûsa ... Emro ... Geliyê Zîlan ...
Nêçîrvano ... Helîmcanê ... Gulê Dêran ...
Keremê Qolaxasî ...Bavê Mîrbeg ... Dewran e
Seydxanê Ûsivê Seydo ... êx Ebdullah ... Salih û
Nûrê ... Seraya Mamed Axa
akîro û Ferzê*

akîro û Ferzê jî hev dibînin, lê akîro li gora Ferzê gelek gênc e. Bi hev re kilaman dibêjin.

Dewlemendî an feqîrî

akîro ne ku zêde feqîr bû. Feqîriya akîro li gor nav û dengê wî bû. Li gor ku ewqas bi nav û deng bû, xwezî dewlemendîya wî jî li gor nav û dengê wî bûya.

Koça Anadolê û wefat

akîro di sala 1990î de berê xwe dide Anedola rojava. Li bajarê Îzmîrê bi cîh dibe. Heya sala 1996a li wir dimîne. Mixabin bi nexwe îna gurçikê dikeve. Di gurçika wî de kevir çêdibû. Çend caran emeliyat bû. Lê gurçik her dem ne yê emeliyatê ye. Mixabin li Îzmîrê wefat dike. Malbata wî, ew li goristana Çamlîkuleyê defin dikin.

iroveyên li ser akîro

Lutfî BAKSÎ dibêje: Dema ez li Baykanê bûm, xelkê Baykan bûbû du cî. Çayxana xwe jî ji hev veqetandibûn. Hinek bûbûn akîrocî û hinek bûbûn Huseynocî. Di nav medereseyên wê derê jî ev yeka han hebû. Hinek ji mela û feqîyan akîro digirtin û hinek jî Huseyno digirtin. ofêrên dolmî a jî bi heman rengî ji hev vediqetîyan. Eger kasetek akîro yeka nuh derketa, peyda dikirin û li qehwexaneyên layangirên wî bi mu terîyan didan guhdarîkirin. Ev car terefdarên dengbêj Huseyno jî hevîya kasetên wî dikirin. Xwedanê çayxaneyan mecbûr diman da herin kasete nuh ya Huseyno peyda bikin û bi mu terîyan xwe bidin guhdarîkirin da mu terî ji destê wan neçin..

Resoyê GOPALA li ser dengbêjîya akîro weha dibêje: Li hevanîna akîro û îrîniya Huseyno. Seîdê birayê akîro dibêje: “Reso gelek bi nav û deng bû. Ji e îra me Bekira bû. Dema yek ji akîro

akîro di sala 1936an de li Ele girta Agiriyê hatiye dinyayê. Pa î mala wan ji Ele girtê diçe gundê Cemalverdi ya Dûtaxê. Pa î malbata wî ji wir koçî Qereyazîya Erzeromê dike. Koça malbatê ji Ele girtê bo Qereyaziyê salên 1950 ye. Di sala 1959an de, bavê akîro ji Qereyaziyê, sirgûnê Adanayê dikin. Li Adanayê li dora 7 salan dimînin û di sala 1966an de dizivirin Mû ê. Di sala 1968an de car din diçin Qereyazîya Erzeromê.

akîr kurê Bedîh e. Ji e îra Zîlan e. Di jiyana xwe de neçûye dibistanê. Di zarûtîya xwe de dest bi kilamgotinê dike. Jê re dibêjin Kewê Rebat. Kewê Rebat ew kew e ku nêr e û dema di nav refê xwe de qebeqebê dike, dengê wî bi ser yê herkesî dikeve. Ev ne bes e, kewê rebat xwedî dengê gelek xwe e. akîro di jiyana xwe de sê caran zewicîye û 3 zarokên wî hene. Dido ji wana li Almanya ye û yek jî li Îzmîrê ye. Bi hesêb îro (11.05.2011) du jinên wî wefat kirine û yek ji wan dijî. Kurê wî yê bi navê Feyzî li Îzmîrê dijî û ji SSKyê taqawud bûye.

Tewfîk DEN Z dibêje; “Malên me di dema Dewleta Osmaniyan de li Çiyayê Elegazê bûne. Di ori a Oktoberê de malê me li Sovyetê dimînin. Lê di sala 1920an de, di mabeyna Dewleta Tirkîye û Sowjeta berê de mubadele çêdibe. Di mubadelê de, malên me tîn vî aliyê Arasê, lê bavê min dikaribû pi tî 7 salê din were vî aliyê me. Dema mala bavê min ji kalê min qetiyên û çûn Qereyaziyê 40 nûfusên me hebûn.”

Dema mesele tê ser Özcan DEN Z, Tewfîq weha dewam dike: “Ez li eskeriyê bûm. Dema ez çûme îznê, çûm Ankara, eva îde bû. Ew ev Özcan hate dinyayê. Bi Kurdî nizane. Malbata me hemû ji hev bela bûne. Tenê ji kalikê min 70 malên me li Îzmîrê hene. Lê dema malbata me ji Agiriyê çûne Qereyaziyê, ez biçûk bûm û ez xwe ji Agiriyê nizanim. Bo min her Qereyazî ye. Îro ji min û xanima min 10 zarokên min hene. Em hemû li Anadolê ne.”

Feyzî DENÎZ (Kurê akîro) dibêje: “Li ser meseleya ku eslê akîro ji ku derê ye tê xebardan. Ew bavê min e û ji Ele girtê ye. Lê nasnameya min li ser Qereyaziyê ye û ez bi xwe jî zewicandî me, 6 zarokên min hene. Em di sala 1986an de ji Qereyaziyê hatim Îzmîrê.”

û hi mend bin jî.

Pîredêw got: "Sedased zindana Osikan ji jîna me xwe iktir e. Dibêjin ku li wir kesên zindankirî herroj masiyan dixun. Ma hûn li van çiyana masiyan an beqan dibînin."

Peyrew û mirêdên bavê dêwan li hev nêriyan û xazî di ber wan de ma, devên xwe ji hev kirin û ji xwe re xewn dîtin. Pa kurtedemekê yekûyek, wan mirîdan xwe dan destê Osikan û li pey hev ketin zindanê.

Dem derbas bû û hejmara girtiyan bilind bû. Bavê dêwan jî bavtiya xwe di zindanê dikir. Lê wekî dixuya ti tek ji zindana Osikan genîtir û pîstir tune ye. Herroj li wan dêwên xapandî didan, seriyê wan di ikiandin, û xûna wan bi ser govdeyên wan ên tazî de dilivlîvî. Rew a girtiyan roj bi roj wêrantir bû.

Li derve, sultanê xûnrêj ê Osikan mir û yekî dî ji xwe re kirin Sultan. Ewî zîrek bû, zanatir û dûrdîn bû, di seriyê wî de pilanek hebû, ku ew ne tenê Sultanê Osikan be, belku ew bibe sultanê hemî êl û olan, ew teviya daristanan jî bixîne bin destên xwe û serfirazbûna pê serên xwe careke dî vejîne, ewa ku heta paytextê Çînê jî dabû ber talan û hêri ên xwe. Wî siyaseta bav û bavpîran piçekî guhart û xwe nermik û germik da xuyakirinê. Yek ji fermanên wî jî rawestandina lêdanê bû di zindanan de.

Ferman wilo giha zindana dêwan jî, hema pawanên „karakolên“ zindanê êdî nedikanîn bê lêdana girtiyan bijîn. Lêdana bindestan bûbû parek ji çanda wan a canî „rohanî“. Ji hev pirsîyan, ka çewa bikin, da lêdana dêwan bigudînin „berdewam bikin“. Di zinadnê de jî hi mend di nêv pawanên de hene, ewana mejiyên xwe piçekî bi kar tînin. Yekî ji wan got: "Di fermana Sultanî de hatiye, ku lêdana girtiyan berbest e "qedexe ye", hema negotiye lêdana wan girtiyan ku ji zindanê birevin an bizava revê bikin." Gi pawanên seriyên xwe jê re hejandin û gotina hi mendê xwe erê kirin û rast dîdîtin. Yekî got: "Ka em deriyê zinadnê vekirî bihêlin, û em xwe xulama bikin, da girtî bawer bikin, ku em di xew de ne, yekî dî ev pê niyazî ney kir û got ku wê girtî guman bikin û wê nûçeyê bigihînin serekên me, pi t re wê me bêzar bikin. Eve pilaneke jar e. Yekî dî got: "Berî her ti tekî me divêt em ramana revîne di seriyên wan de biçînin. Heger ev raman di mejiyên wan de cîh negire, ewana tew narevin, deriyê zindanê he be an tune be." Pa ku pawanên li ser vê yekê bûn xudan yek dîtî û yek gotin, ji hev pirsîyan, ka ewana çi bikin!

Serekê pawanên xwe bi lawazî gihande dêwê mezin ê ku jê re bavê dêwan digotin û bi wî re giha li hev hatinekê, tê de xwe ikkirina jîna wî di zinadnê stûnê mestir bû. Bi ev dêw hatin ba hev, ji ber ku serekê wan wilo xwest û pa kurtedemekê raman revê di mejiyên wan de ge bû. Di tariya evê de, ku pawan tev ji dora wan bi dûr ketibûn, dûwar qul kirin, û yekûyek ji odeya xwe revîyan. Di jêrvevînekê re, ku di binê zindanê de hebû, gi li pey dêwê mezin beziyan, bi hîviya ku xwe bigihînin azadiyê. Tenha yekî ji wan got ku ev pilan bi ser nakeve, lê kî diwêre li hember biryara "Bavê Dêwan" derkeve. Li dawiyê revê, di aliyekî dî yê zindanê de, li odeyeke genîtir, teviya pawanên li benda wan revîyan bûn, di destê her yekî de qamçeyek an gopalekî bi hêz dihejiya. Bavê Dêwan jî tûrekî piskewîtan ji nêv destê serekê pawanên bir û li quncekî rûni t û piskewîtan xwe xwarin û di bin simbêlan re kire tîqetîq û fi efi .

Tîravêjan

Can Kurd

Dêwekî ne wek dêwan



Berê, mirovan bi hebûna „Dêw“an bawer dikirin. Li ba gelên Zagrosê, ku jê re „Kurd“ bi wateya „ên wêrek“ dihat gotin, Dêwê „Ba“ an jî „Bad“ jî wekî gelek dêwên din di fantazyên wan gelan de hebû, ji wî dêwî re digotin „Vayo“. Wan bawer dikirin, ku di bayî de hêzeke nedîtî an xwedayek an jî dêwek heye, ku dikane kon û malên wan bi ser seriyên wan de hilwe îne û bi herifîne, û dikane pezê wan jî bikuje, lew re qurbanî ji „Vayo“ re didan. Wan qurban carina diyariyên xwarinî yên piçûk bûn û carina serjêkirina pez bû, lê carina jî - *wekî li nêv pir gelên din*- dayîna zarokan bû, ku seriyên wan dihatin birrîn, da kahinên perestgehan xûna wan wekî dermanekî pîroz ê hêzdar vexun û termên wan zarokan dihatin xwarin an sohtandin. Wekî em dizanin li teviya welatên cîhanê serohatin ên wilo li nêv gelan hebûn, û di dayîna qurbanên mirovî de, zorbazê mezin „Nîmrod“ an „Nemrod“ navekî pir naskirî ye, lê belê di vê gotarê de, ev qurbandayîna ne mijara me ye.

Dêw di fantazyaya mirovan de gelek bi hêz bûn, mezin û le giran bûn, nedimirîn û kesekî nedikanî zora wan bibira, lê ewana jî wekî mirovan dipeyivîn, xudan zarok û jin bûn û li çiya û baniya, li daristan û bê eyan, di bin ava golan û çeman de, li asîman û di jêrzemînan de, li nêv goristan û herifteyên keleşan, di koka daran de jî dijîyan, davêtin ser mirovan, ewan diku tin û dixwarin, lê ne wekî mirovan ho mend bûn, lew re bi wêrekî û zîrekî lehengên mîna Enkîdo, Rustemê Zal, em on û Hêrkulîs di efsaneyan de dikanîn wan dêwan bixapînin, wan bi davan bigirin û ji xwe re bikine kole, ji wî lehengî pê ve kesekî ewana bi çavên seriyê xwe nedidît, û bi wan re nedipeyivî, ji ber ku teviya çêrokê fantazyaya hi ên mirovan e, ti tek ji wê di rastîniyê de tune.

Dibêjin ku dêwekî efsaneyî, yê gelek peyrew û mirîdên wî hebûn, ji aliyê qehremanekî Osikî ve bi dav û pilanan û bi harîkariya hinek xêrnexwaz û nandozan, di nêv daristanekê hatî bû girtin. Osik êleke mirovên hovane bû, ji talankirin û herifandinê pê ve çî çanda wan tune bû, di dûroka mirovatiyê de rêç û opin xûnî yên diyar hêlane.

Ji roja girtina wî dêwî de, ku hemî dêwên dî ji ditirsîyan û xwe ji hêri ên wî diparistin, hêza wî yekser wînda bû û kesayetiya wî hate pi aftin, êdî ne zora kesekî dibir û ne jî diwêrî li hember pawanên zindana xwe dengê xwe bilind bike. Hemî ajal û cinawerên li çolan û gi dêwên efsaneyî ji hev dipirsîn û digotin: "Qey wilo sist û nermokî bûye, ewê ku teviya nijada me ji xwe re wekî bavekî an êrekî pê eng dinasî? Ewê ku em tev ji birhên wî yê qalîng û simbêlên wî yên boz ditirsîn, me seriyên xwe li ber diçemandin û ji me re çî bigota me jê re tew dikir?"

Pîredêwekî ji dêwan got: "Ez dizanim, çî heye!"

„-De bo me Bibêj.“

„-Heger hûn min bikine pa engê wî.“

Li ser wê axaza bilind pir guvtegotin û genge î çê bûn, û li dawiyê li hev hatin û biryara xwe dan, ku heta ew dêwê di darbesta Osikan de girtî ye, kesek nabe serokatiya wan bike, ji ber ku wan hemiyar ji wî re an li ber wî li ser wefadariyê sund xwarine, ku

ew heta mirina wî û belkî pa mirinê jî bimîne rêber û bavê dêwan. Ew li hevhatineke ne demokrat bû, lê çî bikin? Dunya tev wilo ne demokrat e... Mebesta min: Li daristanên ku dêw û ajal dijîn her wilo bû, zorbaz deselatdar in û ên jar binzor in, çendîn zana re bigota tu nizanî xwe kilaman bêjî, aciz nedibû û li zora wî nedîçû. Lê ku bigotina Reso nizane kilaman bêje, li zora wî diçû. Ji Reso gelek hez dikir."

Ahmed ARAS dibêje: "Kenan Evren, di sala 1981ê de diçe Qereyazîyê. Ji desthilatdarên wê derê hinek kes ji Kenan Evren re behsa akiro û hozanvanîya wî dikin. Dema xelk li dora Kenan Evren dicive akir jî li wir e. Lê akir dûr sekinîye. Kenan Evren dipirse bê ka ew hozan kî ye? akir dibêje: Ez im. Evren: Ba e, ba e. Tu kilamên xwe car din bibêje lê yên nelirê de nebêje."

Herweha Ahmed ARAS di kovara BÎRê de weha gotiye: " akir li Kar iyakaya zmîrê diçe cem Cemîl Eker. Dokorek hevalê Cemîl tê cem Cemîl û Cemîl jî akir pê dide nasîn. Dibêje ev hozanê me Kurda yê herî bi nav û deng e. Doktor dipirse û dibêje hozanê çî karî ye? Cemil dibêje yanî ew Zekî Mûrenê Kurda ye. akiro li Cemîl dizivirîne: Hey mala te bi ewite, te kesekî dî nedît, te min kir hevalê wî q....dêyî.

Tewfîq DENÎZ dibêje: "Di mabeyna min û kurê akir yê mezin de 3 sal ferq hebû. Tê bîra min ku çû eskeriyê. Dema çû û bû esker zewicî bû. Heya ew li heyatê bû, mirov erm dikir li hemberê wî kilaman bêje."

Tewfîq di derbarê birayê xwe akiro de weha dewam dike: "Kalikên min, yên apê min Îsmail û Xalid dengbêj bûn. Îsmail dengê wî yê zirav hebû. Kilama *Bavê Baran Begê Mîrê* Hezroyê ji aliyê mamê min Xalid ve dihat gotin. Lê ew kilam ya wî ye û ne ê wî ye, ez nizanîm."

"Mêrik cot dikir. Gayek wî yê mezin û yek ê biçûk hebû. Lê cotiyar her tim li yê mezin dixist. Dipirsîn bê çima her tim li yê mezin dixist!! Dibêje ku yê mezin ba be wê yê biçûk jî ba be."

Xalid DEN Z (Birayê akir): "Ji ber ku 2 kurên wî li Almaniya bûn, gelek diçû Almaniya û dihat. Kilama ku herî jê hez dikir kilama *Bavê Fexriya* bû. Bavê wî jî ji vê kilamê zêde hez dikir. Li gor ku bavê min digot, akir di 12 an 15 saliya xwe de bi tamamî dest bi kilamgotinê kiriye. Pi tî wefata akiroyê birayê min, min bi xwe ji bilî Metîn Barlik li tu kesî guhdarî nekiriye."

Tewfîq DENÎZ ê birayê akiro, li ser wefata akiro û du birayên wî ku ji akiro mezintir bûn û wefat kirine weha dibêje: "Du birayên min beriya akir wefat kiribûn. Her yek weka ku tiliyên mirovî jê bikin. akiro ji pîstiyê û ku tinê hez nedikir. Her ti tî xwe di nav aqrabayên xwe de a kere digot. Rastgo bû. Digot ev ti tî pîs bo me eyb in. Îro ez ji dinyayê re bûme mal."



Fûad Heqîqî

Ji bilî pîrozkirina cejnên Qurban, Remezan û Newrozê, xelkê rojhilatê Kurdistanê salane cejneke jibîrkirî pîroz dikin, ku ew jî cejna Çar ema Sor e.



Cejna Çar ema Sor, di çar ema dawî ya sala rojî (çar ema dawî ya sibatê) di nav neteweyên Arî yên Rojhilata Navîn de, ji wan jî kurd, bi pêxistina agir û rêwresmên taybet tê kirin. Lê di nav gelê kurd de, ew cejn tenê li rojhilatê Kurdistanê tê kirin.

Êvara sê em li ser çar ema bê, kurdên rojhilatê Kurdistanê li cihên bilind û meydanan agir pêdixin û li dora wê ahiyê dikin, herwiha di ser agir de baz didin û dibêjin "Sorê te ji min û zerê min ji te."

Hemû ew neteweyên ku xwe wek Arî dibînin, Çar ema Sor pîroz dikin. Ev cejn li Tajikistan, Afghanistan û Îranê tê sazîkirin. Lê di serdema Taliban li Afghanistanê hatibû qedexekirin. Û Çar ema Sor, cejnek ne taybet bi neteweyeke xuyanî ye, bi sedema kevinbûna vê cejnê jî dîrokek wê ya zelal nîne. Nivîskar û rexnevan li Sine, Elî E ref Serdarî, derbarê vê cejnê dibêje "Çar ema Sor bêhtir ti tek efsaneyî ye dîroka derketina wê vedigere gelên Mesopotamia, tew berî hatina gelên Arî li vê navçeyê."

Bi nerîna Elî E ref Serdarî derketine vê cejnê vedigere 2500 salî berî dîrokê, di pirtûka (ahname) ya helbestvanê farisî Firdewsî de hatiye behskirin. Li gor ahnameyê pa ayek îranî bi navê Keyomers dema ji çiyê vedigere di rê de marek tê ser rêya wî û ew jî kevirêkî davêje mêr û kevir û kevirêkî din dikeve agirê ku lê peyda dibe. Ew jî bû bingeha Çar ema Sor.

Lê nerînek din jî heye ku dibîne Çar ema Sor haydarîkirina xelkê ye ji sala nû re, li gor vê nerîne heft rojan berî Newrozê hinek kes bi navê agirdadvan li bajar û gundan digeriyan û dema ku dibû tarî agir dadidan û heta rok derdiket nedihî tin agir bê vemirandin.

Çar ema Sor ji du gotinan pêk hatiye Çar em û sor. Di nerîna mamostayê zanîngehê li Fransayê Seîd Peywendî, gotina sor nî an e ji vêketina êgir re, agir jî di ayîna Mîtrayîyan de nî ana paqijî, ronahî û germiyê bû. Li gor gotina Elî erîf Serdarî, zarbûn nî ana qelsbûnê ye, rengê zer ê mirov nî ana nexwe î û aloziyê ye, û sor jî sembola hêz, enerjî (wize), karîn, xwe î û ahiyê ye. Lewma dema bi ser êgir de baz didin û dibêjin "Zerê min ji te û sorê te ji min", wateya wê ye ku hêz, wize û karînen te ji min re bin, û zerbûn, nexwe î û aloziyên min jî ji te re bin.

Çima cejna Çar ema Sor tenê li Kurdistanê bi rêve diçe? Elî E ref Serdarî, ku lêkolîn wî di vî warî de encam daye, dibêje "Heta berî parçebûna Kurdistanê di navbera herdu imperatoriyan de ya Osmanî û ya Sefewî sala 1514 li Kurdistanê tevî ev cejn birê ve diçû, lê veqetandina be ên din ên Kurdistanê ji Îranê kir ku ew be ayîn û çanda wan bîn guhertin."

Lê niha jî li rojhilatê Kurdistanê li ser çiya û cihên bilind an cihêkî babet agirê Çar ema Sor tê dadan û li dorê dîlanê dikin. Çar ema Sor di heman demê de li hemû Îranê jî bi rêve diçe, lê di van salên dawî de û pi tî adara 2009 rêberê ayînî yê Îranê, Elî Xamineyî, di bersiva pîrsekê de li ser Çar ema sor got ev rêwresm "ziyan û gendeliyê" tîne û doz kir ku xwe ji wê cejnê dûr bikin, lewma ew cejn niha li Îranê sînodar kiriye, tew hinek ji kesên ayînî yên Îranê Çar ema Sor wek "Heram" û "Nerîtek efsaneyî" û cejnek ji bo "Kawikan" pesin dan.

Seîd Pêwendî wî di vî warî de dibêje "Ji ber ku narîta rêber û kesayetiyên ayînî yên Îranê, nerîta înan, xem û girî ye, lê nerîta Îraniyan heyamên kevin ku heta niha maye, nerîta xwe î û ahiyê bû. Pi tî serkeftina ore a Îslamî ya Îranê sala 1979 zilamên ayînî didîtin ku êdî xelk pi tî didin nerîtên kevin, lê niha xelk nerîtên kevin ên berî islamê bi heybettir bi rê ve dibin." **Jêder Rûdaw**

Çar ema Sor cejneke jibîrkirî ya gelê kurd

Pîr Êzdîn

Xwedê, li erdan serweriya hemû xwezayê da dest Tausî-Melek, lewra Lali a Nûranî jî ji bo me mirovan, li



erdan wek Waristan destnî an kir û Çar ema Sor, wek roja Tausî- Melek pîroz kir û wê Rojê Dunya xemiland: Herweha, li ser me erk kir ku ev Roj hersal wek Cejna hemû giyanberan bê Pîroz kirin. Di vê rojê de hemû jiyan avis dibe, hemî xweza rengîn dibe rengê xwe yê pîroz diyar dike, hemû Cîhana me rengîn dixemile mîna Bûkek nû siwar. Ji aliyê din ve bi navekî jî dibêjin; Hêkesor, ku her tî t ji hêkê ye û ji hêka xwe derdikeve û jiyan dibe: Lewra ev roj ji bo me û hemû Netewê jî gelekî Pîroz û watedar e.!

5 Çar em yê xwe kir jiyan,

kesik kir De it û Çîya û Zevî û Zozan,

ew jî bi kerema Ped ê minê Ezdan.

Herweha, di Ol Ezdayî de Çar ema Sor, gelekî pîroz û wetedar e. Gor Ilm û Ilmdarên me: Beriya Erd bimeyî û jiyan destpê bike, Xwedê ev Kewkeb, ango Erd di rengê Hêkê de çêkir û emer da Be eryet çêbibe û hemû jiyandar dest bi jiyanê bike ku xweza rengîn bêwate ne mîne...Xwedê emir kir, Lali a Nûranî ji ezmana were ser Milkê Melek Adî û Lali ji Ezman hat Erdê û ew Roj roja Çar emê bû û Tausî-Melek bû Pîrê hemû hebûnan. Lewra hemû Çar em ba me Êzdiyan Pîroz in û divê wê Rojê ahiyan li dar naxin, ji ber kû Nîsan bi xwe Bûka û ti Bûk çênebin bibin Bûk.Girînge xêran bikin û çawa Qewl ji dibêje:

28 Pi tî çil salî bi hijmare, Erdî bi xwera negirt he are, heta Lali di navda dihate xuware.

Navekî vê Erda me ya Pîroz Dirre, herti t ji vê Dirrê dest bi jiyanê dike û ew Roj jî roja Tausî-Melek, roja Çar ema Sore. Bo ku Xwedê hemû malê ji qeda û belayan bistrîne û berketê bêxe malê ku havêyîn zêde bibe, xizmên Lali ê, hîskiryên vê Ola Pîroz Hêkan Sor dikin û bi serdera derên xwe ve dikin Ji xwe, li jê rê jî di Qewlê Pîroz de diyar dibe; ku Çar ema Sor li dîwana Xwedê, ji Batin ve hatiye Morkirin! Ev erkê ku Xwedê bi xwe Pîroz kirye, divê em jî ji vî erkî bê par nemînin, û vê kevne opiya xwe ya Pîroz ku ji Kategoriyek bergendî pênc / e hezar salan e û heta bi roja me îro hatiye Pîroz kirin û divê her tim ev Cejn wek Cejna Netewî, ango hemû Netew divê vê Cejnê bi co ek mezin Pîroz bikin.!!!

19 Hat Çar embo ye Sore, Nîsan xemilandibû bi xwere, Ji batin de ye bi More.

ji medya kurdî

Çavkaniya vê gotarê kême yan jî tune ye û ji ber vê hindê peyitandina agahiyan ne gengaz e.

Ji bo bilindkirina asta vê gotarê ji kerema xwe re çavkaniyan pê ve bike. Çi agahiya bê çavkanî be, dikare ji aliyê bikarhênerên din ve

bê gumankirin, sererastkirin û valakirin.Nerîna xwe ya di derbarê vê pîrsgirêkê de li ser rûpela gotûbêja vê gotarê binivîse.



Çar ema Sor cejna êzdiyan ya herî naskirî ye. Her sal, di yekemîn çar ema meha nîsanê ya bi gor salnama kevin de tê pîrozkirin. Bi gor baweriya êzdiya, Xwedayê alemîn her sal melekekî rê dike ruyê erdê, ji bo ku neba iya li nav însanan ji holê rake û ba î di nav însanan de belav bibe. Her weha daweta êzdiya jî piranî di Çar ema Sor de, tê pêkanîn.

Diayên Çar ema Sor

Di Çar ema Sor de, piranî ev duaya jêrîn tê xwendin:

Qewlê Afirandina Dinyayê

Yarebî dinya hebû tarî

Tê da tunebûn mi k û marî

Te zindî kir taze halî

Çû nema gul jê barî

Ya Rebî tu hostayê kerîmî

Te vekir rê û derba tarî

Tu hostayê her ti tî

Bihu t çêkir rengê bî

Erd û ezman tunebûn

Dinya fireh bê bin bû

Însan û heywan jî tunebûn

Te xak saz kir

Di behran de tenê hebû dur

Ne dime iya, ne dipe iya

Te xwe ruh anî ber

Nûra xakê peyda kir

Go t û ruh hatine ber

Nûra çavan lê hate der

Dest û pê kire le

Lê êrîn kir got û bêj

Bê guman, cejnên êzdiyan ne tenê Çar ema Sor e. Gelek cejn û rojên wan ên pîroz a olî jî heye. Wekî mînak, êzdiyên dîndar, çil rojên havîn û çil rojên zivistanê rojiyê digrin. Lê ev rojiyê wan ne wek rojiyên misilmanan e. Ji bilî van rojen pîroz, her sal di nav êzdiyan de Tawisî Melek gerandin heye. Êzdî, bi taybetî ji bo xerca Geliyê Lale , di gundên êzdî de, salê çend daran Tawisî Melek digerin û xerca Lale berhev dikin. Yên Tawisî Melek di gundan de digerin, qewal in. Li pê iya qewalvanan jî, êxekî êzdî, heye.

Ti tekî balke a êzdiyan jî ev e ku, êzdî kesên ku ji dayîkbûnê ne êzdî bin û dixwazin bibin êzdî ji dîne xwe re qebl nakin; her weha naxwazin yekî/ê êzdî jî dîne xwe bigorîne. Dîn guherandin di nav êzdiyan de sucê herî giran e. Her weha zewaca bi yekî/ê olekî din re jî, qedexeyê.

Ji Wîkîpediya, ensîklopediya azad.

Ebdulbaqî Huseynî

zanin88@hotmail.com

Ji ferhenga jinên kurd (xeleka 2)

Helbestvan û dîroknivîsa kurd

Mestûre Kurdistanî



Sedîq Borekeyî (Sefî Zada) di pê gotina dîwana (Mestûra) dibêje: " Ev dîwane berhema helbestvana nemir a kurd Mestûra Xanim Kurdistanî ye, û ev helbestên wê tev di ke kûlekê de hatibûn nivîsandin, min jî xwest bi çapeke rind wê biparêzim, û diyarî gelê kurd bikim, û ev ji bo em hinera helbestvana me anî xwendevanan bikin, ji ber ku jiyana Mestûra bi hikûmeta Erdelan ve hatiye girêdan, çimkî jiyana wê di wê serdemê de bû".

Berî 210 salan ango di sala 1803 an de li mîrne îna Ardêlan, bajarê Senendec, Mah eref xanim Kurdistanî ji dayik bûye. Ew dîroknûs û helbestvana kurd, ku bi navê (Mestûre) hatîye naskirin, ewê ev nav bi xwe hîlbijartîye weke navekî helbestî.

Mestûre bi detsnivîsa xwe a pir bedew û êrîniya helbestan û zanîn û zîrekiyê xwe dihate nasîn.

Mah eref xanim Kurdistanî jina Mîrê Ardêlanê Xosro xan bû, ê ku binavê (Nakam) dihate nasîn. Bavê wê ji malbeta Qadirîya bû, diya wê ji malbeta wezîrê Kurdistanê bû.

Bavê Mestûrê, Ebûl Hesên beg bi xwe mirovekî zanyarbû, zên û zîrekîya keça xwe zû texmîn dike û wê dide xwendinê.

Pismamê wê dîroknûs Elî Akbar Kurdistanî ye, xwedanê pirtûka "Gulîstana AlNasiriyê" ye, ew pirtûka ku li ser tarîx û cografiya Kurdistanê diaxive.

Sala 1834-an mîrê wê, Xosro xan ji nexwe îya kezêbê di 30 salîya xwe da koça dawî dike.

Sala 1847-an, gava desthilatdarîya mîrne îne dikeve destê Xosro xan Curcî, Mestûre jî neçar dimîne, koçber dibe, berê xwe dide mîrne îna Baban, bajarê Silêmanîyê, li wir jiyaneke bi tundî derbas dike. Di sala 1847 an ew diçe dilovanîya Xwedê. Tirba wê li bajarê Silêmanîyê, goristana Girdî Seywan, li ba ûra gora Fatma Zuhray e.

Zanîyar û pê ewitîyê çanda kurdî Yahîya Merîfet

sala 1926 an dîwana îrên Mestûrê çap dike.

Lê berhema wê a dîrokî, a bi navê "Dîroka Ardêlan" sala 1946 an li Senendecê ji alîyê zanîyarê kurd Nasir Azadpûr da tê çap kirin. Û vê dawîyê ji alî Dr. Hesên Caf û ekûr Mustefa hate wergerandin bo zaravê soranî.

Herwiha kurdnasa rûs "Yêvgênîya Vasîlêva" pirtûka Mestûra "Dîroka Ardêlan" werdigerîne zimanê rûsî û ligel pê gotinekê hêja, di sala 1990 î de li Mosko, da çapkirin.

Piraniya îrên Mestûrê bi zimanê kurdî, zaravê goranî hatine nivîsandin. Li gor hinek çavkanîyan dîwana îrên wê ji 20 hezar beytî e. Dibêjin ku Mestûre hin helbest bi zaravê kurmanjî jî nivîsandine, lê mixabin ew ne diyarin.

Di pirtûka "Kurd û Kurdistan" a Mihemed Emîn Zekî de, navê Mestûre tîne ziman ku yek ji navdarên gelê kurd e, û dîwana Mah Seref Xanim di çapxana ûrî li Tehranê sala 1931 de hatiye çapkirin, ligel ku piraniya îrên wê hatine windakirin.

Sala 1927 an Meyrem Ardêlan li Senendecê yekemîn dibistana ji bo keçan vedike. Navê Mestûrê li wê dibistanê dike.

Di wê heyamê de, gava li welatên musulmanan xwendin ji bo jina ti tekî guneh dihat dîtin, diyarbûna dîroknûs û helbestavekê wisan mezin ti tekî berbiçav bû.

Bi serî pê ewitîyên dîrok, çande û edebîyeta kurdî Yahîya Merîfet, Asadalax xan Kurdistanî, Ebûl Baka Mûtamadî Kurdistanî û Nasir Azadpûr, navê Mestûrê ûna xwe ya hêja di dîroka kurdan da girtîye. Ji bo nasandina berhemên Mestûrê e dîrokî kurdnasa rûs Yêvgênîya Vasîlêva karekî hêja kirîye. Wegera bi zimanê rûsî, lêkolîn û çap kirina "Dîroka Ardêlanê" ew cewahira dîroka kurdan gîhande destê gelek dîroknas û kurdnasan. Kurdnaseke mayîn, Jaka Mûsayêlîyan ê lêkolîna îrên Mestûrê kirîye.

Mestûrê mezinaya xwe texmîn dikir, di îreke xwe da ew dinvîse: "Serên me yê hêjayî tac in, di bin çar evan da ne".

Dewletên dagîrker her ti t kirine û hê jî dikin, wekî gelê kurd ji dîrok û çanda wî bêparkirine. Bi bawarîya me ve, hewldana herî mezin ewe, ku berxwedanek bo parastina dîrok, edebîyet û çanda gelê kurd hebe. Bi vê armancê divêt em berî hemî ti tî gelê xwe bi dîrok û çanda wî bidin naskirin û yek ji navdarên gelê kurd, ku divêt her kurdek nas bike, Mestûre ye.

Wê ba be, ku gelek lêkolîn ji alî ronakbîran û hêzên çandeyî li ser jiyana Mestûre bêne nivîsandin, da ku hemî xalên giring di jiyana wê de ronî bibin.

Berhemên Mestûre evin:

1. Dîwana we a helbestan (2000 malik an jî beyt)



2. Dîroka Kurdistan an jî Dîroka Erdelan (ji destpêka mîrne îna Erdelan ta bi dawîya wê)

3. Pirtûkek di derbarî Ol û bawerîye (E'qîde û are'e).

Hêjayî gotinê ye, ku Mestûre li serdema hozanê navdar (Mele Xidir Nalî) bû, ewî helbesteke evîni avête ser Mestûre.

Wekû tê nasîn ku helbestên Mestûre ji çar perçên helbestî tê avakirin û jê re dibêjin; Dildarî.

Mestûre, di dawîya jiyana xwe de, gelek li ser mîrê xwe Xesro Xan helbest çêkirine.

Li xwarê çend malikan ji helbesta Mestûre pê kê î xwendevanên "Pênûsa Nû" dikim:

Girftarim be nazî çawekanî mestî fettanî

Birîndarim be xemzeyî herdû çaw tîrî mûjganî

Be tallî perçemî egirîcekanî xaretî kirdim

Dillêkim bo ewî it xiste naw çahî zenexdanî

Minî hatim bifermo bimkujin bimiken be qorbanî

Te ekkur wacibe bo min eger bimrim be zexmî tû

Be ertê kefenkem bidorî betayî zulfî perî anî

Le ku tin geredent azad dekem xo bêyte ser qebri

Ke rojî cume'e bim nêjî lelayî hesir zehmetî naden

Eger wek min le em dunyaye sotabê le hicranî

Hêmî e sucdegahim xakî berderganekeyî tûye


Reqîb rûre bê çûn nallê biga destim be damanî

Dillim me kêne çûku mexzenyî derdu xemî tûye

Fîdayî ert û wefaket çî beser hat meylî caranî

Ê tu emro le mulkî dilberîda nadîreyî dehirî

Be resmî be dengî "Mestûre" wa hatûte dîwanî.



Jêder:

1. Rojnameya Al-Itihad, jimara 387, roj 15.09.2000, Helebestvan Mestûre Kurdistanî, werger; Ala Jebar Jebarî.

2. Mamostayî Kurd, jimara 14, laperê 2.

3. Mêjûyî Erdelan, Mestûre Kurdistanî, pê gotina dr. Hesên Caf û ekûr Mustefa.

4. Gotara Tosnê Re îd di malpera dengkobani .com de. 2009.



Mizgîn Hesko

Ji Ferhenga janê Jannameya romannivîsê kurdistanî Jan Dost.



Bê guman, em ê vê carê û bi xameyeke mendeho , hinekî êt û mat,,lê ne havî berbi herikîna xameyeke herikbar, dilovan û nerm...Em ê berbi mîrnu îniyeke xuro kurdî, mirovhez, û welatperwer. Berbi êweyekî, dîrokeke ji nivîsê û ezmûneke balkê bi herikin.

Em ê di deryaya romanên kûr yê romannivîsêkî, dîroknûsêkî û wêjevanekî de nuq bibin û em ê dê bi hizrekî nuh , giranbuha ji wê deryayê û careke din werin girava Xanî yê ne mir , ku birastî Romannivîsê me hîna jî xwe kurê wê dibistanê di pejrîne...tekez dê asîman li wir jî fatîheyekê li ser giyanê mîrê welatperwer Xanî bixwîne û dê hibirbaraneke hûrik û bê hempa bibare...!

Erê ...berî niha me anîye ziman ku em ne lêkolîner in ,û niha jî dibêjin em ne jî rexnevan in, mijar ji xwe dûrî wê atmosfêra rexneyî ye.

Lê pênuş me berbi xwe ve dibeta kû em jî hîn vê yekê nizanin....!

Vê carê em ê berbi azmûna mîrekî ji mîrên nivîsîna vê serdemê de herin, seydayê Jan Dost yan jî Jan Dostê Seyda ku wî bixwe û di gotareke xwe de rastiya hezkirina xwe bo binavkirina Seyda anîbû ziman.

Jan ...neviyê Ehmedê Xanî ye.Niha yan jî dawî dê xwênerên xêzên wî xwe radestî vê rastiye bikin...em vê yekê jî tekez dikin, her çendîn em berhemên wî dixwînin em bîna xameya Xanî dikin....mebest ne ku birêz Jan lasayî (Teqlîda) Xanî dike..lê ewî û bi hemî derfetên xwe û ta ku jê hatiye , xwestiye wî barê giran yê Xanî li ser milên xwe hilbigr e.

Lê ma belê:

„Ger dê hebuwa me serfirazek

Sahib keremek suxen newazek

Neqdê me dibû bi sikke meskûk

Nedma wehe bêrewac û me kûk“

(Xanî)

Romannivîs Jan Dost di sala 1965 an de û li Kobanê ji dayîk bûye...di maleke kurdperwer , di hîcreyên bavpîrên xwe yê oldar bi meya Cizîrî, Herîrî, Feqhê Teyran û Xanî fir ik bûye.

Ta niha çendîn berhem belavkirine, û ji wan :

*Kelha Dimdimê: Destan- 19991- çar caran hatiye we andîn (we anên Rew en, we anên Melsa, we aneke îlegal, û we anên Avesta)

* iir we u,eraa: Helbest û Helbestvan. Bijarteyên ji helbesta kurdî ya kevn û nû-bi erebî-1991-Qami lo

* Sazek ji çavên Kurdistanê re- bi kurdî û erebî-1994- am

* Mem û Zîn- îrove û wergerandina Mem û Zîn bi erebî-1995- am.

* Sirûda Baranê. Helbestên bijartî yê Bedir akir el-Seyyab.wergerandin ji erebî 1996- Avesta.

* Mehabad berbi olimpyada xwedê de-Helbesta Selîm Berekat-wergerandin ji erebî-1996- Avesta.

* Bedayiul Luxe-ferhenga kurdî ,erebî-wergerandin ji farisî-1998- am.

* Mem û Zîn- wergerandin bi erebî- 1998- Beyrût.

* Elhedîqe Elnasiyriyye-kitêba tarîxa Erdelaniyan-wergerandin ji farisî-2002-Hewlêr.

* Mijabad-roman- Belkî, Diyarbekir 2003.

* El durr el semîn fî erhî Mem we Zîn- îrove û wergerandin bi erebî-spîrêz, Duhok.2006.

* 3gav û 3 darek-roman- Avesta, 2007. çapa duyem 2012.

* Mem û Zîn- çapa fermî-Dar elzeman- am 2008.

* Mem û Zîn bi kurdiya îro.Avesta 2008.

* Mîrname- roman. Avesta 2008.

* Mem û Zîn- tefsîr.Avesta 2010.

* Fehenga Kurdistanî- Nûbihar 2010.

* Adat û Rusûmatnamê Ekradiye-Nûbihar 2010.

* Dîwana Jan-helbest .Sema Kurd .2010. çapa duyem .Avesta 2012.

* Martînê bextewer-roman.Avesta 2012.

Bê guman û li gor ku me dîrok xwendiyê...me ne bihîstiyê ku kesekî mîna Jan Dost û bi vî rengê ber fereh hibir anîye ziman û li ser xameyê axiftiyê.

Gava mîrê hibra kurdî nuh , sazvanê tîpên latînî û rêzimana kurdî di bîra qederê de werbû û jiyana xwe ya bi ê ji dest daye, ji wê gavê hinekî û di kûrahiya giyanê me de hibir miçiqî, yan jî bo demekê tevîzî û di nav baskên bê dengiyê de tireh dida...ta dema ku hibirhezên din dest avêtin pênuşê û peyama Xanî û mîr Ciladet domandin û careke din bîna diwêtkê di poz, hi û giyanên me de vejandin.

Ji wan xamehez û rew enhizirê me mamostayê birêz Jan Dost e.

Lê erê ma kengî û li kîjan zemînê , asîman hibr dibar e..tekez dûrî zanistê û pir nêzîk ji Edebiyatê...edebiyat û wêjeya bi rêk û pêk , berhemdar û xwedan bilindgo û aramnc

Gelo....ma ev rew a awarte dikare bibe rastî....?

Belê incax di hi û xeyala xemxwerekî kurdî nuh mîna birêz Jan û di romaneke bi qasî bejna Mîrname yê.

Jan Dost wekî xwe ,bi rengên xwe û bi alavên xwe dibe birreke rew enbîrî, dibe sazvanekî ne penî û di kûrahiya dîrokê de werdibe, astengên wan rojên berê, ê a kesayetiyên wan serdeman ji nuh ve li qelem dide, bi viyaneke nuh û pê payan wan bigiyan dike, destpêka jaran li jêderên rastteqîn vedgerîne.

Jan bixwe piraniya caran û di romanên xwe de ,serek lehengekî ne peniye...carna bi gavên serek lehengên romanên xwe ve gavan dide, pêkan

davêje û kosteka zimên diqetîne, carna jî bixwe dibe Badînê Amedî û ji mere dibêje :

„Mirin zengileke bê denge e, tenê yê ku mirina wî nêzîk dibe, vê zengîniyê dibihîse“

Carcarna jî dibe mîvanê hîcreya bi find û dagirtî giryan ya Ehmedê xanî û wî bê sekin û hedan di opîne ...bi dizîka derbasî nav xêzên wî dibe û nameya wî bi çavên serê xwe dixwîne.... û ne wilo bi tenê jî , êdî ew dibe govanê wê roja ku darbista Xanî birêve diçe û asîman hibir dibar e... hinekî darbestê li ser milên xwe jî hildigre û sivikî û zuha bîna cendekê Seyda jî hîs dike ..

ku ev jî ji nî anên buhi tîn e..Jan li nik Martînê Bextewer û Alberto radwestê û li wê xergeleyê jî tema e dike...!

Di Mijabadê de, ku birastî xwendina wê dê li ber çar çirayan watedartir be.Mijabad ku serboriya Komara Mehabadê ye...ka çawa di nav baskên mijê de can ji dest dide...belê ew mija ku giyan û jiyana me dorpêç dike.

„Ba awazeke

Birîndar dilorîne

Demsalên rêwî

Xatir dixwazin

Û pêtên di gewriya min de

Peyvan mîna

Pelên payîzê di ewtînin

Edî bêhna ewata asoyan, ji vî dilê min tê „(Mijabad –R210)

Belê û di sê gav û sê darkê de ku êx. S. Pîran bi her gavekê ji gavên xwe û ta îro em sêdarkir kirin û pi tî ew ê bidar ve kirinê em hîna jî jîndar in, rojane mirineke nuh dimirin....erê ma êx berbi dilovaniya Xwedê ve çû û tîna wî bi aveke zemzemî ikest, lê em berbi kû ve..?

Dê kîjan kanî tîna hestê me yê birîndar û hi ê me yê tijî pirs rew bike...?

Belê sê gav û her gavek bi qasî sê hezar sal dîrok „rûpelên windayî. Bi qasî sê hezar sal hibir miçiqîn û sê hezar sal giryan û hîna jî oqyanosên tîkçûnê me berbi xwe ve her û her dadqurtînin û em edî sê hezar sal û sê hezar gav pa kefî û nezan in ...ku ta niha jî û her çendîn em xwe bajarvanî hîs dikin lê me jiyana xwe ya berê jibîrnekiriye.

Gelo ma çima bav û kalikên me ne wêje hez bûn...?

De hema bila bikêmanî jiyana xwe ji mer ar îv bikirana .

Ma em jî û birastî niha giran buhayê xwendin û zanîne dizanin....?

Di Mîrnameyê de jî ...ew barana ku wê rojê pir bi nazikî dibariya :

“ wekî ku Azman fatîheyekê li ser rûhê Seydayî bixwîne....Mîrname R-12”



wê rojê li jor û ji awirên re û tarî ku li hev civiyabûn, hibir dibarî ta radeya ku tirseke ne diyar di dilên behîdaran de peydabû bû.

Bê guman, bîna hibrê, rew eke awarte û seyr bû. Darbesta Xanî sivik û zuha bû.

Gelo...ma ev ne nî ana weliyên Xwedan in, êxên nûranî ne....?

Gelo...ma gotina akademîstê A.Orbêlî û gava dibêje:

“ Eger em di helbestê de li ser welatne tumanî bi axivîn, pêwîst e em sê helbestvanên rojhilatî gewre bînin ba hev –Ferdewsiyê Iranê- Rostafîliyê Corcî û Ahmedê Xanî yê kurdî”

Gelo ma ev gotin û govanî ji ber xwe ve hatibû li qelem dan....?

Jan Dost û di Mîrnameya xwe de balê diki îne ser e ên Xanî, xweziyên dilên wî, bîr û boçûn û xwestekên wî ji hemwelatîyên kurd, sersariya Mîrên kurdan, ne guhdana wan ji wêj û nivîsê re. Bê tifaqiya Desthilatdarên kurd , Jan êdî derdên ku Xanî hîna jî bilêv nekiribûn ji xwênerên xwe re û bi awayekî vekirî û zelal li ber çavan radixîne mîna ku bibêje:

Fermo...binerîn ka çendîn me ew ê bi derman kirine....?

Ji dema ku Xanî dibêje:

„Çibkim ku qewî kesade bazar...nîn in ji quma -i re xerîdar“

Ji wê demê û ta ev ê serdemê ,ma bazara pirtûkan û nirxê zanîn û wêjeyê li ba me çendîn hatiye guhertin...?

Dawî jî Jan dost bi plan mirineke plankirî ji Xaniyê me re dirêse (Hemî agahiyên di derbarê mirina Xanî de,dibêjin ew mirineke xwezayî miriye)

Li vir êweyê mirina Sukratî tête bîra mirov...ma Xanî jî û ji layê kesên li derdora xwe bi kufir û(Ilhadê) nahati bû tawan barkirin, bi xirakirina hi ên xoratn û civakê jî.....?

Ne wilo jî Xanî bi derxistina xortan ji rê , bikaranîna beytên xezelî û erotîkê bi sed rengê dilbijok û awayên lihev abûnê jî hatbû guneh barankirin.

Tekez û li gor xwendina me ji Mem û Zînê re em ê û di be ê ku Sîfî û Tacdîn di eva zemawendê de ku bi helalî , pi tî hezkirineke kûr û diltezîn gihi tine hev li rasta êweyê bihev abûna du cendek, du giyanên tijî evîn û dilbijokî bèn..ev nayê inkarkirinê lê û bi dîtina me ev bi mebest û ji layê Seydayê Xanî hatiye nivîsîn, lê ne ji bo ku hi ê xoratan ji rê bibe, lê helbet ew î xwestî bû wekî zanyarekî bi destên xortan bigre, û wan bîne ser rê....!

Belê û careke din di derbarê jehirkirina Xanî (li gor Jan Dost) û jehirkirina Suqratî

Incax xwêner wan bîne ba hev ,da vê tîkilyê (tîkilya derûnî di nav bera Xanî yê helbestvan û Suqratê Fîlesof de) ba tir bizane be. Belê ev dibe eger em ne li gor pîvanên komara Paton lê binerîn û binirxînin, Pilaton wê rêzê ji helbestvanan re nagire...(Ev mijarekî din e)

Li vir jî me divê em berê we bidin balkê iyeke din û bi texmîna me û ji bilî kesên ku Mîrname û Martîne bextewer bi hûrbînî û bînferehî xwendibin dê haya kesên din ji vê rew ê nebe.

Tekez û di wê roja ku darbesta Xanî berbi goristanê

ve û li ser milan sivik û zuha diçû, di qurçikeke tarî de, du kesên ku xuyabûn ne ji wan memleketan bûn, qiyafetê wan ne mîna kesên li dora gora nû kolayî bûn..(binerîn Rûpelê 19 di Mîrnameyê de)

Ew herdu kes biyanî dixuyîn, yek ji wan kose ,çav în ,kumekî simûran li xwe kiribû û yê din jî sixmeyekî qedîfe û re û kumekî lûleyî li ser bû. Ew li wir li benda mêrê rûnuxmatî bûn..yê rûnuxmatî gora Xanî û bi destên xwe kola bû, ji lewra di nav baskên xemgîniyê de werbû bû.

Gava mirov Mîrnamê dixwîne, ev parçe nivîs hema hema bê guhdan li pê çavan derbas dibe, ji ber ku ew herdu kes li wir ji dîmenê derdikevin û opa wan di romana Mîrname yê de namîne, ew winda dibin û hew Jan wan bibîr tîne.

Lê ya herî balkê û bi me seyr ku pi tî çar salan ji belavbûna Mîrnameya ku ji nav we anên Avestayê û li Stembolê sala 2008-an ronahî dîtibû, ya herî surprîz ew e ku em ê di romana Martîne bextewer de , ku ew jî ji we anên Avestayê ye û di sala 2012 li Stembolê hatiye çapkirinê.ya herî seyr ku em ê Martîne xwe yê windayî bibînin û dê navê wî , bibe navê romaneke nuh û dê ew bixwe serek lehengê romanê be.

Martîne bextewer, cara yekem ku me ev nav bihîst em behîtîn, gelo çawa û pi tî sê romanên ku tevnê xwe ji dîrokê ristine û sê kesayetiyên me yên kurd î bejin bilind û xwedan bandor ku careke din hatine vejandin. Erê ka çawa xwedanê van berhemên giranbuha Jan Dost ev ê carê û bi wêrekî dikare bi navekî weha biyan , ne kurd pê berî xwênerên romanên xwe bibe....?

Belê ma pi tî çavên êx S.Pîran, Qadiyê Mihbadê , Seydayê Ehmedê Xanî ma çi karê Martîne Elman li ba Jan Dostî heye....?

Martîne Bextewer , ku bi metinê xwe, bûyerên xwe, kesayetiyên xwe, serek lehengê xwe û bi êweyê ristin û derbirîna xwe jî hinekî ji xwî kên xwe yên din cuda dimîne, ji bilî kesayetiya Yavuzê çortanxwir, ew xettatê kurmanc, û Kewsera xwe kok (yarika Martîne) ,û Dawudê Yezdanyarê Mamzêdî, kesek yan du kesên din ...kurd di romanê de derbas nabin û cî jî pir nagirin.

Gava em êdî û bi ahîneke dirêj û pêsîreke fereh Martîne bixwînin, em ê careke din li rasta ew xelex yan bûyera wan herdu kesên biyan ku di nav rûpelên Mîrnameyê de hatibûn bi aftin werin.

Em ê têbighêjin ku ew kesên di bin dara çînarê de, yê kose û bi kurkê simûran Martîne bextewer bi xwe bû û yên din jî , yê bi kumê lûleyî hevalê wî Alberto de Silva bû.

Lê hîna romana Martîne ne hatibû ristin , Jan helbet bi mebest Martîne anîbû romana Mîrname û jê xwestibû ku bibe govanê darbesta Xanî.

Lê çi li Martîne kose dest dabû û çima li gor daxwaza Jan Dostî hatibû Bayezîde.....?

Martîne bextewer, ji Elmaniya yê berê xwe dide erqê, erqa rûhaniyetê bi armanca bidest xistina pirtûka El Ifade fî Iksîr El Se,ade.

Martîne û gava digihe Helebê , xwe di nav berhevkirina saman û (emlakan) de, di nav defên bazirganiyê de, û li ber himbêza Jinan xwe jibîr dike , û dikevê sawîrên tarî de ta radeya ku êdî ew mal û jinê ,xwe tirîn ti tî jîyanê dipejirîne .

Dawî bazirganî tîk diçe, û jin jî namînin, yan ew êdî wan naxwaze. Dawî ew li rasta pir asteng û arî eyan tê . radibe bi giyanekî tevîzî, zimanekî ikesî û viyaneke peritî xwe û bi alîkariya hevalê xwe Alberto ji wî bajarî, ji wê xanê,ji wê nexwe iyê rizgar dike. Li wir jî dest bi nivîsa nameyan ji Hans (hevalê Martîne yê ku berê wî dide erqê) re dike.

Martîne dawî tê Bayezîde û bi hevalê xwe re Alberto li xana Sefer ahê dimîne û ji wir û careke din dest bi gera li pey bexteweriyê û kitêba El Ifade fî Iksîr El Se,ade dike..ev jî bi alîkariya Yavuzê çortanxwer(yan jî mirovê rûnuxmatî di Mîrnameyê de)

(Ji bo agahiyên zêde di derbarê kesayetiya Yavuz , û bûyerên ku hatine serê wî ,win dikarin di Mîrname de li rasa wan bîn-rûpelê 191.)

Êdî ji xwe ji me ve belî dibe ka çawa û da ku biçin serdana kitêbfiro ekî , di bin dara çînarê de , nêzik ji mizgefta Muradiyê û bi cil û bergên ku sezayî welatên kurmanaca ne, li benda Yavuz dimînin û weha dibin govanê darbesta Xanî û baran tijî bîna hibir.

Dawîya romanê û pi tî ku Martîne li wê xana lanet lê barî li rasta pir bûyerên seyr û diyardeyên balkê dibe , pi tî ku hevalê wî yê herî dilsoz Alberto tê ku tin û Yavuz jî û di odeya xwe de xwe bidar ve dike û dawiyê li jiyana xwe tîne ...Martîne ji ni kêve xwe li qata jêrîn ya xanê dibîne û li wir li rasta mirovekî dilpak tê, û ew kes wî li pey xwe dibe,,û dawî jêre dibêje ku ew Dawudê Yezdanyarê Mamzêdî ye , Martîne û pi tî ku dilê wî bi vî mirovê ge dibe jêre çîroka xwe dibêje ta radeya ku ta bi derziyê ve dike.

Dawud , pir ti tan ji Martîne re dibêje, tekez me navê em wan gotinên hêja ku di dawîya romanê de cî digrin dubare bikin, weha em xwe iya xwendina wê tîk dibin.

Hêdî, hêdî û bi bînferehî û kûrbînî, dê xwêner bi ser xwe iya xwendinê ve bibe, îreta me ku win ne di sê evan de xwendina wê bi dawî bêne, lê wekî me eniye zimên hinekî demê ji xwendinê re veqetînin.

Hêja ye gotinê ,ku mirov gava li gotinên Dawudê Yezdanyarê Mamzêde guhdarî dike , mirov dihgê ev ê baweriyê ku Dawud ne kesekî dine , ew Jan Dost bixwe ye, Jan kesayetiya xwe di karîzmaya Dawud de jîndar dike yan jî xwe li wir dubare dike û bi awayekî vekirî, rastteqîn û balkê , mîna fêlesofekî , hekîmluqmanekî ji mer re diaxife û incama xwendin, nivîsîn, zanîn, dan û standina xwe bi bûnewer û civakê re , li ser tayijeke heftrengî û bi comerdî li ber me radixîne.

Jan Dost,incma ezmûn, ger, û mebesta nivîsînê li gor derfet û karîna xwe terxanî xwênerên romamên xwe dike.

Û da em dawiyê li dawîyeke ku ji niha û pêve dê di hi û bîrewerîya me de bibe destpêk .


Tekez û gava Jan Dost xwe di serek lehengên romanên xwe de ve dibêje....!

Gelo....“ Rêyên ku meriv dighînin bexteweriyê hene, yan jî bextewerî bi xwe rê ye....?”

Bi hêviya xwendineke bextewer.....!



Ho eng Broka
hoshengbroka@hotmail.com



Xweda(yek) bi tenê asmanan bilind nake!

Herwekî çawa Aristo(384-322 b.z.) gotiye: „Hehecîkeke bi tenê, buharê bi xwe re, nayîne“, weha jî Kurdên pê î, di peyvnameyên xwe yên pê î de, gotine: „buhar bi kulîlkekê nayê“ û „gulek bi tenê, buharê ava nake“.

Helbet mirov dikare „hehecîka Aristo“, ku bi tenê, na ê buharekê bi xwe re bîne, û „gula Kurdên pê î“, ku bi tenê, buharekê ava nake, wek „rengeregiyek pirr“ û xwe ik, li ser gelek astan bixwîne, bide xwendin, û binirxîne.

„Rengeregiya buharê“, nî ana rengeregiya xweristê, ti tan, Xwedê û mirov e.

Xwedayê „rengeregiya“ jî, nî ana mirovê rengeregiya, cih û demên rengeregiya, ti tînen rengeregiya, rabirdû û dahatûya rengeregiya, û erd û asmanê rengeregiya.

Teqez, buhareke rengeregiya û bê guman, ji „guleke ilfî tazî“ û „hehecîkeke tikî tenê“, mezintir û ferehtir e.

Dunyayeke rengeregiya, û asmanekî rengeregiya jî, helbet dikarin ji mirovekî pirrtir, û Xwedayekî tikî tenê, wêdetir bin.

Buhara pirr, nî ana xweristê ye, ku pirr e.

Xwerista pirr jî, nî ana mirov û Xwedê ne, ku rengeregiya û pirr in.

Her ti t, mîna Xwedê û mirov, xwe iktir li hev tînen, ku pirr in.

Her ji destpêka „aqilê yekemîn“ ve, ku raman, bîr û baweriyên olî, rû dane, mirovan xwe „rengeregiya“ û pirr, di hemeregiya Xwedê de, hest kirine.

Di „dîroka gulana“ de, herwekî çawa „gulekê, bi tenê, buhar neaniye“, wisa jî di „dîroka asmanan“ de, Xwedayekî bi tenê, „dînekî ji buharê“ di kullekan re, bo mirovan, nehinartîye.

Ne gulekê bi tenê buhar bi dîrok kiriye, û ne jî Xwedayekî tikî tenê, bi tena serê xwe, asman ezber kiriye.

Ne gulek hemî buhar e, û ne jî Xwedayek hemî asman e.

Ne buharek bi gulekê dibe, û ne jî asmanek bi Xwedayekî tikî tenê, ava dibe.

Buhar bi gulekê kamil nabe, asman jî bi Xwedayekî, bilind û tekûz nabe.

Buhar ji gulekê ferehtir e, wisa jî asman ji Xwedayekî mezintir û bilindtir e.

Gulek ne buhar e, Xwedayek jî ne asman e.

Gul hemî buharek in, Xwedê jî hemî asmanek in.

Bi qasî ku dîn, rêgeh û bîr û baweriyên olî, di dîroka dînen kevn û nuh de, rengeregiya û pirr bûne, mirov jî di „aqilê Xwedê“ de, wek Xwedê di aqilê mirovan de, wisa hemeregiya û pirrtir bûne.

Li gorî dîroka „Xwedayê duh“, di vê „hemeregiya asmanî“ de, her dînek Xwedayekî bilind bû; her Xwedayek mirovekî bilind bû; her mirovekî bilind, aqilekî bilind, êweyekî ramankirina bilind, jiyaneke bilind, û felsefeyeke bilind bû.

Îro jî, di dîroka „Xwedayê îroj“ de, li ser heman asta „aqilê bawermendane“, dîroka asman, ku Xwedê li wir bilind û pirr e, ne yek e:

Xwedê, dîrok û dîrok, ne yek e; dînek mirov ne yek e, û mirovê dîn, ji dîn re, di dîn de, li jêr dîn û li jor

dîn jî, helbet, ne yek e.

Berê, bilind Xwedê bû. Îro, Xwedê nizimtir e.

Berê, Xwedê pirr dûr bû. Îro, Xwedê nêzîktir e.

Berê, Xwedê kamil bû. Îro, Xwedê kêmtir e.

Berê, Xwedê pirr bû. Îro, Xwedê hindiktir e.

Herçende ku li gorî aqilê Xwedayê îroj, hizra yektaperestiyê(yek Xweda, yek afrêner û yek „aqilê destpêkê“), wek „hizreke etîkî“, li seranserî pirraniya olan û fikrên dîni, hizreke serdest e jî, lê ne „aqil“, bi qasî ku wêneyê Xwedê, di „aqilê wan dînan“ de, tê xwendinê, yek aqil e, û ne jî Xwedê bixwe yek Xwedê ye.

Xwedê, wek „hizreke mîtafîzîkî“, ku bi fîzîkê ne tê dîtin û ne tê hiskirin; ne tê tamkirin, ne tê xwarin û ne tê vexwarin; ne tê bihnkirin û ne tê hestkirin; ne tê belgekirin, ne tê zeftkirin û ne jî tê bercestekirinê, di rabûnûrûni tina dînen cihêreng de, diyar e ku ne yek e.

Sîmayên Xwedê di Incîlê de, ne wekî sîmayên wî di Quraanê, yan Tewratê, yan Vida(pirtûka Hindokiyan), yan Avestayê, yan jî di duwa û dirûzeyên êzîdiyan de ne.

Herwisa li ser asta mirovên rengeregiya, û kultûrên cihêreng jî, dîsa Xwedê ji xwe yê „tikî tenê“, pirrtir û wêdetir e.

Li pey vê „hemeregiya“ û „pirrbûna“ Xwedawendane, dîn û dîn, wisa tê bawerkirin , ku Xwedê(herwekî çawa „dîroka asmanan“ dibêje) wêneyê mirovî, li ber wêneyê xwe, çê kiriye“.

„Dîroka erdê“ jî „hemeregiyeke“ din, dibêje.

Li gorî vê „baweriya rengeregiya“(anku baweriya dunyayî, ya pirrdîtin û ji dînan wêdetir), mirov bixwe ye, yê ku wêneyê Xwedê li ber wêneyê xwe, durist û xwe ik kiriye.

Ji ber vê „baweriya hemeregiya“, bi „Xwedayekî rengeregiya“, mirovên hemeregiya, îro jî wekî duh, ni teciyên dînen rengeregiya in:

Serê her dîrokekê aqilek e;

serê her aqilekî Xwedayek e;

serê her Xwedayekî dînek e;

serê her dînekî pirtûkek e;

û serê her pirtûkekê mirovek e.

Hehecîkek bi tenê buharê ezber nake!

Guleke tenê gulîstanê lê nake!

Heyveke tenê evê bi dost û yar nake!

Destekî tenê çepikan ava nake!

Aqilekî tenê dîrokê bi aqil nake!

Mirovek tenê dinyayê xwe ik nake!

Nimêjeke tenê qiblegehan razî nake!

Û Xwedayek tenê asmanan bilind nake!

Xweda pirr, hebûn e.

Xweda(yek), tunebûn e.



Sarhan Isa

Ji Xwedê û vir de

Ji Xwedayê ku hîna di xewnên Zarokan de bihbihokeke,

ji Xwedayê ku hîna di hi ê ademîzadan de kwînerewe nederdbûye,

ji Xwedayê ku hîna di hinavên evîndaran de borîzana tîrsê û mirinê ye,

ji Xwedayê ku hîna herikandineka xav û bê îroveye,

ji wî Xwedayî ve,

ji wê pîrsê ve,

ji wê tîrsê ve,

ji wê hingê ve,

min opa peyvê naskir,

û bûme rêwiyeke bêserûber Binef a min.

Ji wî û wir de,

asîmanekî bê stûn û erdeke bê hedan û tazî bû,

ji wî û vir de jî,

Tîrs û pîrs e,

guman û leylan e,

ji wî û vir de,

dayîka min fêrbû,

min li ber efsaneyê Xerîbo, û Lavijê Pîrê, bilorîne.

Ji wî û vir de,

Qewlikê Berata bû sînorek ji berfê,

û bi stiwê odeya min ve dalewqandin,

û ji wê çaxê ve,

min ser û opên Binef an, winda kirin.

Ji dema ku,

ez hînî kirim

rojê du danan

ji Rojê re herime sucde û tewafê

û tu fêrî Pênc ferzên heqîqetê kirin,

ji wê çaxê ve,

dûrbûna te bû destpêka helbestê,

û welat,

li me bû pêjin.

Ji wê hindê ve,

tu bûyî mêyeke birçî,

hîne li ser kevîkên eweke westiyaî xwe paldaye,

û li ber nirçe nirçe dilopên mêbûna te,

her ev mêr lûsên xwe berdidin,

û Perî û Firî te pêsîr û dawên xwe didirin

Û gerdûn di bin îhe îhe te de heje

Kemal Tolan

G R NG YA KEVNE OPÊN ROJA ÇAR EMÊ Û BAS NBAR ROJA ÇAR EMÊ –SOR



Li gorî ez ji Êzdîyatîyê fahm dikim; Xwedê ji ber nûra xwe Tawisî-Melek di rojêke çar emê, ku ketiye bîstûpêncê meha kanunê(12) ya dawîya çilê zivistanê de û dinya jî di rojêke çar emê ya di destpêka meha nîsanê de ku dibe dest pêka biharê de afirandine(çêkirine).

Li gorî mîtolojiya Êzdîyatîyê, çend kevne opên ku roja çar emê pîroz dikin evin:

Tawisî-Melek hersal carekê di roja çar ema yekemîn ku di keve serê meha nîsana rojhilatî de ji ba Xwedê tê dahirî ser erda Lali ê dibe û ev roj dibe sersala Êzîdîyan.

Milyaketan di roja çar emê de ruh berdaye qalibê Adem.

Tawisî-Melek di roja çar emê de Hawa ji Adem re afirandiye.

Seyîdî bin cer di roja çar emê de çêbuye.

Roja çar emê roja cimayî, dawetnebî û hemû cejnên pîroze.

Roja çar emê roja û tin û gera cin, perî û milyaketa ye.

Ji ber vaqas buyerên pîroze ku, em Êzdî hêjî bi taybetî hemû rojên çar emên di meha nîsanê de dikine cemayî û dawetnebî.

Em Êzdî hêjî di tevaya meha nîsanê de tû dawetan çênakin û di hemû rojên çar emen salê de jî tûcarî mahrê na birin.

Roja çar emê roja betlana Êzîdiya ye Ûwd.

**„Çar ema Sêre Nîsanê
ixadî êxalê emsa xweste dîwanê
Da qayîm bikin dîn û îmanê
Ev e îda Kurdistanê.“**

EV JÎ BEYTA ÇAR EMBÊYE :

" Beyta Çar embûyê (Beyta nesîhetê çar mbûyê)

1- Çar embû rojeka fadile
Melik fexredîn afrandibû ji e iq û dile
Nasnedikir ruhê çû xafîle

2- Çar embû rojêke bi hisabe
Ji ba wan meleka hafî ev cewabe
Derfîyê xêra divekirîne ji rojhelat heta rojave

3- Çar embû perî kirase
Ji mera dana esase
Nabî xo ji tokê bikî xilase

4- Çar embû rojêke xase çar mbûyê çar mbûyê
Hincî mêrê sê rukina bo xo ji îmanê biket esase
Tawisî Melek yî qadire wê ruhê ji agirê dojê biket xilase

5- Çar embûyê xo kir jîyan
Kesik kir de it û çîya û zevî û zozan
Ew jî bi kerema ped ê minê êzdan

6- Çar embû ji mera geleke
Çendî heyne si'ûd û feleke
Hemû bi destê Tawisî Meleke

7- Dema çar embû têt ji sipêde
Ebadetê bike ji Xudêra bi ta'et û zêde
Tawisî Melek li te diête fêde

8- Dema çar embû roj hiltêye
Hincî mêrê zû rabbit ji xewa berê subêye
Medih û sena bi ket bo navê Xûdêye
Du'a Tawisî Melek ye lêye

9- Tawisî Melek yî rêbere yî serwere
Ew melekê her û here
Ew dizanî li vê dinyayê çend qender ax û av û agir
û bay û bere

10- Ya Tawisî Melek tu melekê axretê û dunyayê
Tû bideye xatira çar embûyê her duwazide
mehayê
Tû me li fecrê rakey ji xewê da bikeyin ebadetê û
du'ayê

11- Ebadet li me ye fere
Piris biken ji derwê an û qelendere
Ka çar embû çend bi xatire

12- Derwê û qelenderê safîne
Ji îmanê bi ronahîne
Li çar embûya di serdayîne

13- Hatî serdayîn li çar embûyan
Daxiwaz kirin ji maleke rehman
Ruhê zalima bêxne dojê û devê maran

14- hincîyê navê Tawisî Melek bîne
yefere çar embûyê bisediqîne
Tawisî Melek dê wê ruhê ji qeda û bela sitirîne
.....

15- Hincîyê wacibê çar embûyê bînte cîye
Borê xo hefsarket li hemû cîye
În elahh Tawisî Melek jê razîye.....

16- Wacibê çar embûyê li me fere
Neken li çar embûyê çu zîyan û zerere
Dê cehwer den li dîwan û mehdere.....

17- li mehdere deng bi ke
Çar embûya serê nîsanê reng bike
Emelê xo safî bike.....

18- Çar embûyê emel xo têt
Ji xêrê ji xilmetê ji xîretê ji ebadetê
Xozka wê ruhê bi cî bînetê vê nisîhetê.....

19- Hat çar embûya sore
Nîsan xemilandibû bi xorra
Ji batinda ye bi more.....

20- Hat çar embûya sor û zere
Behar xemilandibû ji kesik û sor û sipî û zere
Me pê xemilandibû seredere.....

21- Hincîyê serederê bi xemilîne
Bila pisyar ket ev ji ber çîne
Eve xelatê Tawisî Melek û sultan êzîne
Tawisî Melek ewê malê ji qeda û bela di sitirîne.....

22- Bêjme we gelî sînîye
Hîvîya li çar embûyê zor hîvîye
Hincîyê ferzê heqîqetê bînte cîye.....

23- Bêjme we gelî sînetê
Li eva çar embûyê nefîsê nebe ehwetê
Ji ber xatira axretê.....

24- Heke hûn digirin axretê
Li çar embûyê neken xeletê
Da we bixûnîn li baxê cinetê

25- Dibêjme we ji heqîqetê
Hûn sist nebin li ebadet û me'rifet
Tawisî Melek dê dete we qewetê.....

26- Qewete ji îmanê , îmane bi nî ane
Tok û meftûl ,simbêl û girîvane
Evne di ferin bo mêrane.....

27- Hincîyê bi îmanê xo nas kir
Li çar embûya serê nîsanê daxiwaz kir

Tawisî Melek ew ruh xelat kir

28- Hat çar embûya ewilî
Durr bi renga xemilî
Ev dinya pê di kemilî.....

29- Hat çar embûya faxirî
Ya Tawisî Melek her tû yî qadirî
Te pîranî dahir kir û kire rûkin ji ewilî

30- Ya Tawisî Melek te ev dinya bi pîranî kir
Karê pîranî te qebûl kir
Karê bê pîranî te hez ne di kir

31- Hat çar embûya qere
Du'a ji melekê ekbere
Karê pîranî bi çite sere.....

32- hat qere çar embûya qere
Hincîyê girîvanê heqîyê li bere
Tawisî Melek jêra mefere.....

33- Hat çar embûya qere
Xelat ji melekê ekbere
Bo ruhê , ji îmanê gurrî diken çira.....

34- Çar embû rojêke xuyane
Ev dinya tamam bila pê bizane
Tawisî Melek ji merra ehde û îmane.....

35- Çar embû rojêke pake
Hincîyê farîqe bû ji make
Xaliq hemûya dê wefake.....

36- Çar embû rojêke bi nî ane
Hincîyê bi girit qedrê dayik û babane
Dayim dayim merkeba wî li behrê giran ye
melevane.....

37- Çar embû rojêke emîne
Ezîz Tawisî Melekê min nav irîne
Bi navê melik erfedîn , ji merra bûye dîne

38- dîne û ik têt nîne
kesê di bêjît we nîne
melik erfedîn surra enîya wî distîne

39- ya melik erfedînê minê her û herî
Tû bi deye xatira erid û ezman û dar û berî
Tû li me nekeye tengavî , zû li banga me werî.....

40- Tû li banga me werî Lali ê
Li çar embûya serê nîsanê
Melek li adî (Hadî) diqarît enkara bînte ser rêya
îmanê

41- Enkar di ikdarin
Xafil di kifarin
Li axretê di bê zarin
Cîyê bo wan vejwartî li axretê doje ye û narin

42- Enkar çendî bi enkirit
Û xafil çendî bi kifirit
Li axretê cor û ezaba wî zêde di kitirit

43- Hûn birênine heqîqetê
Ye tijîye ji ebadetê û me'rifetê
Mixabin hûn xo bidene alî ji ber navê we têt

44- Çar embû roja sulhetê
Hincîyê bo xo bibîne edretê
Her çar embû roja efaetê

45- Heke te bivêt ser xo rakey core
Zadekî li çar embûyê bide dore
Tawisî Melek yî xefûre , ew nûre li ser nûre

46- Çar embû rojêke girane
Hincî ruha bi ol û edeb û erkane
Ew dê hola xo bete ser holane

47- Di bêjme we gelî êzîdîyane
Xelatê Tawisî Melek bi gelek rengane
Xîreta dînî serê hemûwane

Temametî li navê Xudê û Tawisî Melekê mêrane...
Ev beyte sala 2004 babê min ji minra andîye û
wesa xuyabû kû bi destê berêz : Rênas ero
Bira hîm Ki to hatibûwe nivîsîn ,

û hejîye bêjim kû sebeqên 37- 43 li ser dû pelên din yêna cûda kû bi destê berêz pîr Xelat pîr Elyas pîr Ce'fo di nivîsîbûn li gel bûn , supasîya wan teva di kem..... (Ev hate girtin ji ber çavk.3: **Bedel Feqîr Hecî** Mon Jan 09, 2006 2:17)"

BASINBAR

Em Kurdên Êzdî ji berê ve, timî pi tî her sersala nû, di roja heftê meha nîsana Kurdî de, ji hiriya miya tayikekî bi te iyê dirêsin. Dûre benikê xwe bi her sêh rengên pîroz di rengînin û ji vî benikê re dibêjin basinbar.

Merivên Êzdî vî benikê basinbar bi qevda destê xwe ve girêdidin û hêvîdikin ku nezer, nexwe î, bela û kêmasiyên sala nû neyê ne serê wan. Wekî din jî benikê basinbar, li ba me Êzdîyan symbola bereketa demsala biharê, zad , pez, dewar û hemû zêdebûnê ye. Lewma, hêjî gelek Êzdî di roja heftê nîsanê de basinbar bi hemû dewar û pezên xwe vedikin. Hinek jê jî basinbar bi serê darikê ku pelora Xidir Elyas û Xidir Nebî pê li hevûdinê xistine vedikin û dibin di nava hemû zad û çandiniyên xwe de diçikînin.

RENGÊN PÎROZ

Rengên li ba Êzdîyan pîroz kesk,sor,zer û sipî ku rengên all û tabîat(xwezay)a Kurdîstanê ne.

Di meha nîsanê de tabîata li Kurdîstanê bi rengên kesk, sor, zer dixemile û ji ber vê yekê ye em Êzdî di vê mehê de tû bûka dernaxin û em vêgajî dibêjin "Meha nîsanê bi xwe bûka salê ye û ew tû bûka di ser xwe re qebl nake".


Berê jin û mêrên Êzdîyan ji xeynî cilên rengên wan sipî pê tir, wekî dinê tû rengên di bin al, saqo û paçikê xwe de li xwe nedikirin.

Heta îro jî herkes dibîne ku libasên Ruhaniyên Êzdîyan hêjî tev xûrî sipî ne. Vêga jî gava ku Êzdîyek kiras diguhêre ji xeynî kefenê sipî tû libasan dinê lê nakin. Ev baweriya Êzdîyan jî dide xwanê, hinga ku mirî derkeve dîwana Xwedê û Milyaketan gerek cilên wî paqijbin û lewma hêjî Êzdî dibêjin:"Paqijî ji Îmanê ye"

Min ev agehdarî di pirtûka xwe a bi navê Nasandina Kevne opên Êzdîtiyê- We anên Perî 2006 u di rûpel: 133-141 de jî belakiriyê.

Ez hêvîdarim ku em Kurd bikaribin vê cejna roja afirandina cîhanê, nûbûna xwezayê û meha bûka serêsalê, ya ku ji baweriya Ezdahîtiya bav-kalên Kurdên resen gihî tiye me, bi kurdperweriya xwe ji bo azadî û a atiya hemû rengên xwezamirovatiyê biparêzin .

Çar ema serê nîsanê li we û hemû hizkiriyan we pîroz be !



Lewend Dalînî

KESEREK Î DU HÊSIR



Hîn di dema suxtebûna xwe de, li zanîngeha amê, berî nêzîkî bîst salan; kû ew jî weke gelek xortên Kurd ên çûbûne xwendina zanîngehê!, car carna dema kû ji xwere pêlaveke nû dikirî; roja din xwe di û t, destek cilên paqij li bejna xwe dikir, lewento û bînen xwe bi xwe dadikir, û pêlava nû di xiste lingê xwede û berê xwe dida Sînema Kindî (wê demê gelek filîmên cîhanî wê Sînemê Pê kê dikir, û bêtirên tema evanên wê, xort û keçên zanîngehê bûn).

Timî berî derbasbûna Sînemê, û di hebûna pêlava nûh de; û ji bona çermê wê nermtir bibê; diçû cem yekî boyax çî kû timî li derwaza xwarinxana "ELÎ BAB" rûdini t, rêbarîyan qûnderê xwe li cem boyax dikirin!. kû qûndera xwe boyax bikê!?

Ev qûndera te vêcarê çermê wê qenc xuyanî dikê; ne weke a tey berê ye! boyaxçî bi "Erebî" jêre got? Raste, ez jî pêdihisim kû çêtire, min ne ji vir lê min ji "MEDAYA" kirîye!?

Jêre bûbû weke prîstîjekî kû di pi tî qedandina xwendin zanîngehê re jî çî cara kû bi hata amê diçû cem wî boyaxçîyî qûndera xew boyax dikir!. Kesî ji wan navê ê din nasnedikir! Wî digotîyê Ma'alem, (Hosta) û boyax çî di gotîyê "Istaz" (Mamosta!), û kû demekê dirêj boyaxçî ew nedîta, dipirsî: Tû çûbû bajarê xwe û hew!?

Gelek caran kû di wê derwaze yê re dibûrî û ew nedidît, boyaxçîyekî dîtir hebû ew jî li nêzîkî wî rûdini t! li cem wî boyax nedikir!. Carekê Boyaxçîyê dî qerfê xwe kirin û got:

"Dostê te jineke nû ji xwere anîye û jina wî nema dihêlê bê vî karî bikê!?". Peyre ji boyaxçî re got: Kenîya!

Vê talîyê jî dema kû mala xwe anîbû bajarê amê, ji boyî karê xwey abûrî! dîsa jî her serê çend rojan û her rîya wî bi wê deverê biketa diçû qûndera xwe li cem boyax dikir.

Rojekê Sozekî wî bi dostekî re hebû, nêrî li katjimêrê, dît kû hîna nîv sa'at ji dema soza wî re hîn maye! Got : De ka ezê herim bera boyaxçî çend firça li qûndera min bidê, va di ria min deye?.

Bayê Payîzê li hinarkê riwê wî û li pozê wî dida, û di nêva taximê cilê xwe de tevzînokê sermê di la ê wî ê nazik de xwe belav dikirin, û ramanên wî ên mezin weke Çiyayê Qasîyonê Jî, tevî hev dibûn, û di dîmahîkê de weke bîranînekê, cihekî xwey taîbetî di nêva sewdanê wî de girtin!?

Dem çiqasî zû derbas dibê, jiyan çiqasî tê guhertin? gelo ne ji demeke dirêj ve ez suxteyê Zanîngehê bûm, serbestîyê ji hewcebûnê jiyanê, û azadî jî tevgerên bûyerî? wey loo, wey loo, helez hin bi hin derbas dibe û îranîya wê kêma dibe!? gelo çiqasî zaroketî, xortanî xwe e? hin bi hin ji destên me diçê, û hew vedigerê.... Lê bayê wê carna li pozê mirov dide û mirov pê ahî dibe!...Û hew xwe nedît kû va cihê boyaxçî bi qederekê Jî derbasdike, ji ramanên xwe iyar bû, û vegefiya!

Lingê xwe ê rastê danî ser sebeta boyaxçî weke hercarî, û silavkir bêyî kû dihnê xwe bidê, dît kû dengê gîha guhê wî! mat ma!? nêrî kû sebet ewe lê boyaxçî yekî dîye? û xorte! Kanî xwedîyê vê sebetê? Bi Erebî jê pirsî? lê vegeand: Welleh Ebû Ezîz çûye bajarê xwe (Bi Erebîyê ikestî neweke zaravê amîya!). erwalê wî lêquliband qena ne lewite ji boyaxê, û qeytanên wî xistin ber qûndera wî, û dû lastîk xistin ber gorê û qûndera wî de û dest bi karê xwe kir.

Di dilê xwede got: Dêmekî navê wî E. Ezîz e û ne ji amê ye? gelo wê ji kûderê bê?. Dîsa jê pirsî? Ma ne amîye? go na, û karê xew berdeyam dike. Gelo bajarê wî li kû ye? got: Dûre... Dûre, ji cezîrê ye! hebekî sekinî û mat mayî ma! Ev nêzîkî bîst sala kû ez li cem qûnderen xwe boyax dikim û min nizanîbû kû ji kûye!? mirov di bajarên mezin de windayî ye!?

Ji cezîrê ji kîjan bajarî ye? Ji xort jî werê kû ew bi xwe jî amî ye! got: ji Amûdê; ma te navê wê bihîstîye?. (Wey pismam...Wey... Sînema Amûde, Mihemedê Saîd Axa xwedîyê cêbê, Zergayê "Ûsivkê Çelebî, Rifatê Darî" Cegerxwîn û dibistana kurdî, welatperwerî!?. Teww teww!). Ma kes heye kû Amûdê nasnakê! bi kurdî lê vegeand! xort ji nûve sekinî û serê xwe rakir! ma tujî Kurmance? û tu ji Amûdê ye? bi ahîyê mezin pirsî? Na na ez ne ji Amûdê me lê ji nêzîkî wê me!.

E. Ezîz apê mine îsal mûsim li cezîrê qence! ji xwere wê herê ser Patozê, hinek deyn lê hene! belkî îsal karibe bidê!?. Deyn lê hene!... Ev îsal bîst sal E. Ezîz bi feqîrî vî karî li vî bajarî dike, û hîna jî deyndare, wey qede bikevê hal, û belengazîa me kurda! were ji bîstên salan ve ji bajarê xwe koçber bibe û karê boyaxê li ber dîwarekî ji ên bajarekî kû kes kesî nasnake bike, biyanî, birçîbûn, rezîlî, timî para mene!?

Ramanên wî dîsa jî gelekî kûr û dûr çûn, û jibîr kir kû hîna lingê wî liser sebeta boyaxçîye!Xort bi nazdarî pi ta firça xwe li binê qûndera wî da! Pênehîsiya! cara didiwa, yasisîya, xort serê xwe rakir û got: Ji kerema tere lingê dîn! weke kû tû wî ji xewekê rakê veciniqî! rabû lingê xwe ê rastê hiland û ê çepê danî.

Nêzîkî dû miha di wê navê re derbasbû, rojekê di wê taxê re derbasbû, li qûndera xew nêrî, û derbasbî wê derwazê bû, dît kû waye E. Ezîz qotîyên xwe dadigre boyax û amadebûna boyaxa qûnderekê dikê!.

Silav lêkir lingê xwe danî ser sebetê weke hercar, û jê re got (lê vê carê bi kurmancî): Tû çawaye Bavê Ezîz? Serê xwe hilda û lê nêrî! di cihê xwe de mat ma!? nema peyîvî, û weke heyecanekê lê peydabû.....kelogirî bû!..... Kesereke kûr ki and, û çavên wî du hêsirên ziwa barandin!?!?.....

dimînin. Di cemaetê de heya Reso îznê neda akiro, akiro stranan nedigot.

Ji folklora kurdî

ÇIROKA KER Ê HEVALÊN WÎ



Carek ji cara, mamê Xidir li kerê xwe siwar bû çû dara, lê bû wextê êvara. Mamê Xidir bala xwe dayê Gurekî ji wê de hat, çû lêxist Kerê wî xwar! Mamê Xirdir jê re got; ey heywanê hovê har, qe li berîya jêrîn tunebûn berx û kar, tu hat te lêxist kerê min evdalî xwar? Gur jê re diranê xwe li hev xist û got; mamê Xidir bes e bike guregur, vî kera çû, here ji xwe'r yekê din bikir:

Hebû tunebû kerekî bêxwedî li dora gundekî hebû. Lê ker pîr erpeze û perî an bû. Ji ber ku heçî kerekî wî hebûya bi wî kerî dikir û heçî ku barekî wî hebûya li wî kerî dikir. Ker êdî ji kar û ixulê xelkê bêzar bibû, lewra ji xwe re bi navsera çiyê ve hilki iya. Bi rê ve rastî roviyekî hat.

Rovî got:

- Ho kero, tu yê biçî ku?

Kerê got:

- Quzulqurta bavê kero!

Rovî got:

- Lê bêjim çi?

Kerê got:

- Bêje »kerê bi kurtanê zer, sêniyeka ceh li ber.«

Rovî got:

- Kerê bi kurtanê zer, sêniyeka ceh li ber, diçî ku?

Kerê got:

- Ez ji ber gundiyan bêzar bûme, ber bi çiyê ve hildiki im.

Rovî got:

- Ma tu min bi xwe re nabî?

Kerê got:- Ma çima nabim? Her du bi hev re çûn, çûn rastî beranekî hatin.

Beranê got:

- Ho kero, tu yê biçî ku?

Kerê got:

- Quzulqurta bavê kero!

Beranê got:

- Lê bêjim çi?

Kerê got:

- Bêje »kerê bi kurtanê zer, sêniyeka ceh li ber.«

Beranê got:

- Kerê bi kurtanê zer, sêniyeka ceh li ber, diçî ku?

Kerê got:

- Ez ji ber gundiyan bêzar bûme, ber bi çiyê ve hildiki im.

Beranê got:

- Ma tu min jî bi xwe re nabî?

Kerê got:- Ma çima nabim? Ker, rovî û beran bi hev re çûn, çûn rastî dîkekî hatin.

Dîko got:

- Ho kero, tu yê biçî ku?

Kerê got:

- Quzulqurta bavê kero!

Dîko got:

- Lê bêjim çi?

Kerê got:

- Bêje »kerê bi kurtanê zer, sêniyeka ceh li ber.«

Dîko got:

- Kerê bi kurtanê zer, sêniyeka ceh li ber, diçî ku?

Kerê got:

- Ez ji ber gundiyan bêzar bûme, ber bi çiyê ve hildiki im.

Dîko got:

- Ma tu min jî bi xwe re nabî?

Kerê got:

- Ma çima nabim? Ker, rovî, beran û dîk bi hev re çûn, çûn rastî kevro kekî hatin.

Kevro kî got:

- Ho kero, tu yê biçî ku?

Kerê gotê:

- Quzulqurta bavê kero!

Kevro kî got:

- Lê bêjim çi?

Kerê got:

- Bêje »kerê bi kurtanê zer, sêniyeka ceh li ber.«

Kevro kî got:

- Kerê bi kurtanê zer, sêniyeka ceh li ber, diçî ku?

Kerê got:

- Ez ji ber gundiyan bêzar bûme, ber bi çiyê ve hildiki im.

Kevro kî got:

- Ma tu min jî bi xwe re nabî?

Kerê got:

- Ma çima nabim? Ker, rovî, beran, dîko û kevro kî bi hev re çûn, çûn bi rê de kerî got:

- Gelfî hevalan, zirra min hat, divê ku ez bizirrim.

Hevalên wî jê re gotin:

- Malava, tu yê çawa bizirî, em di navsera vî çiyayî de ne, wê gur bi me bihesin, wê me hemîyan bixwin!

Kerê got:

- Nabe, axir divê ku îllahî ez bizirrim. Axir, kirin nekirin, ker qayil nebû. Kerê serê xwe bilind kir dest bi zirrinê kir:

- Ahîîî, ahîîî, ahîîî! Tu nebê li devreka nêzî wan heft gur hebûn. Wan dengê kerî bihîst. Her heftan ji hev re gotin:

- Gelo ev çi deng e, tê?

Yekî ji wan got:

- Ka ez herim, bê ev çi deng e. Hevalên wî gotin:

- De here. Gur hat dît ku ker û hevalên xwe di navsera çiyê de di nava mêrgê de ne, bêxwedî ne, hema kêfa wî hat û ew ber bi wan ve çû. Ji pi t ve çû çû xwe avête nava te kênerê. Hema kerê her du rahnên xwe li stûyê gurî idandin û ew zeft kir. Beran ji pi t ve bi posan rabûyê.

Dîko çû ser pi ta kerê bang da. Rovî erd kola. Kevro kî da xapa. Bi vî awayî hingiya beranî li gurû da ew bêhi xist. Pa iyê wan gurî berdan, ew nîvmirî çû ba hevalên xwe. Havalan jê pirsî:

- Birayo, te çi dît? Gurê jihalketî got:

- Birano, qet deng nekin. Ez çûm min qewmek li wê derê dît, kes nebîne. Wan meraq kirin gotin:

- Çawa? Wî got:

- Gava ku ez çûm, hema serê min kirin nava du latan, û bi du mêkutan li nava pi ta min dan. Yekî ji wan yasîn li ser min dixwend, yekî dida xapan li kefenê min digeriya. Yekî jî her gorra min dikola. Gava guran ev agahî bihîstin, tirs ket dilê wan hemîyan bi hev re ji wir bazdan, gotin:

- Gidî, ukir ji Xwedê re ku em ji lepên wan rizgar bûne..

Çîroka min çû navdara

Rehmet li dê û bavê guhdara

ÇAVKANÎ: Rojaciwan



Ser hildana Qami lo 2004



Luqman Silêman

Luqman_sileman@live.se

KÎ ZANÊ Çîrokek gelêrî



Di bêjin du mirova dostanî dabûn hev. yek ji binxetê bû û yek ji serxetê bû. Yê serxetê gelekmalدار bû pirê cara ew bi ser dest û birakê xweyê binxetê de diçû. Çû di dostaniya wan domkir bi ser hevde diçin û tèn û herdû jî bi vê dostaniyê dil xwe in û deyfa wan ji hev re tê.. Tu nebê yê binxetî ne bi dilekî bi hezar dilî dil kete jina yê serxetî û jinik jî pir xwe ike û hîn jinik piçûke tenê di zarok anîne û herdûjî kurin...

Yê binxetî digere li ferzendekî ku nêzikî jinkê bibê lê hîn bi dest wî neketiye.

Yê binxetî dênaxwe didê jiyana rojane û têkiliye zilam bi jina wîre çawe ne sal û meh derbasbûn û yê binxetî wan dijmê rê ta ku naskir ku dest û birakê wî salê carekî diçê nivîna xwe ji xwe re got ba e û ew ma li benda wê rojê wek ku li ser agir bê ka wê kenî ew roj werê û gelo ma wê karibê ew wê evê ji dêvla dostê xwe herê ser nivîna wî û çawe?..

Ew roj nêzik bu yê binxetî kar û baraxwe kir û hin hûre mûr kirin û berê xwe da mala dest û birakê xwe lê kiriye di serê xwe de ku ew bê ku herê nivîna jinkê ji wir newê..

dema yê binxetî giha mala dest û birakê xwe gelek keyfa dostê wî ji demek dirêj ve dostanî dane hev pîrsa rew a hev malîyê hev zarokê hev kirin û bi hev abûn.. zilamê gund hatin dora wan ji xwe re ketin axavtinê serxet û binxet li hev dan ta ku ev li wan giranbû mēvanê wan belabûn. Herdû mane bitenê wê evê yê serxetî wê herê nivîna xwe ji salê ew ev ya wiye. Ew nizanê ku yê binxetî dizanê wê î ev ew herê nivîna xwe û yê binxetî bi xwe ji ber wê evê hatiye? Her yek ji wan di xwazê yê dî razê ji ber ku yê serxetî ji mēvanê xwe erim dikê herê oda pîra xwe û yê binxetî jî di xwazê dostê wî bi xewve herê û ew herê ser nivîawî..?

yê binxetî di axvê ji çîrokekî di çê çîroka dî ev giranbû mēre jinikê bi xew ve diçê lê yê binxetî ji salifekî diçê salifekî ta ku xew li xwediyê malê giranbû. Yê binxetî di xwazê mēre jinkê bi xewê lê giranbikê û ew herê nivîna jinkê. Mēre jinkê bi xew ve çû ewjî dēna xwe didiyê ta ku xew lê giran bû..

yê binxetî da xwe çû nivîna jinkê karê xwe kir û hat cardî li ciyê xwe rûni t û axivtina xwe berdewan kir.. Mēre jinkê ji xwe iyar bû dî va hîn mēvanê wî rûni tiyê û hîn salifa dibêjê.. ew nizanê ku mēvanê wî çû nivîna pîreka wî û cardî hat ciyê xwe rûni t. yê serxetî gote: mēvanê xwe ma em nerazin? Mēvanê wî got: belê emê razin her yek ji çû ser ciyê xwe lê xewa yê serxetî nayê ji ber ku î ev eva wiyê divê herê nivîna xwe ev saleke neçûye nivîna xwe û gerek herê..

pi tî ku xew li mēvanê wî giranbû da xwer rabû berê xweda nivîna pîrek xwe lê dema derbasî nav nivîna pîreka xwe bû jinkê jêre gotiyê ne ji edeta teye niha tu çû ev î ev çî bi hatiye.

mêrik zanî ku yê binxetî çû ye nivîna wî di cîde bi ûnde vegera hat kete nav ciyê xwe bê ku ti kekî ji pîreka xwe re bêjê yan ji mēvanê xwera bêjê.. sibî zû deyîn li mēvanê xwe kir got: rabe em herin ser kaniyê herdû bi hev re çûn ser kaniyê xwe tahir kirin û nimêja xwe kirin yê serxetî gote: mēvanê xwe ez dizanim evê dî te çikiriye û ez dikarim niha te li vir bi kujim lê ez deynakim te. Tu wek xwe û ez wek xwe?

yê binxetî serê xwer kire ber xwe û deynekir zanî ku destûbirakê wî bi xiyanek wî agedarbuye ji wir berê xwe da mal û yê serxetî jî vegera hate mala xwe û dostaniya wan li wir bi dawî bû.

pi tî nih meha pîreka yê serxetî zarobû Xwedê kurek dayê.. Bûne sê kurê yê serxetî pi tî çend sala ew hersê zarok mezinbûn lê vî mirovî ti tek ne ji pîreka xwe re û ne jî zarokê xwe re ne got: ji ber ku pîreka wî nizanî ew mēvana wa bû yê ku wê evê çûyî nivîna wê û ji webû ku ew mēre wêbû ji ber ku tarî bû ronî tunebû ji lewma mēre tenê dizanî ku kurek ji kurê wî ne ji wîye. dema ku zilamê serxetî kete ber mirinê bakire hersê zarokê xwe. hersê zarok hatin li dora bavê xwe rûni tin.. bavê wan ji wan re got: va ez li ser do eka mirnê me ezê ti tekî ji we re bêjim? hersê kure bi hev re gotin: bêje.

Bavê wa ji wan re got: yek ji we hersêka ji malê bê pi ke.

Pi tî bavê wa mir du sê meh der bas bûn hersê bira xwest malê xwe li hev parkin lê wesîtiya bavê wa hete bîra wan ku bavê wa gotiye yek ji we ji malê bê pi ke? lê her yek ji wan ji xwe re dibêjê ne ezim yê bê pi k ji malê.. Wê çî bikin çî nekin nizanin her sê jî cêhilin ji xwe re pîrsîn ji vir ji dera dî hinê aqil menda ji wan re gotin: heger hûn bi xwazin zanibin kîjan ji we ji malê bê pi kê herin irfê..? Her sêka li hev nêrî gotin: emê herin irfê lê ka li kuye kes nizanê yê eraf li kuye hersê bira ji hev re gotin: emê herin bigerin ta em yekî eraf bibînin û emê çîroka xwe jêre bêjin ka ewê çî ji me re bêjê.

Sibî hersê bira dane dora hev û çûn birê de gihane gundekî ji hev re gotin: emê î ev livî gundî bin. Dēna xwe dane gund dîtin vamalek li rexê dunde her sêka ji hev re gotin: emê herin vê mala li rexê gund çûn destê xwe li derî dan. xwediyê malê derî li wan vekir birayê mezin got: ma hûn mēvana na hewînin? xwediyê malê got: mēvan mēvanê Xwedêna ma çawe em wa na hewînin derbas bûn. Rûni tin domekî man xwediyê melê xwarin ji wan re anî li ber wan danî û ji odê derket ji wan re gotin: hûn bixwin ta ez werim ji ber ku min xwariye?

Hersê bira ketin ser xwarinê de dixwin, ji ni kîve? Birayê mezin got: hun dizanin ev go tē em dixwin herame..?!

Birayê navê got: ma hûn dizanin ev nanê em dixwin herame..?!

Birayê piçûk got: ma hûn dizanin xwediyê malê ne ji bavê xwe ye..?!

Xwediyê malê li ber derî dengê wan dikê?

Rahi te ûrê xwe û derbasî xênîbû ji wan re got: min dengê we kir ezê herim bi pîrsim heger ku ev gotinê we ne rastbin ezê serê we hersêka jê kim lê heger ku rastbin ti tē hûn pēve hatin ezê bidim we?.

Xwediyê malê rahi te ûrê xwe û berê xwe da yê ivan jêre got: ev gu tē te ji mēvanara çêkirî yê çiyê?

yê ivan got: ez benî ev berxekê meyê sêwî bû diya wî mirbû min ew bi irê kûçikê xwedî kirbû.. Xwediyê malê ji xwe re got: ev yek raste? ji wir berê xwe da yê Cotarî ji wî rejî got: ev genimê we kirî ard we ji ku aniye?

Yê cotarî jêre got: ez benî me hin genim li ser ziyaretê çandibû û ew nanê hûn dixwin ji wî genimiye?

Zilam ji xwe re got: ev jî raste? Zilam berê xwe da çû cem diya xwe û ûr danî ser qirka wê û jêre got: tē ji min re bêje ez ji bavê xwe me yan na?

Diya wî got: kurê min ezê ji tere rastî bêjim?

Zilam got: ez hatime ku tu rastî ji minre bêjê?.

Diya wî jêre got: kurê min bavê te diçû bazirganiyê bi meha nedihat mal û carekî ji wan carekî ku bavê te diçû û bi meha nedihat ivanê me hate nivîna min û tu jê wê carekê çêbûyî... Xwe diyê malê vegera cem mēvanê xwe ji wan re got: her sê ti tē we di gotin rastin?

Deka bêjin çîroka we çiyê û hûn li çî digerin? Birayê mezin got: emê herin cem yekî arif da ku irfa me bi birê.. xediyê malê ji wan re got: deka bêjin irfa we çiyê?

Cardî birayê mezin got: dema bavê me kete ber sêkerata ji mere gote: yek ji we hersê bira ji malê bê pi ke û em nizanin ka kîjan ji meye. xwediyê malê got: bi Xwede ji we çêtir û zanetir nîne ku ji hev derxê ka kî ji we bê pi ke ji malê.. Hersê bira dane xwe û ji malê der ketin lê nizanin wê bikuve herin lê wê bi pîrsin ta ku bighin merema xwe.. bihev êwirin ka em berê xwe bidin kudê? Her yekî ji wan gotinek gotin. dawî berê xwe dane roj hilat û rêyek ji xwe re girtin û her sê bira bihev di me in yê mezin gote: herdû bira hûn dizanin, devihêk di vê rê re çûye û ev devihê hêç bûye?

Birayê dî got: barê wê dimsê?

Birayê sêya got: ev devihê kore bi çavekîye?

kêlîkî çûn zilamek giha wa û ji wan pîrsî ma we devihêk nedîtiye?

Birayê mazin got: ma devihate ne hêç bûye?

Zilam got: belê!

Birayê dî jêre got: ma devihê ne bi çavekiye?

zilam got: belê!

Birayê sêya got: ma barê wê rexek ne dimse?

Zilam got: belê hersêka bihev re gotinê: me deviha te nedîtiye!?

Zzilam ji wan re got: nexwe hûn çawe di zanin ku deveha min hêçbûye û kore û rexek ji barê wê dimse û hûn her ti tē diviha min dizanin!? Hersê bira jêre gotin: bi Xwedê me deviha te nedîtiye yek ji zilam û yek ji hersê bira kirin û nikirin ti tek bi guhê hev ne xistin.

Birayê mezin gote: Xwediyê devihê em diçin irfê tu jî bi mere were emê herin irfê madem tu ji me bawer nakê?

Zilamê xwediyê devihê got: ba e ezê werim..

Ewî jî da dora hersê bira û berê xwe dane irfê

demakî ba çûn birayê mezin got: va pîrekek xeyîdî divê rê re çûye?

Birayê nivê got: ew pîrek bi helekiye?

Birayê piçûk got: guhê kirasê wê pîrekê qetaye?

Damekî çûn zilamek gihawa ji wan pîrsî ma we pîrekek nedîtiye divê rê çûy?

Birayê mezin got: ma ew pîrek ne xeydî ye?

zilam got: belê xeydiye.

Birayê nivê got: ma ew pîrek ne bihalekiye?

birayê piçûk got: ma guhê kirasê wê ne qataye?

Zilam got: belê ev hersê ti tē we gotin rastin..

Birayê mezin got: bawerke me nedîtiye..

Zilam got: çawe we ne dîtiye va hûn dizanin ku ew xeydiyê û ew bi halekiye û guhê kirasê wê qetaye bi Xwedê we ev pîrek dîtiye û hebê nebê

we ti tin jê kirine!?

yek ji wa yek ji wî birayê mezin got: ger tu ji me bawer nakê tujî bi me re were emê herin irfê?

Zilam got: ezê werim her pênca dane dora hev û berê xwe dane irfê.

hersê bira û xwediyê devihê û yê ku li pîrekê digere çûn û çî kesê ku wî bi rêde dibînin û yan gundê ku digihinê di pîrsin li yekî ku zenê irfê bibirê. Bi rêde li hin kon rast hatin hina berê wan da konekî bi tenê bû li nivê wan kona..

her pênca da dora hev çûne bin kon dîtin va zilamekî nav ser li bin kon rûni tiye da xwe dîber wan de rabû ew rûnandin ti tē ku Xwedê kirî nesîb ji wan re pê kê kir..

pi tî demekî wî mirovî ji wan pîrsî xêre hûn herpênc bihev re hatine?

Birayê mazin got: em sê birayê hevî û ev herdûkê



dî me birêde dîtine yekî deviha xwe xistiye sitûye me de û yê dî pîreka xwe dixwe sitûye mede û em b ixwe ji wan bêrîne?!..
wî mirovê irf bir got: deka pê î xwediyê devihê û pîreke bila çîroka xwe bêjin dîvre hûn hersê bira çîroka xwe bêjin?..
kiyê dest pêkê?.

Birayê mazin got: bila xwediyê devihê despêkê?..
Xwediyê devihê got: ez li deviha xwe digeram min ev hersê bira dîtin û min ji wan pirsî ma we devihê nedîtiye?..

Birayê mazin gote: min ma devihate ne hêçbûye min got: belê deviha min hêçbûye!?

Birastî jî ew hêçbûye birayê dî gote: min ma barê wê rexek ne dimse û bi rastî jî rexek ji barê wê dimse!?!.

biraye dî got: ma deviha te ne bi çavekiye min jêre got: belê bi çavekiye!?!..
ê min ji wan re got: ka deviha min hersê ka gotin: me deviha te nedîtiye!?!.
Yê irf bir gote: hersê bira we çawe zanî deviha wî hêçbûye û bi çavekiye û rexek ji barê wê dimsê!?!..

Birayê mazin got: min ji ma awê zanî ku ev devih hêçbûye!?!..

Birayê nîvê got: min ji rexê rê naskir ku ew kore ji ber wê giya ji rexe kê rê tenê xwarbû?!.

Birayê piçû got: min ji mê ê ku didanîn rexekî ji rê û ne diçûn rexêdî lê me deviha wî ne dîtiye!?!.

Yê irf bir gote: xwediyê devihê here ti tekî te licem va hersê bira nîne.

yê irf bakire yê ku li jînikê digera ka tu ya xwe bêje?.

wî mirovî got: ezbenî ez li pîreka xwe digeram min ev çar mirov dîtin min ji xwere got: ka ezê ji va miroa bipirsim min ji wan pirsî?

birayê mezin gote: min ma ew pîrek ne xeydiye?.

min got: belê ew xeydiye.

Birayê nîvê gote: min ma pîrek nebihimleye?

min gotiye: belê.. birayê piçûk gote: min ma guhê kirasê wê ne qetaye?
min got: belê pi tî va gotina hersê ka ji min re gote: me ev pîrek nedîtiye!?!
ê ezê çawe ji wan bawerkim ku wa ev pîrek nedîtiye?..Yê irf bir gote: hersê bira ka hûn ya xwe bêjin?

Birayê mezin got: ji me a wê xwiya bû ku ew xeyîdiye ji ber wê gelek li pey xwe dinêrî ji ber vê yekê min gotiyê ew xeyîdiye?!..

Birayê nîvê got: pehniya wê bihtir ji serê lingê wê çûbû nav axêde, min jêre got: ma ew ne bihimleye!?!..

Birayê piçûk got: min ji kirasê wê zanî ji ber ku kirasê wê di erdêre xiriqîbû û xwiya dikir ku guhê kirasê wê qetaye, min jêre got: lê me pîrek nedîtiye!?

yê irfê gote: mêrê jînkê ti tekeî te li cem va nîne û tu dikarê herê li pîreka xwe bi gerê ew her dû mirov birêya xwe çûn..

Man hersê bira li cem yê irf yê irfê gote: birayê mezin ka hûn ya xwe bêjin?.
Birayê mezin got: bavê me gelek maldarbû û em hersê kur bi tenê hebûn bavê me kete ber mirinê bakire me em hersê çûn li cem wî rûni tin bavê me ji mere got: yek ji we hersê bira ji malê bê pi ke?!.. em nizanin kî jan ji meye yê bê pi k?.

yê irf bir got: eve çîroka we?..Hersê bira got: belê eve çîroka me?

Yê irf bir gote: birayê mezin tu bimîne li vir û bilar herdûkê dî herin konê dî ji ber ku divê ez çîrokê xwe yeka yeka ji were bêjim?.. Herdû bira dane xwe çûne konê dî!?!..
Birayê mezin tenê ma li cem yê irf bir. Yê irf gote: birayê mezin deka gûhê xwe bi demin? Birayê mezin li pê berî wî rûni t û guhek kire bêjîng û yek kire serad? Yê irf got: ya kurê qenc evekî ji evê zivistanê ez tenê dibin vî konê de rûni tî me pi tî nîvê evê min dî ronîyek ji nîvê kona berê xwe da konê min û hat..ezjî ma me gudar ka ev çî ronîye bi ser min de tê bêgoma tirsêjî xwe berda ser dilê min û min jî da xwe ez rabûn di bin konê xwe de mame ipiya min nema diwêrbû ez rûnim vê evê û ev ronî ji nava kona berê xwe daye min.. Ez mame guhdar ta ku ew ronî giha ber kon û der basî kon bû mindî va keçikeke weka gulekiye...?!
min jê pirsî xêre keça qenc? keçikê gote: min ez hatime cem te da ez û te ji xwe re abibin!?!..min gote: keçikê vegere wek tu nehatî tucarî ez ti tê wisa nakim û min berda keçikê sê eva ew keçik hatiye û min her sê eva ew keçik ji binê konê xwe vegeandiye eva çara ew keçik nema hat?

Birayê mezin got: îrê te helale yê irf bir gote: birayê mezin here bila birayê nîvê werê?

Birayê nîvê hat yê irf bir ew çîrok ji wîre jî got: wî jî gotiyê: îrê te helale..yê irf bir gote: wî jî here bila biraye piçûk werê?
Birayê piçûk hat li cem wî rûni t û ew çîrok ji wîre jî got: wek ku ji herdû birayê wîre gotî birayê piçûk got: heger ku ez bam min wê nîv evê ew keçik bernedida?! yê irf bir jêre got: birako tuwî yê ji malê bê pi k deraba bake herdû birayê xwe?

Birayê piçûk bakire herdû birayên xwe û hersê li cem yê irf bir rûni tin û yê arif ji wan re got: yê ji malê bê pi k birayê piçûke.....

Eskerê BOYÎK



Dilê dayîkê

Dayka Nenê pîrka hevalê min bû. Pîrê edî ji êmîka hey tê salyê derbas bûbû. Ancax rê diçû. Kîjan cara biçûma mala wan, pîrê li ser kulêv rûni tî bû, kincê kurmanciye delal e paqij lê bûn, tizbî dik and û xwe bi xwera diaxivî. Gi ka zanibû ku pîrê xeberdanzîze, guh nedidanê.

Rojekê dîsa ez çûbûme mala wan.Xênji pîrê kes malda nî bû.Min silav dayê û kêlekê rûni tim.

-Lawo,-pîrê ji min pirsî,-dayka te heye.

Min go: „Erê“.

-Usane milyaketê xêrê hê pi tovanê teye, parîyê xwe para teye. Heta dayka te heye, çiqas jî mezin bî tuyê wek zaroka îrin û hizkirî bî. Qatî dayka xwe be, lawo! Ji pey undakirina dayîkê ra,pa ê tê îrnaya dayîkê bizanbî.

Pîrê demekî xwe ker kir, hebê tizbîyê di nav tilyê xweda bir-anî, li ber xweda kire pinte-pint: “Lê birayê min!... Eh,- kesereke kûr rahî t,- dînyalikiye... ”

-Mirov du cara dibe zarok. Carekê dema ji dayka xwe dixuliqe, carekê jî çaxê weke min mezine, ji dest-piya ketiye.

Biçûktayî mîna biharêye, xwe e, hewasa gi ka jêra tê, tev jê hiz dîkin, çavê gi ka lêye, guhê teva ser e, jêra xeber didin, jêra dilîzin, direqisin, radimûsin. Hidûrbe, bêhidûrbe di nava hizkirina cweda xweyî dîkin. Lê zarokê mîna me kes guh nadê, dibêjin emrê xwe kirîye, „Bi pêbe, gorê be“- Usane mirin wanra xêre,-pîrê demekê kete li nav mitala,- di vî werîda dayîk e, birê pîrê, dayîk e ya here sereke.Dayka zaroka biçûk heye, dayka zarokê kal-pîr tune...

De tu bide aqilê xwe: neh meha dê çî telî-tengasiyê dik îne, ê , megîrani, tirs, xof, saw... Neh meh dike dusud heftê roj. Dusud heftê roj ne hindike, kurê min. Û di nava wan dusud heftê roja da dusud heftê cara diçe, digihîje êmîka mirinê-vedigere. Bi xûna xwe, bi ê a xwe, bi huba xwe zarokê dixuliqîne, dinyayê dixwe, jîyanê didê...

Îcar li ber pêçekê dibe pepûk, rûdinê, ji bê îkê dûr nakeve. Sibê heta êvarê zarokê li ser milê xwe, hemêza xweda xweyî dike, evê heta sibê ranazê û newaste. Hizkirina cegerê dayîkê dike dengbêj-a iq, lûrî dibêje, distirê, dinivêje, due'a dike û ji zarokê tîr nabe.Tek zar bikene, ni kêva serma neke, ni kêva nexwe nekeve. Û wî ruhberê bê zar-ziman, bê dest-pê, bêçar-bêherket hêdî-hêdî givrik dike. Ruh û xûna xwe, hewas û hunura

xwe, hereket û xwestina xwe, sehet û qewata xwe çeng bi çeng, kulî-kulî didê. Didê û zarok mezin dibe, didê û çalepîya dixwe, piya dixwe, fehmê wî tê cî, ziman vedibe...Tu mêzeke dayîkêra bextewarîke çiqas mezine, kubarî û kêfxwesîke çawane wextê zaroka wê e q dikene, xebera pê in dibêje, gava ewlin davêje, dilîze, nesiya dike, destê wê digre û tev dilive.

Ewled mezin dibe, dilê wî tije evîn û hizkirin dibe û rojekê jî edî hundurda cî nabe, wek lêya biharê li ser her ti tîra davêje, dide der-hiz dike... Hiz dike lê ne wê evdê, kê ruhê xwe dayê, xûna xwe, sehet-qewata xwe dayê... Yeke lape xerîb hiz dike û tev wê xerîbê difire, ji dê dûr dikeve.

Ew dûr difire, lê dilê dê wek milyaketê xêrê bi wîrane, jê dûr nakeve, dikewgire, ji bo wî ditirse, dihele. Tek ji qeziya dûr be, tek rêya wî rast be, tek sehet û qewat be, çî tî serê wî, bira bê serê dayka reben...

Çavê dayîkê li rêya wî, dilê dayîkê bal wî usa hêdî-hêdî dê pîr dibe, por qerqa dibe, ronaya çava kêma dibe, dest dilerizin, qidûm namîne.

Huba cegerê mîna kaniya gure û ji wê kaniya gur gav-sehet hizkirin dik e, heta dayîk dimiçiqe, heta xûn tîda namîne...

Dayka me, zarokên kal-pîr tune, ku me xweyîke, dilê wê li ser me bê e, ku ji nexwe iya, ji ahiltiyê dûrxe, huba xwe bike gîncî û pê me gînce, ji vê „zaroktiya“ melûl derxe, firaxe...

Serda hê dlê me dilê dê ye, dilê dê pa la medane, em hê huba xwe didine zaroka. Ji bo dê bextewarîke mezine, dema meytê dê li ser milê ewledane.

Wextê evd dimire dîsa dê lê dibe xweyî. Ne ewled, ne bira, ne pismam, ne jî heval nikarin cinyaz hema heftêkî mala xweda xweyîkin. Xwelî dêye birê min, dayka mezin, dayka gi ka. Xwelî pa ila xwe vedike û ewledê xwe, eyb-arhe wanva di pa la xweda vedi êre.

Lê birayê min, ku dayka me zarokên kal û pîr jî hebûya, nedihî t em bimirin. We mirin alkira û gînciya nû ji mera banîya.

Xweliye dayka me, ew jî me berbi pa ila xwe dik îne.

Hevalê min hatibû, bi çava-deva ez didam zanîne, ku rabim, derenge, dema çûyîna meye. Pîrê nerehetiya nebî texmîn kir kenîya:

-Dinya usane lawo, pê iyada dibêjin:”Çavê dê-bava ewleda, çavê ewleda derva”. Herin, bira due'a-dirozgê dayîka pi tovanê webin!



Jînegarî û Helbestên

Zanyarê Kurd **PÎREMÊRD**

Navê Pîremêrd yê rasteqînî, Tewfîq bûye. Tewfîq Kurê Mehmûd Axayê kurê Hemze Axa bû. Ev zat li bajarê Silêmaniyeyê di sala 1867'an de ji dayik bûye û çavên xwe li cihana ronahî vekirîye. Ji aliyê malbata wî ve navê Tewfîq lê hatiye kirin. Pi tî salan ji bo edakirina ferza Xweda çûye hecê. Ji ber vê yekê navê wî bûye "Hacî Tewfîq".

Heçî navê "Pîremêr" û "Pîremêrd" nasnavê wî camêrî ye. Ev nasnav di jiyana wî de wisa cihê xwe girtiye ku bûye wekî navê hêmanî û her kes bi vî nasnavî wî camêrî dinase. Heya bi xwe jî, xwe bi heman nasnavî dide nasîn. Di giraniya antolojîyên wejeya kurdî de dîrokên wêjeya kurdî û pirtûkên din de jî bi vî nasnavî hatiye nivîsandin.

Zarokî û gihi tîna wî

Pîremêrd, zarokatiya xwe di bajarê Silêmaniyeyê de derbas dîke. Çanda xwe ya zarokatî ji malbata xwe û zarokên Silêmaniyeyê digire. Di temenê 6-7 saliya xwe de dest bi xwendina Qurana pîroz dîke û di demeke kin de diqedîne. Dû re derbazî medreseyên Kurdistanê dibe û dest bi jiyana medreseyê û xwendina wê dîke. Him pirtûkên erebî û him jî pirtûkên farisî dixwîne. Her du zimanan jî hîn dibe. Ji bo qencîrîn hînbûna van her du zimanan, diçe cem Mele Mehemedê pê rewê mizgefta Hemze Axa. Li wir domekeke dirêj radiweste û dixwîne. Him xwendina medreseyê diqedîne û him jî zimanê erebî û farisî qenc hîn dibe. Di ber xwendina xwe re gelek helbestên hozanên kurd, ereb û faris jî di ber çavan re derbas dîke û gelek rind hînî wêjeya wan jî dibe. Hindik jî be bi zimanê erebî û farisî jî helbest nivîsandine.

Pîremêrd, di dema feqîtiya xwe de, li gelek bajar û medreseyên Kurdistanê geriyaye. Kesên curbicur dîtine. Ji wan gelek ramanên cihanê hîn bûye û ji seydayên têvel sey standiye. Ev stêrka li asîmanê wêjeya kurdî, dema dest bi xwendina medreseyê kirîye, di medrese û dîwanan de helbest jî dixwendin. Pê î helbestên helbestkarên kurd yê bi nav û bang ên wekê Hacî Qadirê Koyî, Nalî, Mehwi, êx Reza Talebanî û Mewlewî dixwendin. Dû re hêdî hêdî bi aliyê sazandina helbestên kurdî ve diherike û di dema feqîtiya xwe de bi zaravayê soranî gelek helbest sazandine û nivîsandine. Dema di medrese û dîwanan de bi dengê xwe yê zelal helbestên xwe dixwendin, zewqekî guhertî dida guhdaran. Di ciwaniya xwe de nav û dengê wî belavî Kurdistanê dibe û di giraniya deverên Kurdistanê de tê nasîn.

Pîremêrd, di navbera salên 1882 û 1898'an de karmendiya hukumetê dîke. Di sala 1882'an de li bajarê Silêmaniyê dibe katibê nifûsê û di sala 1886'an de dibe katibê sereke (ba katibê) mehkemê. Di sala 1895'an de li bajarê Kerbeleyê dibe cîgirê dadgerê pirsyarî. Di sala 1898'an de digel êx Seîdê bavê êx Mehmed diçe Tirkîyeyê û ji wir jî bi hev re çûne hecê. Pi tî edakirina ferza Xwedê car din difetile bajarê Silêmaniyê. Di sala 1891'ê de digel êx Ehmedê Xaniqînê û helbestkar Wefayî diçine Tirkîyeyê. Li bajarê Stebolê rûdine. Pi tî domekekê karbidestên Meclîsa Osmanî pê dihesin ku Pîremêrd gelek rind bi zimanê farisî dizane. Wî dikin endamê meclîsa alî û ritba begîtiyê didinê. Domekekê vî karî pêk tîne û dû re diçe zankoya Stenbolê. Di peymangeha huquqê de qeyda xwe çêdike û dest diavêje xwendina bilind. Bi rew eke serketî peymangeha xwe dixwîne û diqedîne. Pi tî domekekê radiweste û dest bi sitaja parêzeriyê dîke û dibe parêzerek qenc. Li bajarê Stenbolê nivîsxaneyekê vedike û parêzeriyê bi rew eke tîkûz dime îne. Di navberê re bi keçikek tirk re dizewice û dibe xwedî malavayî.

Komela Alîkarî û Pê ketina Kurd

Di sala 1908'an de ji aliyê rew enbîrên kurd ve di binê serekiya Seyid Evdilqadir de cemiyeteke bi navê "Kürd Teavün ve Terakki Cemiyeti" (Komeleya Alîkarî û Pê ketina Kurd) li bajarê Stenbolê damezirandin û ji aliyê heman cemiyetê ve bi navê "Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi" (Rojnameya Alîkar û Pê ketina Kurd) rojnameyek jî we andin. Pîremêrd bi navê xwe yê hêmanî "Tewfîqê Silêmanî" di nav de cih girt û bû xwedî berpirsaryarê we ana rojnameyê. Di heman demê de helbestên xwe jî di rojnameyê de diwe andin. Di helbesta ku di rojnameya pê î de hatiye we andin de wiha digot:

“Emro, ke rojî cejnî hemuman e ser be ser
Kurdî legel gelan le çilexane hatine der
Sî sal bû roj û rojê be salê le ber diçû
Rojûy heram bû xêrî le ber er debû be er
Merbû û tabîî Mem û Zîn bûn, le rêge da
Gurg û çeqel le çeqelî Bekirî Mergewer beter



Mîller ne deng û rengî xelîfeyî debî û debîst
Mezlûm ne hedî bû be îkat degî bête derw

Alem ke bûbû we xizmî xezûrê sepanî êx
Kurd destî girt bo nobeyê nobeyî nekwete ber

Herçî ke bîtwaye emin kirdim ew deme

Rêgî Terablusî be pêxwas degirte ber

Te'nyan deda le Kurd ke / eq'n, naben walî

Ta eq bû qebrî kurd û eqe eqî hate der.”

Pîremêrd, di sala 1909'an de dibe qaymeqamê Colemergê û di sala 1918'an dibe muteserîfê Amasiyayê. Pa î ew jina xwe û du kurên xwe dihêle li Tirkîyê û vedigere diçe Silêmaniyeyê. Wî çaxî li bajarê Silêmaniyê rojnameya "Jîn" di bin serekiya Huseyn Nazim de derdiket. Huseyn Nazim, serpiri tiya wê rojnameyê dispêre Pîremêrd. Di sala 1934'an de Huseyn Nazim diçe rehmetê û Pîremêrd dibe rêveberê rojnameya "Jîn"

û di heman salê de, çapxaneyekê kirê dîke. Rojnameyê li wir diçapîne. Dû re navbera Pîremêrd û xwediyê çapxaneyê xerab dibe û bi pêwîstî çapxaneke din kirê dîke. Heya sala koçdawiya xwe (sala 1950) we andina rojnameya "Jîn" didomîne. Vê rojnameyê gelek karên qenc ji Kurdan re pêk aniye. Mehmed Rusûl Hewar, di pirtûka xwe de gelek li ser "Pîremêrdê nemir" sekiniye û pesnê vî zatî dide. Mehmed Resûl Hewar wê pirtûka hêja di sala 1970'yî de li bajarê Bexdayê diwe îne. Hûr û gir der barê jiyana Pîremêrd radixe ber çavan. Mehmed Resûl Hewar, Pîremêrd tenê we anker, helbestvan û nivîskar nabîne. Di tanga Tolstoy, Victor Hugo de dibîne û pê kê î xwendevanan dîke. Di heman demê de Pîremêrd bi helbest û nivîsên xwe kurd û Kurdistan vejandiye. Bi van peywendîyan pê ve diçe û wiha dinivîse:

Pîremêrd, der barê evîn û evîndarî, hezkirin û siru tiya xwezayê de, der barê neteweyên bindest, nemaze neteweya kurd û Kurdistanê, rizgariya gelên bindest nemaze gelê kurd û yê wekî wan gelek berhem û helbest nivîsandine û pe kê î gelên cihanê kirîye. Pîremêrd, wekî giraniya helbestkar û wêjekarên kurd, ji normalê zêdetir di helbestên xwe de daba a spehîtiya xwezayê dîke. Her wekî li ser vê spehîtiyê bengî bûye dida nî an. Emê li vir helbesteke Pîremêrd a li ser Newrozê binivîsînî ku wiha dibêje:

“Eva roja sala taze ye, Newroz hatiye
Cejna kevnê kurd e bi xwe î hatiye

Çend sal e gula hîvya mebest bû heta par
Her xûna lawan bû gula ava nû bihar

Wî rengî sore bû ke asoyê bilindî kurd
Mizgîna beyanê bo gele dûr û nêzîk bîr

Newroz bû agrekî weha xiste nav cergewe
Lawan bi e q diçûn pê ber pir mergewe

Wa roj hîlat ji bedena berza welatewe

Xûna ehîd e, rengê efeq ewq vedatewe

Heta niha li tarîxa millet da rû nede

Qelxana gulê sîngê keçikan be hîlne

Bo ehîdê weten naxwaze îwen û girîn

Ew namirin, wa li dilê miletan de dijîn.”

Pîremêrd, li ser werzan jî helbest li dar xistine. Çawan tê zanîn ku werz jî, parçeyek ji xwezayê ne. Ji xwe xweza bi werzan tê holê. Helbestvanê me werza havînê bi vê rew a jêrîn hildide destê xwe û wiha dibêje:

“Hewa havînê, hewa havînê

Îsal havîna me zor bi kîn e

Girê agirê sebûn sî tîn e

Bergê esman bo me îne

Feslê gulge tê Baxê Penawîn e

Ev sebûna me ji ku ve hat?

Bi tîna germê hilqirça welat
Stêra te'lê xwe guherî nehat

Bi ne îveya emal ki û mat

Dil vê germê qîz xemgîn e

Girê Yarê ciyê rojtavê



Rêya seyranê Newroz biriye
 Karêza erîf av tê de maye
 Erxewan çiqpopê wê ikaye
 Girê Seyran ciyê zar û îna e
 De Xwedê ye, hilkeve qîzîna emalê
 Hewa zenga xemê min ji dil bimalê
 Ay bo dengxwe ek digel im alê
 Bi wê xwestinê têr bûm binalê
 Dêrdê min karî ye û cerga min birîne.”

Pîremêrd, bandora rojê û tavê li ser riwekan û pê veçûna xwezayê hildide destên xwe. Dihêjîne û pê kê î geln cîhanê dike. Mêhvanê me vê mijarê bi peywendiya kesan û dilberan îrove dike û bi pî ekarane, bi vê helwesta jêrîn radigehîne me û wiha dibêje:

“Wa beyanê gizînga tavê derket
 Nema evem bi tîrêja rojê ser ket
 Xunçe gul xwe xuyan kir li dara
 Bibalê jî ewra xwe kir nav gulzara
 Lale tara ye, li ber berê çiyar
 Hênika can e bayê leylexan
 Dema êvarê sîbera baxan
 Xwe e bo yarê bayê ser eher
 Ev tîrana gul û milê can e
 Bê te cem min jîna zindan e
 Cejn û aya min hergav girîn e
 Ez û bilbil cote zar û hejar
 Hîni hesra me gulala dewrim
 Wa jî daxa te bê wefa bimirim
 Çaverêya min ke, wa têm ser qebrê
 Bi hêwa te zindî bibim du carê.”

Pîremêrd, werza biharê hildide destên xwe bi barana meha avrêlê dinimîne. Bi rew a helbestên xwe daba ji barîna barana avrêlê dike. Bi wê baranê gul û gulzar çawan diriwekin. Kelijandina dilê bengiyan, bi gewherê nî an dide û bi rew eke zanistî vê yekê hildide ber çavan û helbesta xwe bi vî awayê jêrîn pê kê î me dike:

“Barana nîsanê bû mirwarî
 Bi rehmê li ser me de barî
 Zanistî bi wê hinegê kê m bû
 Mîna gewher di nav sef de winda bû
 Xwedî erfana ji neslê xwe
 Zanistî li gêjgêjî kir xelas
 Zanitî û zanistî Xwedê bi min bînin
 Belkî bêkesan bi ev bixwînin
 Xwendin evê dike bi roj
 Perdetarîkê dike bi la .”

Pîremêrd, di felsefeya xwe de, ew mafê ji law û mêran re hatiye nasîn, divê haman maf ji keç û jinan re jî bê nasîn. Da ku em bi aliyê cîhaneke wekhevî ve biherikîn û ji wan kevneperestiyên gemar rizgar bibin. Mêhvanê me pê î gazî keçan dike ku wekî lawan ew jî di dibistanan de bixwînin û ji wê perda re bifilitin da ku bi karibin mafên xwe bistînin û biparêzin. Ji bo gihî tina vê yekê bi vî rew a jêrîn bang li keçan dike û wiha dibêje:

“Ey keçikno werin mektebê
 Hûn teskîne dilê me ne
 Zînetax bax û ba û terîqê ne
 Rewneqa destê gul im
 Teze em tê gehî tin
 Dayika qenc xwendewar
 Mesela we tene meydan
 Qewmekê pê bêye kar
 Jin irîka jîna mê e
 Nek tenê xerêqa bar û dar e

Nek tenê xerêqa bar û dar e
 Terbiyeta mêjik û mindal e
 Bo weten bêwijdan helal e.”

Pîremêrd, ji temenê biçûkatîya xwe heya dawiyê, ji gelê xwe re xizmeteke gelek qenc pêk aniye. Di sala 1950'yî de li bajarê Silêmaniyê di temenê 83'yan de koç dawî kir û li goristana heman bajarî radestî gora pîroz kirin. Dixwazin vî zatê gorbihu t her dem bi bîra xwe bînin. Siyanet, rûmet û rêz ji gorbihu t re.

Jêder: wikipedia.org

Alan pîr mem



Xumara kal

*Ji şerbeta lêvan ..ez sermest û mecnûn
 fîrarim ji dinê..... bê cî û war û şûn*

mame bi tenê ji vêdilbirîn û mest
 bo te dihûnim çi hebin renga helbest

nazdar û şepal.....por ji sira bayê şemal
 derd û kovan û kulên te...ez kirme dilkal

dêm û ronak.....ji hev cuda nabin bi carek
 ronahî ji dest ..zendên tey pîroz û mubarek

xemxwarê teme....lewra bûme evîndar
 تنها ez ji xwe mame..... û bi te diljar

şerer ji dil....pirûsk û pêt û ar ji nav
 yaseya evîna teez hiştim bê gav

cizîrî û cegerxwîn bûm.... bi evîne
 dame dest rehmanê extebî şêrîne

berê min yezdan ...serkeftin be serfiraz
 ey xwedayê mezinnalîne ji dil saz

jîne ..jiyan dema li hev dibin mêvan
 ez..te û xurista xwayê ..qad û doran

girtî û bê warimlewra bûme evdal
 sermest û sergiranîm ..ey xumara kal

BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ



EM KÎNE?

Em kîne?
Em kurdin,
Mêrxasê deman,
Rêberê gelan,
Em tîn ji qurnan
Ji qadê giran.
Em kîne?
Em kurdin,
Xêrxwez û merdin,
Hertim bi derdin,
Şerê giranda,
Em avangardin.
Em kîne?
Em kurdin,
Mane bê rêber,
Bûne penober,
Revok û koçber,
Welat me da der.
Em kîne?
Em kurdin.
Nîvî cerdevan,
Nîvî qehreman,
Dijî hev meşîyan,
Bûn dîlê deman.
Man bê niştiman.
Em kîne?
Em kurdin.
Aştî xwezin,
Mirov perezin,
Dunyake aza ,
Em dixwazin.
Em kîne?
Em kurdin.
Dîsa rabûne,
Dawî şabûne
Dijî mafxura,
Bi dil yekbûne.
Em kîne?

Em kîne?
Em kurdin.
Em têdigoşin,
Em jî xîroşin,
Ji bo wekhevîyê,
Qada bi coşin.
Em kîne?
Em kurdin
Ji bo jîyanê,
Em têdikoşin,
Vê oxrêda jî ,
Em hertim noşin.
Em kîne?
Em kurdin.
Xwedan şerefin,
Tim bê terefin,
Dunya durîda
Bê rêz,bê refin.
Em kîne?
Em kurdin.
Pêş cavê barbar,
Hertim em reşin,
Ji bo azayê,
Heya dawîyê,
Emê BIMEŞIN...
Ji bo jîyanê,
Emê bimeşin,
Dijî mafxura,
Kujer,serxura,
Kurd radiwestin.....
Ji bo edalrtê,
Em têdikoşin.
Bona mafê xwe,
Qada dimeşin,
Hertim jî xasin
Bi yekbûn xurtin,
Lewra em kurdin.....

Boniye Cegerxwin



Dergevanê te ezim

Wer civîna min hevalê
kêşeya li pişt xwe bihêl
Hibriyê ser xwe hilîne
şehke wan biskên bi têt
Carekê tu ji min re Zîn be
Her bila Mem yê te bim
Dest û lêvên t' binoşînim
Nazik a şêl û şepêl
Ey şêrîne, nazelîne
zûke , e l' bende te me
Da bihevre geş bibin em
vî dilê şeyda ne hêl
dîtina çavên xemorî
karxezalê , ew bese
Ta sipîde mey vexûm ez
Herdû lêvên ter bi şêl

Wer civîna min şêrîne
dergevanê te ezim
Bo te dildar her dimînîm,
ey perîzad a bi xêl
Wer civîna min hevalê
kêşeya li pişt xwe bihêl
Hibriyê ser xwe hilîne
şehke wan biskên bi têt
Carekê tu ji min re Zîn be
Her bila Mem yê te bim
Dest û lêvên t' binoşînim
Nazik a şêl û şepêl
Ey şêrîne, nazelîne
zûke , e l' bende te me
Da bihevre geş bibin em
vî dilê şeyda ne hêl
dîtina çavên xemorî
karxezalê , ew bese
Ta sipîde mey vexûm ez
Herdû lêvên ter bi şêl
Wer civîna min şêrîne
dergevanê te ezim
Bo te dildar her dimînîm,
ey perîzad a bi xêl

F Yakoub



Demhêjmara kevin

Ev se,ate rêva naçe ?
Oh kurê min
Ew gelekî kev ne
Ya heyamê rehmetiye !
He ! dem jî pîr bûye!!!
Êvarek ji werzê peyîzê
Ewrik tenik ba li ber xwe dibe
Ber û çemê Dicle ve diçe
Raserî çiyayê Cûdî tarî dibe
Ji dehlê tê bêhna baranê
Tê xuşexuşa pelên li ber
Bayê
Dixwî ev êvare jî kev ne
Dem nehat !

Ba zîvirî ji rexê dîva hat
Sar û vîze vîz jê dihat
Ewir wengeriyan ser çem da
Keçek evîndar
Li bin baranê
Ewê ji tirsaxwe da ber
darê
Baran ser geziya da hat
Ser hêviya da hat
Ser lêva da hat
Dilopên baranê ser pelên
Hişk da dibarîn
Ba ser dû evîndara da dihat
Bêhna wan digihand hev
Bêrîkirina kevin diherikî
Li ser tehtê
Li ser pencerek nîv vekirî
Dinav bayê da
Rûkê şevê dişûşt ji xewnan
Jinek diçilvî ji kerba evîne
Jê dibariya bêhna gul û
nêrgizan

di pencera nîv vekirî da
Birçî bûnek kevin
Dû şûşên nîv vala
Hê têhin û tî mane
Pirek nîv hêrifî li ser rê
Li dora wê tarî
Bawîşkên xewê
Bi şevê ra dihatin
Di nav dengê dara da
Bi bayê sibehê re
Di bin xunavê da
Her tişt terr bibû
Dû fincan ser re kefa şevê
Ziwa bibûn
Terafên kevin
Hê li ber kuçka agir
Textê vala
Dû evîndarên dûrî hev
Li dora wan pelên peyîzê
Ji şevên bê xew
Ji dem jimara kevin
Dem nehat



Ehmed Mustefa

roj.ava2011@gmail.com



Ji bo dayîka min

Gotin ew xeyal e
Min gote wan ew dil û can e
Gotin ew xewin e
Min got wan ew çav e
Gotin ew ba ye
Min gote wan ew Cîhan e
Gotin ew Kî bû..
Min gote wan ew perçek ji dil e
Gîyan bû Cegere min bû û herdu çav bûn
Ew bê hêş man û lal bûn
Gotin Kî bû....
Min gote wan ew bihuşta rengîn bû
Gotin Kî yî....
Min gote wan ew mîna welat bû
Ew dayîk bû
Û Li Cîhanê ew bihuşt bû....
.....
Yekem nav min got . Ew navê te bû
Yekem maç min maç Kir Ji rûyê te bû
Yekem hambêz min hambêz kir hambêza te bû
Yekem çav min dît ew çavên te bûn
Yekem dil min dît ew dilê te bû
Yekem jin li dinyayê min dît ew dayîkê bû.
dayîka min bû
Belê dayîk bû
çavên wê bûn
Destên wê bûn
Rûyê wê bûn
Dilê wê bû
Hambêza wê bû
Maça wê bû
Ew Bû û êstêra Şeva min bû

JI DÛR HATIM E

Dûr hatime te bibînim
Ev çand salên dûrî te me
Dûr hatime ji dûr hatime
dûr hatime Te bibînim

Xazîya rojên berê me hev bidîya
Ew rojên çûn ji umr neçû ne
Rojên berê bînin bîra xwe
Rojên evîne bînin bîra xwe
Dûr hatime ji dûr hatime
dûr hatime Te bibînim

Dixwazim te hambêz bikim
Evîna xwe jê tere bêjim
Ey dilê min ey delala dila
Dixwazim te Dixwazim te
Dixwazim te hambêz bikim

Celal Muhemed Emîn(Hozanê Dilzar)



EZ ... EW ... IM

Ez li ber bayê sura banga evîna te
keçê
danê helbestan didêrim
ez li ber aş sed qeraşim
peyvê restan ez
dihêrim
ez çemê aş digerînim
ez siruştim
ez keval im
ez û te ka li kê dinêrim?
ez ewim yê ku şeva xwe tevdide
belkî vebe rengê Şevê
keziyên te çêke
gul dehen
şebnem devê
hingê bisk karin bibêjin
pêl û mijgûlên şevê
çavên xwe berdane revê

Lêvên te

Du lêvên te êtûnin
nanê xwe li ser dipêjim
du keziyên te pênuşin
avnûsê ji wan dirêjim
hêsirdanke sînga te
tevnê hêsrana dirêsim
li ezmanê dêmên te
wek sitêrkan diêsim
gerdena te mêrgeke
maçên min lê diçêrin
asikiye kenê te
dilê xwe jêr didêrim

Dûrî te me ez perîşan im
bê hedanim Xewnên şevan
Dûr hatime ji dûr hatima
dûr hatime Te bibînim

Dûrî te me dil dinalê
Nafîna dil bê dermanê
Dermanê dil evîn e
Evîna min ji min dûr e
Ey hevala min
Ey helvala jîna min
Dûr hatime ji dûr hatima
dûr hatime Te bibînim

Rêvengî

rêvengiya
çemê jîna min neguhere
bela ev dil
mîna berê
kole nebe
nebe bi xwe re
şermîna min
hêviya ku
min veşartî
di gorê de
venejişne
şêrîna min
pelika ku ma
ji gula min
biweşîne
dara kulilka hişkirî
bihejişne
avahiya manda derew
hilweşîne
şermîna min
koçkirina çavên
ji dûr ku hatine
berî çûnê diyar dibin
berî ku ji kaniya
tenahiyê janê vexwim
ew herdu çav wenda dibin
şêrîna min
bi çû na te ewê tehlî
pirtir nebe
tehlî berê mêvaneke
wê tim hebe
xwe neke sedem
hoyek mezin
ku carê dil wer şanebe
aza nebe
azakirin û şakirin
bawer neke
ewê bi destê yeke
wek te be



Dr.ferdinand hennerbichler

Mêjedema Gelê Kurd

Ji „Ewên ku ji bo azadiyê dimirin“ Çapxaneyê Dewleta Ostriya Wergerandina ji Almanî : CanKurd



ikefta Duderû

Ji kevintirîn bermayên mirovatiyê li Kurdistanê (Rojava)

Pêrist:

Navên gelan, Kûr – Kûrdî, Kûtî.

Tevliheviya bêjeyê û dîroka devokê ji serohata devkî ta bi ya nivisandî

Nermkirin, Koka bêjeyê, Bi cil û bergkirin, Hikariya welatên rojavayî, Berçavkirina pê veçûyî, Pênasa ni t ,ni timan‘ Kevne pênasa ni t, Serohata çavkaniyên olî: Welatê kurdo, Serohata wêjevaniya bêolî (laîkî): G (K)urdo.

Jêhatin (Mak), Ziman, Nivîs, Ol, Sunnî, î, Yêzdî, Fileh, Cih, Civak.



êrê Ein Dara



Kela Horî

Navê Gelan:

Kurd di binyada xwe de bi wateya „Ni tevanên Çiya“ye, li bakurê rojavayê Zagros, pa ê bi wateya „Ni tevanên mîrxas ên Çiyayî“an „ên wêrek“, û „Ni tevanên Cengwar ên Çiyayî“ li Zagros di Rohhilata Navîn de.

Em dikanin bi asanî bibêjin: „Gelên Çiyayî.“ Ne bêtir û ne kêmtir. Van gelên çiyayî kî bûn û ji kî derê hatîne, navê gelê wan ti tekî li ser wan nabêje. **Kurd** bêtir bêjeyek civanoke „komkire“, gelek gel û êl bi wê tên nasîn, ewên ku li bakurê rojavayê –Zagros bi cih û war bûne.

Peyva „**KURD**“ nêzîka 5000 sal kevine û yek ji kevintirîn peyvên dîrokê tê jimartin. Kê ev nav pêda kir, hîn ba bi cih nebûye, lê belê **Somerîyan** (pê bavên çand û wêjevaniya nûjen 3200-2800 berî Isa) û jêmayên **Akadiyan** (2340-2180 berî Isa) ew nav bi ser zimanan xistin, belav kirin.

Herdu gelên pê eng, kevnerekên **Samiyan** li Mêzopotamiya dest pêkirin, gelên ku ji aliyê jor ve dijwarî bi ser wan de dihanîn, li gor berçavkirinên ciyografî, xalên bi cihkirina wan, ji ser hev derxistin: Di navbera balatirîn çiyayê herêmê (**Ararat**) ‘Agrî-wergê’, û çiyayê mezin ê tenha li bakurê Mêzopotamiya, **Hekarî** yê niha, ew navçeya ku têde kevntirîn kanî yê li ba ûrê zireya **Wanê** hene, li rojavayê zireya **Urmîyahê**, û li bakurê **Nînewa** ya Kevin li sererêja **Dicle**.

Berê jî, **Xênofon** ‘Éksînofon’ nûçevanê Girîkî yê sengerê ev herêm bi “Çiya” dabû navkirin. Raste çiyayekî dî wekî wî li **Rohhilata Navîn** nîne. Li bakurê wî hinek sirt hene, bi teketek girên bilind ên li ba ûrê wî jî dikevin de tên daketî yê Mêzopotamiya. Li rojhilat zincîra **Zagros**, sînorê tewr kevin ê di navbera Fars û Ereban de, û pi t re di navbera wan û Turkan de jî, ber bi ba ûrê rojhilat û bi xarê ve. Hema ew çiyayê mezin ê eyê **Zagros**, ne wilo mezin e wekî **Alp** li Ewrûpa an **Tîbêt** ê mezin li Asiyayê, lê belê ew kesê, ku **Hekarî** yê bi zinarên wî yê bi xarê

de daketîne, bi 4000 metrên wî yê ahanî, bi geliyên ku rê bi zehmetî tere diçin, û asîmanê di ser wan re, carekê bibîne, nema wan dîmenan ji bîr dike. Dibe ku li **Hekarî**, ne li derek dî ya **Rohhilata Navîn**, kevirên **Rohhilatê** hatibin danîn, ev dîmenê xwe bi hezaran sal, ta bi dema niha paristîye.

Kurdên **Hekarî**, ku bi xwe di dawiya sedsala bîstan de dijîn, ji hinek aliyên ve, hîn wek mirovên di “**Dema Kevirî**” de dijîn.

Derdorên **Hekarî**, bi peyvêkê ‘Çiya’, lew re bûye nasnavêkî gi tî bo Kurdan û ji bo hevserên ‘cîranên’ wan. Her yekî ji berê ve dizanî mebest bi ‘Çiya’ çî bû. Bo cîhana kevin, wateyek tê de hebû, gava wan rûni tvanên wan navçeyên çiyayî, ku dikevin bakurê Mêzopotamiya, bi gelên ‘Çiya’ navdikin. Bi wê yekê dikarin cihê wan diyar bikin, bên nasîn û nirxandin, û eve dîroka rûni tvanên van çiyân.

Kur-Kurdî:

Li gor dîroka zimên, peyva **Kurd** ji du bêjeyan hatiye: “**Kur**” a **Somerî** û “**Kurdu**” an jî “**Kurdî**” ya **Akkadî**.

Kur Samî ye, û bi cihkirî ye, jêrkî **nivîs** hatiye pêdakirin, berî niha bi 5000 sal, û bi wateya “**Welat**”e, bi gelek terzên wateyên wê: Ji **ni t** ‘ni timan’ de, ‘**Welatê biyanî**’ û ta bi ‘**Welatê neyar**’. **Kur** ji kûraniya kevnareyê de orek ‘peyvek’ bi gelek naverokan bû.

Ji aliyekî ve, ew orek gelemper bû, bêjeyek dengdayî bû, ku berî niha bi 5000 sal her zarokêkî li Mêzopotamiya pêwîst bû binasiya. Ew ji jêderên **Somerî** yê heyî pêda bûye: Ji listeyên ahanî ta bi efsane û çêrok û helbestan. Ji aliyekî dî ve jî, wilo dixuye, ku peyva ‘**Kur**’ ji serî de peyvek pir firehwateyî bû, peyvek mezin a pirwateyî bû, lê ji bo nasdana naverokên ciyografî û gelnasîne ne pir hûmas bû. Di bingehê de agahiyên gi tî yê li ser welêt û mirovan dida, wek ‘**Welatê...**’, ‘**Ni tê...**’, ‘**Welatê biyanî yê...**’, ‘**Welatê neyarê...**’, û herweha...

Hûrikîyên nêzîk bo wateyan, tenê di pevgerêdana wê hevokê de tên nasîn, ewa ku peyv têde ye, ev jî hinek caran neba dixuya. Hema vê koka “**Kur**” bûye egera pêdabûna peyva “**Kurd**”, gelên çiyayî li **Zagros**, **Samiyan** ji hezarsala 3yê de, ev bêjeya ji bo hinek navçeyên taybet ên çiyayî yê **Zagros** û dani tvanên wan bi kar anîne, xwestine ku wan gelên di maka ‘jêdera’ xwe de cihêcîhê ne, li bakurê rojavayê **Zagros**, bi alîkariya acetên zimanî bi nasname bikin, da mirovên wê demê têbigihin û wan binasin. Bi kêmtirîn hema wilo bû. Bi hindiktirîn nasdanên navçeyî, jêderên kevnare bi gotina “**Ni tevanên Çiya**” bêtir wan gelên li ba ûrê **Urarto** ya kevin a li dora gola **Wanê** bi nav dikirin. Li rojavayê **Ekbatana**, **Hemedan** a niho li Iranê, an jî li bakurê **Nînewa**, paytextê bakurîtirîn ê **Samiyan** di Mêzopotamiya ya kevin de. Kê agahiyên navçeyî ji vê bêtir bi dest dikevin. Hinde caran **Incîl** van ‘**Gelên Çiya**’ li ber **Xabûrê** bi cih û war dike, ew çemê di welatê Kurdan de navdare, ku ji **Hekarê** tê, di ber bajêrê Kurdan **Zaxo** yê di Iraqa niho de derbas dibe û dikeve nav **Dicle**. Ba bi cih bûye, ku bêjeya “**Kur**” hîn ji demên **Samiyan** de, wek bêjeyêke navkirinê ji bo welatêkî navendê gelên çiyayî li bakurê-rojavayê **Zagros** li ser zimanan bû – bi gelemperî wateya peyvê wan navçeyên di navbera ba ûrê gola **Wanê**, rojavayê gola **Urmîyê** û bakurê **Nînewa**, tev li **Hekarî** digirt. Lê bi carekê wê peyvê sînorên wekî yê bi wateya nûjen, ji aliyê ciyografî ve nestandibû, lê kê caran ew tenha di nav sêko eyek piçûk de bû, pir caran ji wê bêtir bû, hema hertim mebest ji wê peyvê di nav **Somerîyan** de, ni t û warê Kurdan bû, gelên çiyayî yê li **Zagros**, bi hevgerînek mekin ji hinder ve û ber bi avabûn û hevgerînek wekî neteweyekê ve diçûn, di jîwarekî çiyayî de, ku rê bi zehmetî vêdikevin û herdem ceng û gef û gurr lê dibin.

Kûtî:

Hîn di dema **Asûriyan** de, ew peyva (**Kur**), ku ji hezarsala sêyemîn de hebû, pi tvaniyeke tîrmînolocî ‘**watenavekî zanyarî**’ bi (**Kûtî**) stand. **Kûtî** an **Qûtî** bi wateya “**Ni tevanên...**” Vê peyvê wateya maknavê “**Kur**” xort kir, bi xwe re wateya axên (**Kur**) zelaltir û bi destkeftîr kir, bêtir, berî herti tekî, navên tevanên hinek welatên **Zagros** da nasdanê, û bi wê yekê kevintirîn du peyvên **Cîhana Kevin** di nav hev de hatin pi aftin û ji mirovên demê ji 5000 salan re bêtir hevtegihi tin pêda kir.



Diyar dibe ku peyva duwemîn a maknavî ji bo bêjeya “Kurd”, ji aliyê **Akkadiyan** ve, wan pa serên **Someriyan** anîne holê, **Kurdo** bi tenahî, **Kurdî** bi piranî, van herdu peyv ji dora 2300 sal de berî hezretî **Isa** hatîne bi cîhkirin. Wekî bêjeyên serekî û rew t bi kar hatîne û wateyên wilo didan: **Bi hêz, bi kanîn, wêrek, leheng, cengewar**, weku **hêzdarî, deselatdarî, wêrekî, lehengî, qehremanî û ervanî**... Diyarê van taybetmendiyên peyva **Kurdî**, ji wêrekî ta bi mirovên ervan, di bin zora bûyerên dîrokî de pêda bûne, hema eweyên navên bingehîn ên **Somerî** û **Akkadiyên** pê in (**Kur**) û (**Kûtî**) (**Qûtî**) tenha bo binavkirina ni tevanên welatên biyanî, pircarkî jî bo welatên neyar bi kar dihatin. Wilo dixuye ku van peyv bo binavkirina hemî komikên ne-Mêzopotamî ji wan di hate bi kar anîn. Wekî **Girîkan** “*Yûnanan*” ku “**Barbaroi**” bo hemî gelên ne-Girîkî bi kar dihanîn; ên nas û dost, wilo ên nenas û ên neyar jî. Bi demê re, êdî, ew peyva bêlayî “**Barbaroi**” bo ên ne-Girîkî bû peyvek dijûnî ji “**Barbaran**” re û bi wateyek neba ta dema niho maye. Ne dûrî wê ye peyva “**Kurd**” bi cûrecûre lêvkirina “**K(Q)-u-r-(d) t-î**” ku wateyek standiye û bi cîhkirî ye: Ji **Ni tevanên çiyayî yên wêrek** kirine **Teyrên Sîmir ên çiyân**. Berî her ti tekî, ji dema ku cara yekê bû, di dîrokê de, hevbendiyek van gelên çiyayî xwe wilo bi navkirî bû:

K(Q)ûtî (2200?-2116) berî hezretî **Isa**, li gor nasyariyên kevin (2150-2050) berî hezretî **Isa**. Di vê tîrmînolocîyê ‘*navkirina zanyarî*’ de du berçavkirin hene: Taybetî û serxwebûna xwe di serohatên ‘*adetên*’ zimanî de jî paristin. Ji aliyekî ve, li gor rastiyan dîrokî, hatiye texmînkirin ku gelên çiyayî yên wekî **K(Q)ûtî** – bi gelemperî – çandeyên **Mêzopotamiya** herifandine, avanekirine, ji aliyekî ve jî, ro enbîrê **Mêzopotamiya**, ku nav li hêzên deselatdarê kirine, ewana wekî mirovin pileya duwê dîtine. Pi t re lêkolînerên **Alman** navê van gelên çiyayî bi ên “**Gûtî**” guhartin, bi egera nermkirina peyvê di **Babilî** de, ku (**G**)yek xistin ûna tîpa bêdeng a sert (**K**). Ev **Gev kirin** “*nermkirin*” di rêveçûna dîrokê de bi ser neket. Lew re **Gûtî** ne bêjeyek makdare, hema pê veguhartinek ne temendirêje. Ev guhartina bi “**G**”ya di serî de, ne tenê weku li vê dawiyê, di zimanê **Almanî** “**ae**” û “**e**” ciyên hev birine, lê belê bi piranî tevlihevî jî pêda kirine. Lêkolînerên, ku bi kar anîne, bi xwe jî nekanî bûn wateya wê peyvê ba ji ser hev derxistana û irovebikirana, û ew wekî bêjeyek “**irove nabe**” diyar kirine, lê ev ne bêjeya “**Kurd**”e. Ji ber vê, divê zanyarî vegere ser kevnebêjeya **K(Q)ûtî**, ewa ku bi hezaran sal wekî peyvek bi wateya “**Kurd**” cîhê xwe girtiye. Wateya dîrokî ya bi asanî ni tevanên çiyân bi gelên cengewarên çiyayî diçemberîne, ji xwe bi tundî ji ortê hilatiye. Bi **K(Q)ûtî** re cara pê in bû, ku gelên ji **Kurdistanê** wekî deselatek duwemîna serheremî ya welatê rojhilatî hilki îne welatekî ciyê “deselat a mezin”a çiyân. Hema **K(Q)ûtî** bi carekê ne nimûneyek peyva “**Gelê hov**”e. Ewana ji xwe **jêmayên** ‘*warisên*’ **mezintirîn** pê ketinek çandeyî ya mirovatiyê ne.

K(Q)ûtî zarokên wan bûn, ewên ku hevparên pêdakirina cotariyê bûn, ên kevintirîn gundên vê cîhanê avakirîne, xudanên pê emîn yekîneyên civakî yên tev kevinin, û xavtirîn hunermendên dema tev li pê in. **K(Q)ûtî** bo mirovin wan deman “**Çiya**” bi xwe bûn. **Somerî** û **Akkadî** yên **Mêzopotamiya** hîngê gelê “**Newal**” bûn. Li newalê di kûraniya welatê di navbera herdu çeman de, **Someriyan** aristaniyek nûjen û çand pê xistin, bajarê pê in, karmendeyî ‘*memûrtî*’, bûrokratî, ro enbîrî û burciwazî ava kirin. Ev aristaniya “*Newalê*”, ku ji herî û golên xelîcê **Farsî** hatîne, herku çû bi gelên “**çiyayî**” re, ku Kurdan ewan xistibûn bin zora xwe, kete peyçûnê.

Van êlên Kurdan jî ji ber hinek egerên nediyarin, hevrexên xwe ber bi belavbûnê ve têvedan. Encamên wê yekê jî serpehatî ‘*bobelat*’ bûn. Hevbendiyek gelên çiyayî wan çandeyên bilind ên **Mêzopotamiya** tar û mar kirin, ewên ku ev tîkçûna bi seriyê wan hatiye, ev tîkçûna mezina tîkiliyan di **Asûr** a kevin de bi terzekî tîrmînologî jî dane qelemkirinê. Ni tevanên çiyân êdî nema wek **Nenasan** dihatin dîtin, lê wekî pozberan, cengewarên qerezxwaz, mirovên ku yek jê bitirse, û carina jî wekî hovbazan ‘*barbaran*’. Bo **Mêzopotamiya** eweyên “**Kûr**” an **K(Q)ûr** bi wateyên xwe yên berê nema tî lêvkirinê. Gelên li bakurê zevîne, di navbera herdu çeman de, dest pêkirin, ku li navekî dî ye li gor nasdariyên xwe yên li ser gelên çiyayî bigerin û di peyva “**Kurdî**” ya **Akkadî** ya derengdemî de, orek ji bo mirovên wêrek ên cengewar re dîtin. Ev wateya dulayanî “**Mirovên wêrek**” û “**Ni tevanên çiyân**” ji wa dema **Akkadiyan** ve, ku berî niha bi 5000 sale û ta niha ji bo Kurdan ciyê xwe girtiye, maye.

Tevliheviya bêjeyê û dîroka vê lêvkirinê:

Di navberê de, tevliheviyek mezin li ser bêjeyê çêbû, Ev jî ji ber gelek egeran: Qonaxa pê in ji pê ketina navê gelan ji aliyê dîroka zimanî ve, bi nisbetek berbiçav û bê astengiyek mezin derbas bû. Firehkirina navên gelan bo gelên nenas ên li ser kenarên **Mêzopotamiya** bi rêya pa pirtikên peyvê, ku rew tî van gelên çiyayî bêtir bidin zelalkirin. Van hemî bêje di jêderên xwe yên kevnare de bi nivîsa mîxî hatine kolan. Hikariyên ‘*bandorên*’ biyaniyan ji welatên derdora **Mêzopotamiya** di vê yekê de pir sînorkirî bûn. Hema pa ku nivîsa mîxî bi tîkçûna çandeya hilgirên wê re ji ortê rabû, gava hêri karên nenas avêtine ser **Babil** û bi destê xwe ve anîne, tevliheviyek bêjeyî bo peyvên li ser **Kurdan**, **Ni tevanên Çiya** li bakurê rojavayê **Zagros**, dest pêkir.

Derbasbûna ji serohatên devkî bo yên nivîskî:

Ji wê demê de dest pêkir, ku her nivîsxanekê û nivîsgehekê, di dema nivîsandina mîxî de, eweyek cîhê ji yê dî bo peyva **Kurd** ji xwe re pêda kiribû. Eve tê egerkirin bi pîrbûna serohatên ‘*adetên*’ nivîsandinê yên gelên cîhana kevin. Lê rast wan ciyawazên eweya nivîsandina peyvê asteng derxistin holê, di warê peyvixwendin û tîgihî tina wê de, lê wekî dixuye wateya wê tevî wê yekê jî winda nebû. Ev pêveçûya kê-m-zêde di lêvkirina tîpa bêdeng (**K**) de tê berbiçavkirin, eva ku di jêderên kevin de wekî (**Q**) di hate nasîn an jî wekî (**Kow**) di lîbrî de.

Gev kirin “Nermkirin”:

Ji dema **Babilî** de, vê tîrmînûsê nermkirinek zimanî ya diyar dîtiye. Tîpa –**K**– ya ji dema **Somerî** de maye, bûye (**G**). Bo nimûne:

K(Q)ûtî bûye **Gûtî**, an jî pa ê **K(Q)ardû**, wilo jî **K(Q)ûrdû** bûye **Gardû**. Bi wê yekê re êdî (**K**) wekî (**G**) bi cîh bûye, û demek dirêj jî wilo xwe girtiye. Ji vê pê veçûnê pêve, li ba hinek gelên **Rojhilat a Navîn**, êdî lêvkirina nerm bûye adetek bi seriyê xwe. **Hîfî** ên –*wekî Kurdan Indoarî bûn*– navê **Gorda** li hevrexên xwe yên ku gelên çiyayî kirin. **Ermeniyan** ji bo Kurdan di dema kevin de digotin: **Gûrt** û **Kurt(ox)** jî.

Bi peyvî dî: Hinekî nermkirina bêjeyê, ji serî de, ne tenê wekî berberhemeke nermkirina zimanî bû, wekî îngilîzî, di zimanê rojane de dibîne, lê belê destpêkek tîrmînolocî ya nû ye. Ev pêveçû jî ber wê yekê ye jî, ku gelên bi serohatên zimanî yên serbixwe, her ewin yên di giloverka çandeyî ya Kurdan de bi cîh û war bûne. Ewên ku nûhatî ne jî bi xwe re pê keftinên xweyî yên tîrmînolocî bi xwe re dikanîn bînin.

Farsan jî di xala bilinda deselata xwe de berî demguherê (*Ji dayikbûna hezretî Isa-Wergêr*) peyvî, bi wateyên wilo, bo binavkirina ni tevanên çiyân wekî mirovin hovane ‘*Barbar*’, bi kar dihanîn, li gor serohatên Iranî bo nimûne, peyva “**Gurd**” hem bo mirovên bêbawerî bû û hem jî bo “**Gur**” bi kar dihanîn, ev pêveçûyên li ser damarên **Akkadî** pêda bûne, ku hîngê bo mirovên wêrek, ango mirovên asê pêda bûne, ba ne diyare.

Ti tekî bi cîh kiriye, ku **Farsan** jî zimanê cîhanî yê kevnademê, **Aramî**, bi kar anî bûn, wekî çewa **Kîros** „*Koro*“ ê **II**. yê mezin. Bo danasînên li ser hilwe andina **Babil** wan peyvên adetî yên **Gûtî** an jî **K(Q)ûtî** bi kar anîn, ewên ku bi hezaran sal xwe paristibûn. Eweyên tîpên hi k bi (**K**) an (**Q**) man wekî kevnetirîn terzên makdarên peyvên li ser Kurdan.

Dengdêrên kokî:

Du dengdêrên kokî yên kevnare opî di peyva “**Kurd**” de, hîn ji dema **Akkadî** de mane: **U** û **A**: **K(Q)ûdî** û **K(Q)ardû**. Van herdu eweyan ew wateya peyvê mebest ‘*armanç*’ dikirin, û naveroka wê ya tîrmînî ji ni tevanên çiyayî yên **wêrek** guhartine ‘*hovane*’. Ewê ku tîpa kokî [**U** > **A-Wergêr**], ne diyare çiyê- Dibe ku ji ber dirêjkirina dengî wilo hatibû guhartin

Lihevsaî:

Di xala bilinda deselata **Babiliyan** de, dubareyî, komserhevî û topaçkirina peyva “**Kurdan**” çêbûn. Wilo **K(Q)urdo** bû **K(Q)urado**, an jî **K(Q)ardo** bû **K(Q)arrado**, **K(Q)arduto**, **K(Q)arduto** an **K(Q)arado**. Lê naveroka van hemî eweyên peyvê wekî xwe man; mirovên **wêrek** û **cengewar** ên li bakurê rojavayê **Zagros**. Ji aliyê zimanî ve, van peyvên ku hatîne guhartin, pê veçûnên li gor pêdiviyên zimanî yên wê demê, wekî hêginbûna lihevsaîya zimên bi rêya dubarekirin û axdana wan peyvên makdar divê bî dîtin an jî wekî nûkirinên ku berhemên hikariya zimanên biyanî bêne dîtin. Li ser hûrikiyên dîroka vê peyvê, diyare hîn ba nehatiye rawestan.

Hikariya welatên Rojava:

Ji ber girtin û wergerandina peyvên wekî “**Ên Kurd**” ji damarên **Somerî** û **Akkadî**, ku di mêjodemên zû de, di jêderên wekî yên **Aramî**, an jî kevnare-**Ibrî** de, ku ji aliyê cemawerekî firehê ro enbîrên **Rojhilat** ve naskirî bûn û di nav gelek gelên **Rojhilata Navîn** de belavbû bûn, di zimanên dagîrkarên nû yên ji welatên rojavayî, **Girîk** û **Romanan** de, hîn bêtir nezelalkirin ên tîrmînolocî pêda bûn. Tenê ji ber wê yekê, ku lêvkirina devkî ya peyvên eweyên nivîsandinê, dengdar û bêdeng wan ba bi cîh nedihatîn. Hemahema ji gi tîrmînôsên mêjoyî, di hezaran sal de, bi pir eweyan hatîne nivîsandin. Tîkiliya vê jî bi zimanzaniya gelan û bi taybetmendiyên nivîsa wan re heye. Ji ber ku **Girîk** –*bo nimûne*– ta bi roja îro jî tê gotin, ku wan nedikanîn () lêvbikin, û **Çîniyan** nedikanîn (**R**) lêvbikin. Wekî dî jî li ba Ewrûpiyan dema niho zimangiranî heye, peyv û bêjeyên ji **Rojhilat** hatîne, ta pileyekê, bi giranî dikarin wek hev binivîsin û lêvbikin, ku bo gelên **Rojhilata Navîn**, ne asane, xwe di van eweyên nivîsandinê de ba binasin.

Di rêveçûna mêjoya tîrmînosa “**Kurdan**” de, wê înfliasyonê eweyên zimanî ji xwe re pêda kir, û ji ber wê jî wateya peyvê hate guhartin û ta pileyekê hate herifandin.



Peyva ku navdare û ta roja îro li ser wê li henekirin heye, “**Kardoxî**” ye, ku nivîskarê **Girîkî** û peyamnêrê sengerê di **Rojhilata Navîn** de, **Êksînofon** “*Xenophon*”, ew peyv bo binavkirina gelên **Zagros**, dema ku 10.000 ji hêzên dagirkar ên **Hêlênî**, di nav **Hekarî** û Kurdistanê re, ber bi mal ve zivirandine, bi kar aniyê. [Binêr: *Wengerandina me ya Kurdî: Vegera 10.000 nandozên Girîkî-Wergêr*]. **Êksînofon**, wekî dixuye, dest avêtiye **K(Q)ardo** ya kevin a **Asûriyan** berê bi kar dihanîn, ku yek ji wateyên wê “**Cengewar**” bû, û vê bêjeyê pa pirtika **Girîkî (Xoy)** bo piraniya van mirovan li Kurdistanê bi kar hatiye. Dibe ku ji ber wê yekê be, ji ber ku **Êksînofon**, yek ji wan hindik biyaniyane, yên ku bi wan ni tevanên xwe xeber re, ên ku di **Incîlê** de, bi revgeh û keleşan zoryar hatîne navkirin, ketiyê têkiliyê. **Êksînofon** di wa têkiliya xwe de bi wan “**Kurdan**” re, bûye peyamnêrê sengerê yê hêzên livbaz û le kerê dagirkarê **Girîkî**, û ji wan fêrbûye, ku ji wan bitirse. Kurd ên navçeyê, li ba **Girîkan**, di **Hekarî** de, wekî ni tevanên çiyar hatîne nasdan. **Êksînofon** ew peyv wilo wekî peyv xwe wate dike, gihandiye welatê xwe, û li gor terse ro enbîrî yê wa dema pê hêz de, ku bûyerên dîrokî, li gor rastiyan wan, û bi eweya **Girîkî** ya piraniyê lêvdikirin û didane qelemkirinê, û hajê dikirin, ku wan wilo biparizin. Gelên çiyayî, bi xwe, li Kurdistanê, wekî **Êksînofon** jî bi sere xwe ewan berbiçavkirine, serxwebûn û taybetmendiyên xwe paristine, û bi serohatin zimanî jî. Eve wê yekê jî dide bawerkirin, ku Kurdan xwe ji **Girîkan** re bi navekî xwe yê kevin dabûn pê kê kirin. Serohatên zimanî yên demê dirêj li Kurdistanê xweragirtî bûn, ta dema me ya niha bi pê keftin ên xwe yên balkê tê berçavkirin. Wilo hinek komikên gelfî yên piçûk, berî tevan Filehan li Kurdistan ta niha jî zaravên **Aramî**, weku mirovan di dema hezretî **Isa** de dipeyivîn, hîn bi kar tînin. Wilo jî serohatên pir kevinên sazê “*mûzîkê*” ne ba paqij, di çiyayên Kurdistanê de, jiyana xwe di gelek deman de paristine, û ta pileyekê Kurdan metnên antîkî yên **Zerde t** ta sedsala 20ê paristin. Piraniya nivîskarên **Girîkî** yên mayî, ên cîhana kevnare, wan gelên çiyayî bi xwe, bi **Kyrtî-oi** navkirine, dibe jî ji ber ku ewan tew carekê ne li Kurdistanê bûn, û pêgihanek wan tew bi gelên wê ortê re çenebû bû. “*Kyrtî-oi*” bi aliyê derve de, ji xwe bêjeyek dî ye bo Kurd, lê ji aliyê naverokê ve ma bêjeyek hevmal bi wateya peyva **Kyrtî** bi xwe. Wateya **Kyrtos: Pi txwar e, bejintop e**. Divê eve nî anek zelalkirî be bo çiyar. Welatên çiyayî û gelên çiyayî. **Girîkan** dikarin bi wê yekê wateya rastîna ni tevanên çiyar ba wergerînin û bi terzekî zimanî bi cîh bînin. Bi hinek peyvên dî: Di navbera **Kardoxoy** ê **Xênophon (Êksonofon)** û **Kyrtî-oi** yê **Girîkî** yên dî de, pêwîste nakokiyek wateyî ya piçûk di naverokê de hebe, weku lêkolînerên **Alman** ji sedsala 19ê ve pircarkî anîne zimên. Lê herdu eweyên peyvê wekî dixuye yek wateyê armanc dikin.

Romiyan (*Xelk û ni tevanên dewleta Roma-Wergêr*) jî **Kurd** bi **Cyrtî-** “*Kyrtî*” nav kirin. Wan peyva biyanî **Kyrtî** ya ku ji pê mendên xwe yên kolonyalîst di **Rojhilata Navîn** de wek xwe birin. Têrmînûsekî latîmî, ku têkilî bi **Curvûs** (*Kurvûs*) re hebe, ku ew jî bi wateya pi txûz û bejintop be û bi awayekî teorî xwe bigihînin (*Curvî*), bi carekê pêda nebû. **Romiyan** ji aliyê têrmînolocî ve jêmayê **Girîkan** birin. Dibe jî ji ber wê yekê be, ku **Romiyan**, di adetê de, tenê heta dergahê malê yê Kurdistanê hatibû û bi piranî li hember Kurdan ber bi **Rojhilat** û **Asiya** ve bi serneketin. Lew re Kurdan wêneyekî xwe li ba **Romiyan** hê tin, wekî **Strabo** herheyî kiriye, ku ew gelê çiyayî yê hov û talankare di **Rojhilata Navîn** de, ku tew nedixwast xwe di bin milê **Rom** de bibîne. Ev pênavî ‘*navpêxistin*’ bi dirêjîya sedan sal bi Kurdan ve zemirî bû.

Tema akirina pê veçûnê:

Pi t re peyva “**Kurdan**”, bo ni tevanên çiyar li **Zagros**, pêveçûyek pê veçûnê ya wilo derbas kirîye:

Someriyan	K(Q)u r		
Akkadiyan	K(Q)urdu(î)	K(Q)ûtî	Gutî
Li ba Kurdan bi xwe	K(Q)ûtî	Gutî	
Babilî	K(Q)ardo	Gardu	
Hîfîfî	Gurda		
Incîl	K(W)urd		
Ibrî û Xaldî	Qurdaye		
Nêstorî	Qadu		
Telmûd	Kardu		
Fars - Dema avakirinê (Aramî)	K(Q)uti	Guti	
Fars – Pehlewî	Kurd		
Sûrî	Quardu	Kurdaye	
Ermenî	Kurt(ukh)	Kordu(kh)	
Girîk	(<i>Yûnan</i>)	Kyrti(oi)	Kurd(khoi)
Romî	Cyrtî		

Erebên pê Islamê Kardu

Musilmanên Erebb Kurd (bo pirkesan: Ekrad)

Türk Kürt

Ewrûpiyan ji sedsala 7ê de berî Isa Kurde (Kurd) Kurden(Kurds)

- *Ev cedwel jî li gor nasyariyên Dr. Ferdinand Hennerbichler û Dr. Azad Khailanî hatiye amadekirin... Me tîp a (u) ya almanî, ku wek (û) ya Kurdî têye lêvkirin, wilo hê t.*

Ni tepeyv:

Ni tê (*welatê*) Kurdan, peyvek xwemala pir kevine, bêtir ji 4000 sal ve bi cîh bûye û bi gelek eweyên bêjeyê. Welatê Kurdan pir ji zû ve naskirî ye, hîn berî **Türk** û **Selcûqî** di dema navîn de (*Ji sedsala 11ê ve*) peyva ni tebêjeya Kurdistan bi kar bînin. **Selcûqiyan** ne li ser adetên xwe yên zimanî ew bêje bi kar anîn, lê li ser adetên zimanî yên biyaniyan, wan zimanên îranî, ku tede “**Stan**” bi wateya welat “*ni t*” e û wekî pa pirtika bêjeyekê “**Kurd-Wergêr**”, ku di binyada xwe de vedigere damarên xwe yên **Somerî** û **Asûrî**.

Kûr Kûr-A, Somerîyan digotin, gava wan dixwastin welatin biyanî û bi serekî welatên neyar bi nav bikin. An jî wan li ser wan welatên biyanî yên serhildêr digotin “**Kur nu sê-Ga-Nê-Nê**”. eweyên wilo yên lêvkirinê û ên nêzîkê wê, ji tîplêdankên bingehîn ‘*klaviyator a Standard*’ ên çavkaniyên Somerî ne.

Di dema derenga **Asûrî** de, pevxistina peyva **Kur K(Q)ûtî**, di navbera 2500 û 2000 î berî hezretî **Isa** de, di dîrokê de nû dest pêkir û çiyê xwe girt. Ew kevine eweya welatê ‘*ni tê*’ Kurdane û bi vê wateyê ye: **Welatê ni tevanên çiyar**. Ev peyv li dawiyê ji aliyê wan navçeyan ve bi kar hat, ku li bakurê rojavayê **Zagrosê** ne. **Asûran** ev bêje di wê demê de bi kar anîn, ku peymanek gelên çiyayî ji bo hêza ramyarî li hember qezexwazên **Samî** yên serdest di kûrede ta welatê nav herdu avan de hilki iyan bûn deselatê. **Kur K(Q)ûtî**, pa ê ni tê gelên çiyayî, di saya **Mêzopotamiya** nivîsazan de wekî têrmînûsekê ji bo maljîna ni tevanên çarexên çiyayî li bakurê rojavayê **Zagros**. Bi firehî, û bê ku li ser nakokî hebe ta dema hêri karên ji welatên rojava ve, **Girîk** û **Romanan**, ma.

Vê yekê, çavkaniyên **Aramî** jî, di xala bilinda ahdariya cîhanî ya **Farsî** de anîne zimên. **Kîros** „*Koro*“ ê duyê yê mezin – bo nimûne- sala 539 Berî hezretî **Isa**, dagirkirina **Babil** li ser tomardanekî ji heriyê, di raporek ji 45 rêzîkan de li ûn hî tiye, tede ne tenha li ser **Kur Somerî** „*welatê Somerîyan*“, lê belê pircarkî û gelek caran li ser **Kur [K(Q)ûtî]**, *welatê Kurdan*, hewaldaye. **Kîros** „*Koro*“ di va nivî ta **Aramî** de, pesindariya xwe dike, ku wî *welatê Kurdan jî dagîr kiriye û bi bin xwe xistiye (Rêzên 13, 14 an 31 ji tomardana heriyê bide ber hev)*.

Ibrî ya kevin a pîr bi bandor navê welatê “**Kurdan**” û ni tê wan dinase. Ew li ser kevnebeje ya **K-W-R-D** pêda dibe, bêtir nêz: K(of) – W(aw)- R(e) – D(alet). Bo wî navî bi kar anîna **K(Q)urd** pir nêze an jî di **Almanî** de **K-U-R-D**. **Incîl** (*Birrê kevin-Wergêr*) van Kurdan bi **Ni tevanên Çiyar** dide nasîn. **Nebûkadnezar**, ahê **Babilê**, erê van gelên çiyayî kir, ji ber ku –li gor **Incîlê**– wan nepejirand bi wî re têkevin cenga dawî, li hember **Midiyan** û ji bo bidestxistina cîhana berê (Judith 1,5-6). **Nebûkadnezar** tola xwe ji wan hilanî. Wî serle kerê xwe **Holofêrnês**, kesê duwemînê di dewletê de, and ku wê tolê hilîne, ta bi **Filistînê**. **Holofêrnês** dijî welatê çiyayî di **Zagros** de jî derket (Judith 2,22), ev [*Welatê Çiyar*], ku li aliyê dî yê **Ferat** be, di **Tewratê** de nêztir haydarî li ser nînin. Bo têrmînolocîya Kurdan û dîroka wan van belge yên **Incîlê** dema kevin, tevî ku hindikin jî, bi wate ne. Ji ber wê ye jî, ku van jêderên têrmînolocî, ne tenha ji kevintirîn gotinên li ser **Kurdan** in, lê belê ji ber ku ewana wilo mane, bê ku pevçûnek li ser wan çêbibe. Hemî eweyên **Incîlê**, ji **Ibrî** de ta bi herdu wergerandin bo **Girîkî** „*Yûnanî*“ û **Latînî**, her yek ji wan peyvîn li ser Kurdan û ni tê wan didin, ku bi wateyên „**Gelên Çiyayî**“ û „**Ni tê Gelên Çiyayî**“ tê nasîn. Bi wê yekê jî taybetiyek mezin a bi hezaran sal hatiye pêda kirin. **Ciho** li Kurdistanê bi sirek taybet di vê yekê listine. Ewan yekemîn û mezintirîn rêzberdayî û mi extiyên cîhana kevin bûn, ku hem ber bi Kurdistanê ve hatin koçberkirin û hem jî, wekî adetê, di nav Kurdan de, ji ûnketinê „*ravenanê*“ hatin paristin. Evqas bi gi tî li ser kevintirîn jêderan. **Incîl** „*para kevin*“ di vê yekê de, wekî xudan taybetiyekê, ji aliyê dîrokî yê peyvê ve, maye. Hema di wergerandinên têrmîniya Kurdan û bêjeyên li ser ni tê wan, ji kevnezimanên **Mêzopotamiya** bo zimanên nû yên çandebilind, û berî gi an yên welatên rojavayî, tevliheviyek bêjeyî ya pir mezin pêda bûye. Ev tevliheviya zimanî hîn ji nêz ve ba nehatiye zelalkirin. Bi teyayî sê epel jê tîn nasîn: Pê demeke ni tepeyva welatê Kurdan, serohateke serekîna jêderên olî, û yeke bêtira çandeya bêolî „*layîkî*“.

Kevintirîn ni tepeyv:

Ji aliyê têrmînolocî ve, li ba **Somerîyan** karmendiyek hebû, û wilo tê xuyakirin, ku pa pirtika „*soffix*“ **A** bi pa peyva mak ve dihate zemirandin,

wekî Kur Kur-a bo welatên ne-Somerî.

Ev pa pirtik (A) êdî bû terzekî eçleya „xitma“ ciyografî. Heta di dema Girîk û Romanan de ev êwekarî hîn mabû; ku navçeyan bi pa pirtika (A) bidine nasîn. Wilo jî -Bo nimûne- Euzêbiyûs Kurdistan bi Gord-a bi nav kiribû. [Ta niha gundek li navçeya Çiyayê Kurdistan, li Rojavayê Kurdistanê, bi navê Gorda heye-Wergêr].

Hîn di sedsala 21ê de, berî ji dayikbûna hezretî Isa, ev tîrînolociya ciyografî bi yek ji kevintirîn ni tebêjên Kurdistan hate guhartin: Kard-a. Ev êweyê lîvkirinê ji dema berbiçavkirina wê, berî 100 salan hîn ji niha ve bi cîh bûye. Êwenivîsandina Kard-a-ka jî dibe wilo be, lê bi cîh bûye jî, ku ev navbêje ji dema ah û-Zîn ê Urî ve li Mîzopotamiya, maye. Pê serên û-Zîn serbilind bûn, ku wan Kurd ikandibûn, ewên bi K(Q)utî bi navdikirin û ewana bi carekê ji welatê nav du epelan dane ber xwe û ki kirin. Van serkeftinên vebirîskî yên pê serên xwe, û-Zîn di gelek nivî tîn mîxî de bi bîr tîne. Di yekê ji wana de, li ser latekî ji heriyê welatê K(Q)utî wekî welatê Kard-a an Kard-aka bi nav dike. Ev welat -li gor jêderê- di teni ta „xelkê û“ de ye. Wekî dixuye, ewana li ba ûrê zireya Wanê dijiyan. Hûrikiyên ciyografî bi dest nektîne. Li gor wê yekê, divê gelên Mîzopotamiya li jêriya ni tebêjeya Kard-a yên wê demê bûn, ku ew der welatê Kurdistan bû, û bi wan hatibû nasîn. Dibe ku ev jî bi bêjedamarên Akkadî ve bite girêdan, yên li ser mirovên wêrek, hêzdar, an jî cengewar, ji wê pê ve, ahên dagirvanên K(Q)utî bi xwe jî, yên li Mîzopotamiya, Lêrabûm û Yarlagan, xwe wek hêzdar, wek K(Q)utî, nî an didan, xwe bi ahên welatê K(Q)utî, ahên Kurdistan, bi nav dikirin. Diyare ev serohat vedigere wan damarên Akkadî.

Serohata jêderên Olî: Welatê Kardo

Bo Kurd û Cihowan ji berê zû de serohatin kevin û hevpar hene. Eve jî ji karpêkirina bêjeyên kevin tê xwendin, ne wek tenha di Incîlê de, lê bi teyayî jî di çanda Ibrî ya kevin de bi kar hatiye. Nivîskarên cîhana berê gelek caran tiliyên xwe ber bi wê yekê dirêj dikirin, ku Kurdistan a ewana bi „Welatê Gelên Çiyayî“ navdikirin, bûbû yekemîn koçgeha dîrokî ya Cihowan, berî ku sala 597 (Berî hezretî Isa) Nabûkadnezar ê duyê Cihowî bindest kirîne bi demek dirêj, dema ewana bûne hevalbendên Misirê li hember Mîzopotamiya. Hîn di sedsala 8ê de (Berî Isa), ahê Asûrî almanasar ê pêncê (727-722) (B.I) li ahê Cihowan, Hozêya, zor kirî bû, ku xûkê „pacê“ bo wî bide, û ji ber ku Hozêya guh nedayê, ew hate girtin û cara yekê bû di dîroka Cihowan de, ku ewana hatibûn ka kirin bi bakurê Mîzopotamiya ve. almanasar Cihowî koç kirin mi extiyê nav Kurdistan, di Kurdistanê de: Di „Welatê Çiyayî“ de, li ber robarê Xabûr (Bide ber hev. 2, ahan 17, 6. 18, 11 ff). Tersî wê yekê jî, di pêveçûya dûrokê de, Cihowan jî Kurd ji mi extiyê birin nav xwe, berî gi na, ewên ku çûbûn ser ola Cihoyî. Eve di Telmûdê de jî bi cîh bûye (Bide ber hev, Yev, 16 A.). Di dema lehiya mezin de jî, ku di seriyê hezar salên berî jidayikbûna hezretî Isa çêbû bû. Ni tebêjeyêke bi navçeya Kardo hatiye bi navkirin, li ba kevnivîskarê Ibrî Yûsif (Ant., 1, 93): Tê dîtin. Lehengê çêroka lehiyê li ba wî patriyarkê Ibrî hezretî Nûh e, ku ke tiya wî bo mirov û bo sewalan bû, Yûsif dinivîse, ku ew ke tî li çiyayên Kardoxiyan dahat ser hi kiyê, li [ni tekî çiyayî yê mirovin hêzdar]. Bi ser wê yekê ve jî welatekî „Kardo“ di wergerandinên Incîlê de, yên demên Girîk û Romanan, sirek nasber dilîzin. Yek ji navdartirîn nivîskar û wergêrên cîhana berê, Onkêlos, pir caran peyva makdar „Welatê Ararat“ di Incîlê de, bi „Welatê Kardo“ wergerandiye. Li ba Onkêlos -bo nimûne- Haraya Ibrî „Ararat“ bi „Çiyayên Kardo“ (1 Mûsa 8,4) hatiye wergerandin. Li vî welatê çiyayî yê Kardo, wekî dixuye, ke tiya hezretî Nûh danistiye. Li derek dî Onkêlos metnê Ibrî yê kevnare „Memlexût Ararat“ (Jermiyas 51, 27) bi memleketa welatê Kardo navdike.

[Li ba Kurmancan jî ta niha peyva Ibrî „Memlexût“ wek „Memleket“ tê lîvkirin-Wergêr]. Naverok: Yahwa nifirînê li deselathezîya wan Babilyan dike, ewên ku dixwazin gelan bînpê bikin, ku ewana tîkbiçîn, û bang li gelan dike, ji wan jî êlên Kardo, ku rabin û Babil biherifînin. Wilo dixuye ku wî welatê derdora Araratê (Agirî-Wergêr), ku demekê pi t re bi Ermîniya hatiye nasîn, bi Kurdistanê, bi „Welatê Gelên Çiyayî“ yên li Zagrosê guhartiye. Pa wergerandinên mezin ên Incîlê di demên kevnare de, ni tebêjeya -Welatê Mirovên Wêrek- li Kurdistanê, Kardo, hîn demekê di çandeya bêolî 'layîkî' ya xav de mabû û pi t re di guhartina demê de, pa jidayikbûna hezretî Isa, ew bi gelemperî wîndabû. Ew mîna acetekê alîkar a zimanî nêzîka 2000 bi kar dihat. Ji wan jêderên dawîn jî: Aramêyan navenda welatê Kurdistan li dora çiyayê Cûdî [Godî, Godiyîn-wergêr] bi „Bêt Kardo“ navdikirin. [Bêt:Bi Erebi jî mal e-Wergêr]. Têkiliya vî jî bi genge iya berê ve heye, ka ke tiya hezretî Nûh li Ermîniya, li ser Ararat nistibû an li Kurdistan, li ser çiyayê Cûdî. [Di Qurana pîroz de: Cûdî ye, lê dibe jî Godî be, lora ku di zimanê erebî de li ciyê tîpa (G) her tîpa (c) bi kar tê-Wergêr].

Quran jî xwe bi vî yekê gero 'mijîl' dike, ew navçeya dora Cûdî li Kurdistanê wekî ciyê rastir dibîne.

Êksênofon 'Xenophon'ê Girîkî gota 'qala' welatê (Kardo-xoy) kiribû. Aramiyan di jêderên Kevin de (Kurdo-x), û Ereban li ser (Kard-ay) herwekî (Ba-Karda) peyivîne.

Serohata çandeya bêolî 'Layîkî': G(K)urdo-ene:

Kevne opên gev kirina êweyên ni tenavê welatê kurdan, di efsaneyên Lehiyê "Tewefanê" û çêrokên afirandinê de ne, ku ji dema Babîlî de mane û dikanin xwe di sedsalên pê in ên pa jidayikbûna hezretî Isa de bi cîh bikin. Ewana vedigerine bêdengên gev kirî wek Gorda, Gurda, Gardu an jî Gurt. Nivîskarên klasîkî û mîjonasên kevnedemê, van termînî jî ba nivîskarên efsaneyên Lehiyê birine, parek jî hatiye nûberkirin û ne kêncaran hatîne pêlîstin.

Bi wê yekê, ser ji nû ve, tevlihevî pêda bû. Wateya peyvan wînda bû. Qalibin peyvan xwe wilo pêdakirin. Di dema Girîk û Romanan de van ni tepeyvên, ku li ser welatê Kurdistan bi kar hatîne:

“Gorduene, Gorduaia, Gordunas, Gordûxî, Gordoi, Korduene, Korduaia, Kordunas.”

Hemî van peyv êweyan di koka xwe de bi yek wateyê ne: "Welatê gelên mîrxasên çiyayî", ku li Kurdistana îro ye.

Hinek belge:

Wilo Alexander Polyhistor di efsaneya Lehiyê de welatekî bi navê Korduaia tîne zimên, ku ke tiya kokbav Xisuthros divê lê dahatibe. Konstantin Porphyrogentius di pirtûka xwe de "De Ceremoniis" de, tîne zimên, ku bo Kurdistan hem Kordî û hem jî Curfî û hîn Corduaiei dihate gotin. Strabo jî tîrînolociya Xenophon tîne bîran û dinivîse, (XVI 1, 24. XI 13,3. XV 3, 1 bide berhev), ku Karduchos (ch=s) niha bi Gorduaion tîye navkirin. Plinius jî ti tekî wilo wate kiriye: Carduchi quondam dicti, nunc Cordueni, praefluente Tigri (VI,44).

Nimûneyek dawî:

297 pa hezretî Isa, peymaneke a tiyê di navbera Galerius û Diocletian de bi ahin ahê Sasaniyan, Narsaios re, çêbû: ahin ahê pênc navçe ji dest dan, bo Romanan, ji wan jî navçeya Kardue-non, Kurdistan. Pa ê ew navçe kete nav Ermîniya. Ji aliyê tîrînoloci ve, di van hemî peyv êweyan de, rastîniyek heye, ku li ba cihêcihê nivîskarên kevnedemê de, ewan di kokên xwe de bi yek wateyê ne: Welatê Kurdistan. Li dawî di nav van ên tev ji hev cihêtir de, jî êweyên ni tepeyvên de ti tekî wekhev heye:

Evan çî caran nebûne navên dewletekê û çî caran ne peyvên dewletekê bûne, bo wan hîç carekê sînorin bi wateya nûjen a peyvê nebûne, û ji aliyê ciyûgrafî ve jî bi wan çî navçeyêke bi serê xwe diyarkirî nehatiye bêlîkirin. Pirpir "bêtir" wan herêmên, ku tîde hikariya jîngeha Kurdistan bi hezaran sal hebûye. Lê firehbûna vî jîngehê jî herdem ciyê pirsê bûye.

Li gor wê yekê Kurdistan ni tewelatê Kurdistan, bê sînor, bê dewlet, û bê pasporteke xweyî, bi alayek demkî û sirûdeke neteweyî ya nefermî nasber dike. Kurdistan her maye serhevkirina kesaniya Kurdistan, li hemî welatên Rojhilata Navîn ên, ku ewana tîde dijîn...

[Dûmahûk heye]

(*) Heger Xwedê delîveyekê bide, ez ê para duwê jî, bo xwendevanên hêja bikime Kurdî. (Cankurd)

Hinek peyvên irovekirî:

Binyad: Esas, ji "bin û binî" hatiye Civanok: Komkir

Dikanin: Ji kanînê hatiye Jêma: Ewên ku jê bûne

Gev : Nerm û sist, ax pa baranê gev dibe Gêrobûn: Mijîlî

Giloverk: Daîre Gote: Qal Hevrex: Teni tdar

Hêgin: Ge û bilind, wek: Genim hêgin bûye

Hîngê: Wê gave, wê demê Jêma: Ewên ku jê bûne û li ûn mane

Ji jor ve: Ji bakur ve, ja banî ve

Ki kirin: Qewitandin, mirî k tîn ki kirin Kok: Esil, koka dare

Kokbav: Kevintirîn bav Mekin: Qewîn

Mêjedem: Mêjoya kevin, dîroka berê

Nistin: Sikûn û dani tîn Ni t: Weten, ni timan

Nûberkirin: Nûjenîn Pa ê: Pi t re Pêveçûn: Prosês

Pa ser: Kur û zarok û jêmayên kesekî Pê ser: Bav û bavpîr

Pirpir: Gelek pir , bêtir Sererêj: Jêdera avê ya serekîn

axdan: Tabelavî orek: Peyvek Teketek: Yekeyek

Tîplêdank: Klavyator Tomardan: Sicil

Zevîn: Erd Zire: Derya, behir



Sernivîser

Qado êrîn

Rêvebirê Nivîsînê

Ar ek Paravî

Desteya birêvebir

Abdilbaqî Huseynî

Ezîz Xemcivîn

Lawîn êxo

Pîr Rustem

Silêman Azer

Derhener

Xor îd ûzî

Ji bo hinartina berhemên kurdî:
kurdi.penusanu@gmail.com



**8 Salliya kockirna exe
pakrewanan ma ûq**

MODERNARAF



AZADI AZADI